

HÊVÎ

KOVARA ÇANDÎYA GIŞTÎ



\$ 8 (Etranger)

HEJMAR 5 / GULAN 1986

50 FF

ESPOIR

HÈVÎ

50 FF

Revue culturelle kurde

N°. 5 - Mai 1986

Directeur de la publication : Rojen Barnas

Réalisation : Ali Bucak, İbrahim Ghazagh, Mohamad Hassan

Collaborateurs : İbrahim AHMED, (Angleterre), Firat CEWERİ (Suède), Dr. Kemal FUAD (Berlin), Dr. Çemşid HEYDERİ (Suède), KENDAL (France), MALMİSANIJ (Suède), Ferhad ŞAKELİ (Suède), Hesen SEYF (Suède).

SOMMAIRE

EN KURMANCî

- Hommage au linguiste Qanatê Kurdo - <i>Joyce Blau</i>	7
- La mort de l'écrivain Hişyar - <i>Temo Zêrîn, Lokman Polat</i>	16
- Et celle du poète Hêmin - <i>Joyce Blau</i>	19
- Souvenirs d'Ihsan Nouri Pacha sur la révolte d'Agri (IV) -	25
- Un regard sur la vie et les travaux du kurdologue B. Nikitine - <i>Helkewt Hekim</i>	41
- Vie et œuvres d'Enver Mayî - <i>Dildar Berwari</i>	60
- Hemido et l'avocat (nouvelle) - <i>Firat Cewerî</i>	62
- Poèmes inédits - <i>Kalo, Çerkezê Reş</i>	68
- Les publications récentes	70
- Le nouveau livre de Keremê Reş - <i>Têmûrê X. Mûradov</i>	82

EN KURDE DUMILî

- Le dialecte dumili de Batoum - <i>Qanatê Kurdo</i>	85
- Textes dumili recueillis par Peter I. Lerch	88
- Bibliographie dumili (III) - <i>Malmisanij</i>	95
- Poèmes inédits - <i>E. Gökçe, Heyder, Xortê Kurd,</i>	97
- Trahison (nouvelle) - <i>Umrero Adînn</i>	101
- Le folklore de Dersim (II) - <i>Firat</i>	105
- Vie de Mehmet Şerif Efendi de Goruzij - <i>Ahmet Say</i>	112

EN KURDE MERIDIONAL

- Une introduction à l'histoire de la critique littéraire kurde - <i>Sebahî Xalîb</i>	203
- Poème inédit - <i>Hawar</i>	189
- Gelaz (nouvelle) - <i>Siyamend Şêxaqayî</i>	187
- Le droit des peuples à l'auto-détermination dans la théorie marxiste - <i>Horace B. Davis</i>	167

La revue "Espoir" est une publication bi-annuelle de l'Institut Kurde. Elle est ouverte à tous les courants de la vie culturelle kurde.

Les textes publiés n'engagent que la responsabilité de leur auteur.

Pour toute correspondance, écrire à : *Institut Kurde de Paris*
106, rue La Fayette - 75010 PARIS - FRANCE. Tél : (1) 48 24 64 64

HÊVÎ

KOVARA ÇANDIYA GİŞTİ



Imprimé en Italie

© INSTITUT KURDE DE PARIS – 1986 – ISSN 0761-1242

Kurmanc di dewleta dinê da
Aya bi çi wechî mane mehrûm ?
Bîlcimle ji bo çi bûne mehkûm ?

Ehmedê Xanî (sedsala XVII)

SERECEM

KURMANCÎ

- Zaneyê mezin Qanatê Kurdo - <i>Joyce Blau</i>	7
- Me Seydayê Hişyar wenda kir - <i>Temo Zêrîn, Lokman Polat</i>	16
- Hêmin jî mir - <i>Joyce Blau</i>	19

BELGE

- Bîranînên Ihsan Nûrî Paşa (IV)	25
----------------------------------	----

KURDNASI

- Nêrînek li ser jiyan û xebatêن Basile Nikitine - <i>Helkewt Hekim</i>	41
---	----

EDEBIYAT

- Serdar - <i>Tosinê Reşît</i>	48
- Enwerê Mayî û berhemên wî - <i>Dîldar Berwari</i>	60
- Hemîdo û Avûkat - <i>Firat Cewerî</i>	62
- Neviyê Kalê Siyamend - <i>Kalo</i>	68
- Şelmaqa Coxrafayayê - <i>Çerkezê Reş</i>	69

PIRTÜKÊN NÛ

- Keremê Reş û pirtûka wî ya nû - <i>Têmûrê Xellî Mûradov</i>	70
---	----

- Keremê Reş û pirtûka wî ya nû - <i>Têmûrê Xellî Mûradov</i>	82
---	----

DUMILÎ

- Dimilkî (zazakî) ya Batûmî - Qanatê Kurdo	85
- Qawxê Nêrib û Hêni - Arêkerdox : Peter Ivanoviç Lerch	88
- Heme be herri û xwi ra cêr diyayey - Enver Gökçe	92
- Bilbliyografa dimilî (zaza) - III - Malmisanij	95
- Hîrî Gonî - Heyder	97
- Dayê Welat bol şîrîn o - Xortê Kurd	100
- Bêbextî - Umero Adırın	101
- Folklorê Dersimî ra - II - Arêkerdox : Fırat	105
- Mehmed Şerîf Efendiyo Goruzij - Ahmet Say	112

KURMANCIYA XWARÊ

- Beşek le mêtûy rexney edebî kurdî - Sebahî Xalîb	203
- Awarey fermêsky dayikî şehîd - Hawar	189
- Gelaz - Siyamend Şêxaqayî	187
- Maffî diyarîkirdinî çarenûsî millî le tîorî marksistî da - Horace B. Davis	167

MIRINA ZANEYÊ MEZIN QANATÊ KURDO

Joyce BLAU

Di şeva 31.10.1985 de zane û welatparêzê navdar Qanatê Kurdo li Leningradê wefat kir. Bi mirina wî gelê kurd yek ji hêjatirîn zaneyên xwe, Enstituya Kurdî, carek din, hîmdarekî xwe yî giranbiha winda kir.

Q. Kurdo di sala 1909 de li gundê Sûsizê, nêzikî Qaxizmanê, di navçeya Qersê de hatibû dinê. Ev navçe, ku niha di tixûbên Komara Tirkîyê de ye, hindê li jêr hikmê Rûsyâ tsarî de bû. Bavê wî, Keleş Xidir, gundiyeke belengaz î ji eşîra yezîdi ya Şerqî bû. Şerê Cihanî yê yeka vê navçeyê serobinî kiribû û xesareke mezin gihadibû rûniştevanên wê yên kurdî. Malbata Qanat ji ber şer û ji ber hovîti û xwînrêjiya ordûyên osmanî mecbûr ma axa bav û kalên xwe biterikîne û ber bi Bakur ve here. Ew pêşiyê li Çinkaniyê (Koblaخê), di navçeya Aparanê cîwar dibe, lê pêşveçûna leşkerên osmanî mihacirên kurdî mecbûr dike ku hê dûrtir herin. Malbat, di dawiyê de, xwe dîghîne Tiflisê û li wir, pey çend mehan, di 1921 de bavê Qanat, Keleş dimire. Mala wan belangaz û şerpeze dimîne.

Cîwarbûna berebereyi ya rejîma sovyeti hêdî hêdî jiyana wan û ya hemû cemaeta kurdî ya Qafqasyayê diguherîne. Hagop ("Lazo") û Olga Gazaria ji bo xorten kurd ên bajarê Tiflisê yekemîn xwendegheha kurdî vedikin. Ji bo hînkirina wan Lazo ji tipêr ermenî alfabyeke kurdî çê dike. Qanat jî diçe vê xwendeghehê û gava ku ew di 1928 de wî diqedîne, Ereb Şemo, ku bi çend salan ji wî mestir bû, ji Partiya Komunist a Ermenistanê heşt bûrs stendibû ji bo xwendekarên kurd herin li Zanîngeha Leningradê xwendina bilind bixwînin. Qanat dibe yek ji wan bûrsdaran. Ew di ilon 1928 de diçe Leningradê û li wir, li ber destê A.A. Frejman û I.A. Orbelî, çêtirîn rohelatnasên sovyeti yên wê demê û hîmdarên kurdnasiya sovyetî, dibe xwendekarê irannasiyê. Ew wisa jî li cem I.I. Zarubin fêrî belûçî û zimanên pamîrî û tevî N.Y. Marr hînî zimanevaniya giştî dibe.

Hê xwendina wî xelas nebûye ku Q. Kurdo di 1934 de, dibe mamosseyê kurdî, pêşiyê li Fakulta Filolojiyê û dûre ji li Enstituya Xebatkaran. Di nav teqereqa Şerê Cihanî yê duwemîn de teza xwe ya doktorayê li ser "avahiya bêjeyên lêkerî (fîlî) di

zimanê kurdî de" temam dike û wê di 1941 de dide çap kirin. Kurdnasiya sovyeti sal bi sal pêşve diçe û Kurd bi xwe di vê xebata zanistî de roleke berebere mestir dileyizîn.

Qanat bi xurtî beşdarî şerê li dijî neyarê nazî bûbû û gemaroya (mihasera) xedar a Lenîngradê bi xwe jiyabû. Piştî perçiqandina neyar, bi vegera aşitiyê ew dibe endamê Partiya Komunist a Yekîtiya Sovyetî. Di 1945 de ew dibe mamosteyê zimanê kurdî di beşê irannasî yê Fakulta Rohelatnasî ya Lenîngradê. Di 1959 de I.A. Orbelî di Enstituya Gelên Asyayê ya Akademiya Zanistî ya Yekîtiya Sovyetî de beşekî kurdî yê serbixwe datîne û ji 1961 pê ve şerefa sermiyaniya vî beşî dibe para Qanatê Kurdo.

Xebatkarê westiyanenâs, Q. Kurdo di gelek warên kurdnasiyê de afirandinên girîng dihêle. Ji bo çêkirina lîsteke xebatê zanistî yên wî me ji kaniyên cihê kelk girt û mixabin me nikaribû têkûziya tevahiya van agahdariyan kontrol bikin. Me stêrkekê daniye ber hin agahdariyên ku dereca rastiya wan baş ronak nîne lê dikarin bi kêrî xwendevan bêñ. Bibliyografya jérîn li gora pergala dîrokî hatiye çêkirin û me ew bi çar waran dabeş kir : zimanevanî, folklor û edebiyat, dîrok, ferheng.

A - ZIMANEVANÎ

1. Nasandina gramera kurdî ya A. Xaturian, di Riya Taze, №. 36 û 37, Erîvan, 1937.
2. Bi hevkariya A. Şamîlov û I. Cukerman, *O problema roda v kurdskom jazyke* (Li ser pirsa cîsnê di kurdî de), di Revolijucija i Pis'mennost (Şoreş û Edebiyat), №. 1, Moskva-Leningrad, 1933, r. 160-178.
3. Bi hevkariya A. Şamîlov û I. cukerman, *Ob izafete v kurdskom jazyke* (izafe di zimanê kurdî de), di Revolijucija i Pis'mennost (Şoreş û Edebiyat) №. 1 (16), Moskva-Leningrad, 1933, r. 51-56
4. Li ser zimanê edebî yê kurdî yê Ermenîstana Sovyetî, di Riya Taze, №. 31, Erîvan, 1933.
5. Qaîdeyên nivîsandina zimanê kurdî, di Riya Taze, №. 33, Erîvan, 1933
6. Pêşvebirina zimanê kurdî, di Riya Taze, №. 68, Erîvan, 1934.
7. *Obrazovanie složnyx glagolov v kurdskom jazyke* (avahiya bêjeyên lêkerî di zimanê kurdî de), kurteya teza doktorayê, Leningrad, 1940, 4 r.
8. Gramatika zmanê körmanji ya kört ji bona dersxanê III-IV, Erîvan, Neşireta dewleta Ermenîstan, 1949, 157 r. Ev rîzimana kurmancî roleke girîng leyist di xwendegahê kurdî yên Ermenîstana sovyetî de ; bi alfabeşa kîrîlik (rûsi) hatiye nivîsin.
9. Rastnivisîna kurdî, di Riya Taze, № 58, Erîvan, 1955.
10. Kritika oşiboçnyx vzgljadov na kurdskij jazyk (Rexneya dîtinên xelet li ser zimanê kurdî), di Kratkie Soobşçeniya Instituta Vostokovedeniya, KS IV, cild XII, Moskva, 1955, r. 43-61 (Rexneya teoriyên jafetî yên Marr ku B. Miller, O. Vilçevskij

- û I. Cukerman tetbîqê zimanê kurdî kirine). Ewirehman Hacî Marif vê lêgerîne bi navê "Rexne le bîr û bawerî hele le barey zimanî kurdiyewe" wergerandiye kurmanciya xwarê (soranî) û di *Hendêk bîr û bawerî hele le barey zimanî û mêtûjî kurdewe* de derxistiye, Bexda, 1973-1974, weşana Kora Zanyarî ya kurdî, r. 69-105.
11. *Gramatika z'manê körđî ser zaravê k'örmancî bona komêd V-VI*, Erîvan, Weşanxana Haypethrat, 1956, 175 r. Çapa nû ya pirtûka ku di 1949 de derketibû.
 12. *Numerativnye slova v kurdskom jazyke* (Peyivên hejmartinê di zimanê kurdî de), di *KSIV*, cild XXII, Moskva-Lenîngrad, 1956, r. 28-36.
 13. *Grammatika kurdskogo jazyka* (kurmandzî), *fonetika, morfologija* (Rêzimana zimanê kurdî, kurmancî, fonetik, morfolozi), Moskva-Lenîngrad, 1957, 343 r. Weşana Akademiya Zanistî ya Yekîtiya Sovyetî. Ev rêzimana kurmancî, bi zimanê rûsî, bi bîranîna lêgerînên rêzmanî ku heta salêن 1950 hatine kirin, dest pê dike (r. 4-14). Di dawiya wê de pênc çîrok û helbestên kurdî bi tîpêñ latînî û kîrîlîk nîvîsî (r. 300-334) û pirtûknasiyeke helbijartî (r. 336-338) hene.
 14. *Kurdki jazyk* (Zimanê kurdî), di *Sovremennyj Iran* (Irana hemdem), Moskva, 1957, Weşana Akademiya Zanistî ya Yekîtiya Sovyetî, r. 60-75.
 15. *K voprosam slovoobrazovaniya v kurdskom jazyke. 1-leksiko-grammatičeskoe značenie udvojenija slov v kurdskom jazyke. 2- Obrazovanie otvlečennnyx imen v kurdskom jazyke* (Li ser pirsên çêkirina peyivan di zimanê kurdî de 1. Mana ferhengî û rêzmanî ya ducarbûna peyivan 2. Çêkirina navêñ muceret di zimanê kurdî de), di voprosy *Grammatiki i istorii Vostočnyx jazykov -VGIV*, Moskva-Lenîngrad, 1958, r. 109-142.
 16. *O dvux principax obrazovanija složnyx slov podçinitel'nogo tipa v kurdkom jazyke* (Li ser du bingehêñ çêkirina peyivên hevedudanî yêñ pêgir di zimanê kurdî de) di *KSIV*, №. XXIX, 1959, r. 65-74.
 17. *Ob'ektnoe i sub'ektnoe sprjaženie perexodnogo glagola y kurdskom jazyke na materiale dialektov kurmandži i sorani* (Bikaranîna lêkera derbasek di zimanê kurdî de. Ji ber materyelêñ zaravêñ kurmancî û soranî). Gotar di Kongra navneteweyî ya XXV a rohelatnasân, Moskva, 1960, 9 r.
 18. *O značenijax i funkcijax suffiksa -k (-aka) v kurdskom jazyke* (Rûmet û karîneyêñ paşdaniya -k (-aka) di zimanê kurdî de) di *Issledovaniya po istorii kul'tury narodov Vostoka. Sbornik v čest Akademika I.A. Orbeli* (Lêgerîn li ser dîroka çandêñ gelêñ Rohelat. Berhevoka diyarı ji akademîvan I. A. Orbeli), Moskva-Lenîngrad, weşana Akademiya Zanistî ya Yekîtiya Sovyetî, 1960, r. 361-368.
 19. *Gramatika zmanê k'ördî bona dersxanêd V-VIII*, Erîvan, 1960, 206 r.
- Ev afirandin çapa nû ya pirtûka ku di 1956 de derketî ye. Nivîskar beşek li ser fonetîkê bi serve kiriye, ku di çapêñ berê de nebû.
20. *Kurdskej Jazyk* (Zimanê Kurdî), Moskva, 1961, 79 r. Izdatel'stvo Vostočnoj Literatury Jazyki Zarubežnogo Vostoka i Afriki, pod obşcêy redakciej Prof. G.P.

Serdjuçenko. Kurteyek piçük, bi zimanê rûsî, a rêzimana kurmanciya jorîn û navendî. Kurdî bi alfabeşa kîrîlik hatîye nivîsîn.

21. *Suffiksacija v kurdskom jazyke* (Paşdanî di zimanê kurdî de), di KSIV №. 67, Moskva-Leningrad, 1963.

22. *Zimanê K'ordî, rêziman, k'itêba dersê bona dersxanêd IV-VII*. Çapa nû ya pirtûka di 1960 de derketî. Weşanên Komkar vê pirtûkê qelibandine tîpêñ latînî û di 1981 de li Frankfûrtê çap kirine.

23. *Kategorija roda i ob'ektnaja konstrukcija v zaza* (Cisn û avahiya yekser di zazayî de), di *Iranskoe Jazykoznanie*, Moskva, 1975, r. 104-118. Ibrahim Ezîz Ibrahim vê bendê bi navê "haletakanî cins û binay berkar le zaza de" wergerandiye kurmanciya navendî (soranî) û di *Govarî Korî Zanyarî Kurd*, cild 5, Bexda, 1977, r. 236-263 de belav kiriye.

24. *Eşçë raz o formax množectvennogo čisla imena v kurdskom jazyke* (Carek din li ser teşeyêñ pirejmariya navan di zimanê kurdî de) di *Inst-Vost. A.N., Leningradskoe otdelenie*, cild I, Moskva, 1977, r. 256-259.

25. *Grammatika kurdskogo jazyka, na materiale dialektov kurmandžî i sorani*, (Rêzimana zimanê kurdî, bi materyelêñ zaravêñ kurmancî û soranî), Akademîya Zanîstî ya Yekîtiya Sovyetî, Enstituya Rohelatnasiyê, Moskva, 1978, 294 r. Rêzimanek berhevdayî ya her du zaravêñ edebî yêñ kurdî.

FOLKLOR Û EDEBIYAT

26. Bi hevkariya I.I. Cukerman, *Kurdske Teksty* (Metnên Kurdi), di *Iranskie jazyki*, cild II, Moskva-Leningrad, 1950, r. 29-61. Metn û wergerandinê Mamê Eyşê û Ebûzêtê bin Halal, tevî nişeyen ronakker.

27. *Tarîxa nivîsandin û çapkirina ferhengêt kurdî*, di Ronahî, № 8 û 9, Bexda, 1961.

28. Bi hevkariya M. Rudenko, *Kurdske poslovicy i pogovorki* (Methelokên kurdi) di *Poslovicy pogovorki narodov vostoka*, M.I.V.L., Moskva, 1961, r. 330-339.

29. * Sêva Acî, destaneke romantik a kurdi, Moskva, 1962.

30. * Qelay Dimdim, destaneke mîrxasî ya kurdi, Moskva, 1962.

31. * Memê Eyşê, destaneke romantik a kurdi, Moskva, 1962.

32. Pêşgotina (r. 5-11) pirtûka Marûf Xeznedar Kêş û qafîye li şî'rî kurdi da, Bexda, 1962, 67 r.

33. Bi hevkariya I.I. Cukerman, *Iz Kurdkogo eposa* (Ji destanên kurdi), di *Iranskij sbornik k semidesjatiatiletiju Prof. I.I. Zarubina*, Moskva, 1963, I.Z. Vostočnoj Literatury, Akademîya Zanîstî ya Yekîtiya Sovyetî + Inst. Jazykovnanija + Inst. Narod Azîi, I.V.L., r. 249-255.

34. *Bîr û bawera kurdayetiyê di nivîsarêd Ehmedê Xanî de*, di Çiya № 7, Berlin, tebax 1969, r. 3-6 û №. 8, kanûn 1970, r. 3-4.

35. * Légerin li ser edebiyata kurdi li Iraqê, di NAA (Kovara gelên Asya û Afrikayê), №. 2, Moskva, 1975, r. 143-155. Şukriya Resûl vê xebatê wergerandiye kurman-



ciya navendî û di Govarî Korî Zanyarî Eraq, destey kurdî, cild VII, Bexda, 1980, r. 81-112 de belav kiriye. Lêgerin li ser edebiyata kurdî li Iraqê ji dawiya sedsala dawîn ta salên 1960 e. Stî Resûl tenê bendê wernegerandiye hin şaşiyêne wê jî rast kiriye.

36. Komele têkstî folklorî kurdî, Bexda, weşana Korî Zanyarî Kurd, 1976, 273 r. Şukir Mistefa û Enwer Qadir Mihemed van metnên kurmancî qelibandine tîpén erebî yên ku li Iraqê bikar tînin. Pirtûk bi ketiniyeke Ewîrehman Hacî Marif li ser dîroka pêkanîna berhevokên folklorâ kurdî dest pê dike. Tê de destanên : Eli Memedê nêçîrvan ; Ebûzêdê bin Helal ; Mîrza Memûd ; Çîroka tûlî ; Fêr û porsor ; Mîr Mih ; Ehmedê Bextewar ; Du rîwî ; Ehmedê pale ; Dimdim ; Pendêd pêşînan ; Folklorâ Kurdên Azîrbêcana Sovêtiyê ; Gepê pêşînan ; Du para şêr ; Têderxistinok hene.

37. Derheqa şovêd Mem û Zînê, zargotî û şova Mem û Zîna Ehmedê Xanî ji nivîsara peywendiya folklor û lîtératûra kurdî, di Govarî Korî Zanyarî Kurd, cild. VI, Bexda, 1978, r. 78-110.

38. Bir û bawera wetenperweriyê li folklor û lîtératûra Kurda da, di Kurdistan, dengê Yeketiya Xwendekar û Lawanên Kurdistan li Awrûpa, №. 2, tebax 1983, r. 15-24. Ev nivîsar paşê bi kurmanciya navendî bi navê bi navê "Bir û bawerî niştimanperwerî le folklor û edebî kurdî da" di kovara Pêşeng, organa Partî Demokratî Gelî Kurd, №. 4. kanûn 1983 de derketiye.

39. Tarixa Edebyeta Kurdi, cild 1, Stockholm, weşanên Roja Nû, 1983, 192 r.

Cildê yekemîn ê vê pirtûka ku bi kurmancî û tîpén latîni hatîye nivîsin li ser jiyan û afirandinên şairên Kurdistana bakur e : Eli Herîrî, Ehmed Mele Batê, Feqê Teyran, Meleyê Cizîrî, Selîm Sulêman, Ehmedê Xanî, Xaris Bitlisî, Pertew Begê Hekarê, Şêx Xalid, Siyahpûş, Cigerxwîn, Osman Sebrî û Qedîcan. Tê de wisa ji ketiniyeke dirêj heye li ser tevahiya xebatênu ku ji weşana Recueil de notices et récits kourdes a A. Jaba li St. Petersburgê di 1880 de ta iro li ser edebiyata kurdî hatine kirin. Nivîsar li ser rola çapemeniya kurdî pir radiweste.

40. Tarixa Edebyeta kurdi, cild 2, Stockholm, 1985, 178 r. Ev cildê duwem a Tarîxê li ser jînenigariyê û afirandinên şairên ku bi kurmanciya navendî nivîsîne ye : Nalî, Kurdî, Hacî Qadir Koyî, Şêx Reza Telebanî, Edeb Ebdila Misbah, Mela Mihemed Koyî, Wefayî, Xerîq, Bêhûd, Zîver, Sebrî, Selam, Salim, Qane Muzher, Ahmed Muxtar Beg, Piremîr, Ebdullah Goran, Dildar, Bêkes, Remzî, Mela Marif, Hejar.

C. DİROK

41. Zarubežnaja kurdskaia literatura o SSSR (Weşanên Kurdên dereke li ser YKSS) di Naučnaja sessija 1948 g. Leningradskaja Gosudarstvennako ordena, Lenina Univ. im. A.A. Ždanova, Leningrad, 1948, r. 45-46.

42. Zaruberžnaja kurdskaia literatura o položenii Kurдов v SSSR (Weşanên Kurdên dereke li ser rewşa Kurdên YKSS) di Uçenyne Zapiski LGU, 1952, №. 128, rêza rohelatnasiya zanistî, №. 3, Istorija i Filologija Vostoka, r. 136-150.

43. *Falsifikacija istorii Kurдов v persidskoj buržuaaznoj istoriografii* (Tehrîfa dîroka Kurdan di dîroknîsiya bûrjûwayî ya farisî de). Leningrad, №. 179, rêza rohelatnasiya zanistî, №. 4, 1954, r. 120-137. Ev nivîsar rexneyek e li ser pirtûka Xolam Reza Reşid Yasemî Kord ve peyvestegiyê tarîxi ve nejadîyê (Kurd û peywendiyên wan ên dîrokî û rêgezî). Ewîrehman Hacî Marif vê benda Q. Kurdo wergerandiye kurdîya navendî û di *Hendêk bir û bawerî hele le barey ziman û mêtûjî kurdewe*, Bexda, weşana *Korî Zanyarî Kurd*, 1973-1974, r. 34-68 belav kiriye û Abdullah Merdûx jî wê kiriye farisî û di kovara *Alif Ba*, №. 5, Paris, 1984 de çap kiriye.
44. *Xaçatur Abovian kak kurdoved - etnograf* (Xaçatur Abovian wekî kurdnas - etnograf) di *Izvestija A.N. Arm. SSSR*, rêza zanistiyên civakî, cild XX, Erivan, 1955, r. 89-98.
45. *Xaçatur Abovian kak kurdoved - issledovatel* (Xaçatur Abovian wekî kurdnas - lîger) di *Ocerki po istorii Russkogo vostokevedenija* (Nêrîn li ser dîroka rohelatnasiya rûsî), cild 2, Moskva, 1956, r. 360-380.
46. *Kurdy (Kurd)* di *Narody Perekop Azii* (Getên Asya nêzik), Moskva, Akademiya Zanistî ya YKSS, 1957, r. 242-260.
47. *Uspexi Sovetskogo kurdovedenija* (Pêşveçûnên kurdnasiya sovyeti) di *Kommunist*, Erivan, 6.10.1959, №. 236 (7709), r. 3.
48. *Trudy P.L. Lerxa po kurdovedeniju - K voprosu ob izuchenii istorii Kurдов v Rossii* (Xebatên P.L. Lerch li ser kurdnasiyê. Li ser pirsa dahûrîniya dîroka Kurdan li Rûsyayê) di *Ocerki po Istorii Russkogo Vostokovedenija*, Moskva, Akademiya Zanistîyan, Enstituya Rohelatnasiyê, cild IV, 1959, r. 39-51. Ev Xebat hatîye wergerandinê kurdîya navendî û li jêr navê "Nûsrawekanî Lêrx le barey kurdewe" di *Govarî Korî Zanyarî Kurd*, cild 2, Bexda, 1974, r. 624-663 de çap bûye.
49. *Razvitie sovetskogo kurdovedenija* (Pêşveçûna kurdnasiya sovyeti), di Uçénye Zapiski Instituta Vostokovedenija, Akademiya Zanistî ya YKSS, cild XXV, Moskva, 1960, r. 57-67.
50. *Tarîxa çêkirin û neşriyata ferhengên kurdi*, di *Ronahi*, Bexda, №. 9 û 10, 1961.
51. *Birê kurdnasiyê li Leningrad* di Çiya, №. 4-5, 1967-1968, r. 4-5.
52. *Kitêb û miqalêd kurdnasi*, di Çiya, №. 6 û 7, 1968-1969.
53. *Le babet nevîskar, ziman û elîfbayê pertükêt dînê êzîdiyan*, di *Govarî Korî Zanyarî Kurd*, cild 1, 1973, r. 132-179.
54. *Şikirdinewey belgekanî Geznefon' derbarey Karduxekan*, di *Hendêk bir û bawerî hele le barey ziman û mêtûjî kurdewe*, Bexda, 1973-1974, r. 106-120. Ewîrehmanî Hacî Marif tevahiya gotara ku Qanatê Kurdo di Konferansa Irannasan a ji bo xatirê şest saliya Profesor Boldirev de xwendibû wergerandiye kurmanciya navendî. Kurteyek vê gotarê di 1969 de li Moskovayê derketibû. Marûf Xeznedar vê kurteyê kiribû kurdi û di *Defterî kurdewari* №. 1, kanûn 1970, r. 121-126 de belav kiribû.

* Geznefon : nivîskarê Yewnanistana kevnare Ksenefon.

55. Çend têbiniyek le ser kitêbekey Vilchevski, di *Hendêk bîr û bawerî hele le barey ziman û mêtûjî kurdewe*, Bexda, 1973-1974, r. 121-141. Ev nivîsara ku bi rûsî hatiye nivîsîn lê çap nebûye Ewirehmanî Hacî Marûf wergerandiye kurdîya navendî. O.L. Vilchevsky şagirtê akademîvan Marr bû û teoriyên wî yên "Jafetî" tetbîqê kurdî dike. Q. Kurdo li ber wî radibe.
56. Serincek le *nûsirawekey Akopov*, *rexney mêtûjî le meseley nejadî kurd da*, di *Hindêk bîr û bawerî hele le barey ziman û mêtûjî kurdewe*, Bexda, 1973-1974, r. 142-166. G.B. Akopov, iro serokê beşê kurdnasî yê Zanîngeha Erîvanê, şagirkî akademîvan Marr e; Q. Kurdo bi xurtî li dijî tezên wî yên li ser eslê Kurdan derdiikeve.
57. I.A. *Orbelî û kurdnasî*, wergerandin û têbiniyên Ewirehmanî Hacî Marif, di *Goverî Korî Zanyarî Kurd*, cild 3, Bexda, 1975, r. 113-142.
58. *Margarita Borisnova Rudenko*, 1926-1977. di N.A.A., 1977, №.4, r. 147. Nivîsarek li ser mirina kurdnasa sovyetî ya navdar Rudenko.
59. K. istorii kurdskoj periodičeskoy peçati (gazeta Kurdistan) (Li ser dîroka kovara kurdî Kurdistan), di Pis'mennye pamjatniki i problemy istorii kul'tury narodov vostoka, Akademiya Zanîstî ya YKSS, cild II, Enstituya Rohelatnasiyê, Moskva, 1982, r. 119-125.
60. Disertasiyên kurdnasiyê, di *Roja Nû, kovara hunerî, çandî û edebî*, №. 8, Stockholm, 1985, r. 477. Nivîskar qala hemû tezên doktorayê ku xwendekarê sovyetî an ne sovyetî li Yekîtiya Sovyetiyê di warê kurdnasiyê de çekirine dike : 38 tez li ser edebiyat û folklorâ Kurdan ; 18 tez li ser zimanê kurdî û zaravên wî.
61. Nivîsara kurteberî ya tarîxa kurdnasiya Rûsistan û Sovêtistanê, di *Roja Nû, kovara hunerî, çandî û edebî*, №. 11, Stockholm, 1986, r. 8-11.

D - FERHENG

- 62.* Çend gotin li ser ferhenga fileyî - kurdî, di *Riya Taze*, №. 31, Erîvan, 1933. Nivîsareke kurt li ser *Armjano-Kurdskij slovar* a V. Petoyan, Emînê Evdal, Heciyê Cindî û Ç. Genco, Erîvan, 1933, 330 r, 9000 gotin.
63. *Kurdsko-Russkij slovar*, *Ferhenga Kurdi-Rûsi*, Moskva, 1960, 890 r.
- Bi 34.000 gotinên xwe ev ferheng firehtirîn ferhenga kurdî ye ku ta iro hatiye çap kirin. Ew alfabeşa Hawarê bi kar tîne û dengên e', h' û ï bi ser ve zêde dike ji bo nîşandana hin xasitiyên axaftina kurdî. Kaniyên xebata Q. Kurdo afirandinên kurdî yên ku li Sovyetistan û li welatên din derketine ne. Gotinên berhevkirî, bi piraniya mezin, ên kurmancî ne.
64. Bi hevkariya Zarê A. Yusupova, *Kurdsko-Russkij slovar (Soranî)*, Moskva, 1983, 752 r., dora 25000 gotinan. Ev ferhengeke girîng a kurmanciya navendî ye (zaravên Sulêmaniye, Hewlêr, Rewandûz, Koy Sancaq, Kirkûk, Mahabad, Şno, Banê, Senendej). Kurdî bi tipen erebî yên ku Kurdên Iraq û Iranê bi kar tînin hatiye nivîsîn û gotin li gora rêza vê alfabeşî hatine bi rêz kirin. Gelek pisporêk kurdî yên ji

Kurdistana Iraqê beşdarî pêkanîna vê ferhengê bûne. Piştî her gotinê nivîsandina wê ya bi tipêñ latînî (alfabeya Hawarê) hatiye danîn. Ferheng haletekî xebatê î hêja ye û bi ser de bi awayekî xweşik hatiye çap û pêşkêş kirin.

Ev nivisara Joyce Blau, mamosteya zimanê kurdi li Zanîngeha Parîsê, ji bo kovara HÊVÎ bi zimanê fransizî hatiye nivisin û hevkarên Kovarê wê wergerandine kurmancî.

ME SEYDAYÊ HİŞYAR WENDAKIR

Temo ZÊRÎN
Lokman POLAT

Mamostê têkoşer û mîrxas, hişyar û bîrewer Mela Hesenê Kurdî (Hişyar) di 14 ê meha îlona 1985 an de li Kurdistanâ Suriyê, di 78 saliya xwe de çavêن xwe girt û ji nav me barkir, çû li ser heqîya xwe. M. Hesenê Kurdî di goristana "Dugir" de hate veşartin. (Dugir di navbera Qamişlî û Tirbespiyê de cihekî muqedes e. Şoreşgerên ku ji welatê xwe bi dûr ketine pirî caran li wir têne definkirin).

Şterkeke kurd û kurdaniyê ji ezmanê Kurdistanê xuricî. Bi mirina Seyda em gelekî xemgîn û dil bi kul in. Kurdistanê lawekî xwe yî ronakbîr û qelemsor wenda kir. Ew yek ji rêber û pêşawayê xebata rizgarîxwaz ê gelê kurd bû ; bêwext û vênpola bû, ew di laşê kurdaniyê de lebatek bû, xwe tu carî ji warê xebata kurd û kurdayetiyê ne dida alî, timî li refîn pêş bû. Hişyar ji bona doza Kurdistanê gelek eş û cefa kişandibû, dîtibû, jiyabû û lewra jî dizanibû ku, ger Kurd dest nedin hev, nebin yek wicûd, zana û xwenda nabin, dê her têkbiçin, biterpilin, bibin maşika destêneyara û her weha jî jar û bindest bimînin.

Seyda ji tevgîra Kurdistanâ Iraqê bi hêvî bû. Digot qey wê bi ser keve lê welê ne bû û ev tevgîra jî wekî yên din, di sala 1975 an de şikiya, têk çû. Tevgereke welê xurt û hevgirtî kêm caran di dîroka Kurdistanê de pêkhatibû, lê çîma bi ser ne diket ? Bend û kelemêr rê lê digirtin gelo ci bûn ? Cihê Kurdistanê yê jeo-politik, têkiliyên hêzên derva, rewşa Kurdistanê ji berê hê baştir û zelaltir bi Seyda dida xuyakirin.

Seyda biryara xwe dabû ku bi şêweyekî xebatê î nû, ango bi niviskî, serpêhatînên xwe, jiyan û dîroka Kurdistanê tevî belge û wêne ji nifşen dahatû re diyarî berde da ku ew ji van fêrîna biderxînin û nekevin nav vê sergêji û geremola lew em îro tê de dijîn.

JIYANA HİŞYAR

Seyda li gundê Serdê (di navbera Hêne û Lîce de ye) sala 1907 an ji dayika xwe bûye. Dema şoreşa Şêx Seîd dest pêkir ew xort bû. Hişyarê Kurd bi çekdarî

beşdarî tevgera Şêx Seîd dibe. Di sala 1927an de hêsîr (dîl) dikeve destê Tirkan. Di «Mehkemên Îstiqlalê» de hikim didinê û wî surgûnî bajarê Niğde'yê (Bajarekî Tirkan) dikan.

Seyda di sala 1928 an de bi derxistina e'fuya giştî tê berdan û vedigerê Kurdistanê û cî de xwe digehîne şoreşa Agirî û di nav hêzên welatparêz de dîsan bi çekdarî hemberî kolonyalîstên tirk ditêkoşe. Pey têkçûyîna serîhildana Agirî derbasî Kurdistana Sûriyê dibe.

Seyda zewicî û bavê sêzdeh zaruhan bû. Pênc law û heşt keçen wî hebûn. Lê hemû giriftariyêni jiyanê ne dikanibüñ zora armanca Seyda a niştimanperwerî bibirana. Seyda xebata Kurd û Kurdistanê di ser her tiştî re digit, şev û rojêni xwe, rehetiya canê xwe û malbata xwe di doza Kudistanê de feda kiribû. Malbata wî bûbû du cî, hin zaroyêni wî li Ser-Xetê (Kurdistana Tirkiyê) û ên mayî li Bin-Xetê (Kurdistana Sûriyê) dijiyan. Seyda çareserkirina pêşîrtengî û gelşeyêni xwe di rizgariya Kurdistanê de didit. Lewra jî digot : «Heta Kurdistana me bindest be, dilşahî û rehetiya me dê nînbe.» Hêvî dikir ku rojekê vegere warê bav û kalêni xwe. Lê sed mixabin ev daxwaza ha bi Seyda re çû gorê.

XEBATÊN WÎ

Mele Hesenê Kurdî di jiyanâ xwe de ji bo doza Kurdistanê xebateke hêja kir. Ew wek hemû ronakbîr û welatparêzenê Kurd ên wê demê bûbû endamê rêtixtina "Xoybûn"ê û di nav gelê welatparêzenê Kurd de bi rêtixtinî dixebitiyan. Seyda li ser ziman, çand û coxrafiya Kurdistanê jî xebatêni hêja dikir. Di kovarêni Hawar, Ronahî û Çiya de pir nivîs û helbestêni wî derket. Di kovara Hawarê de "Kurd û Kurdmanc", "Kurdistana Bakur, avayê ewînê" û di Ronahîyê de jî "Tiştêni rast, bangê Kurda, Civata Bêdeng" bi navê Hesenê HIŞYAR nivîsand.

Seyda di salêni 1956-57an de komela civak-kultirî a kurdî digel çend hevalêni xwe li Kurdistana Sûriyê damezrand. Berhemê vê komelê weşandinâ du pirtükên hêja û xebatêni folklorîk bûn. Pirtûka Nureddîn Dersimî bi navê "Dersim Tarihi" weşandin. Pirtûka din jî bi navê "Bi Riya Qaçaxçıyan" bû û ev pirtûk li Kurdistanê Tirkiyê dihate belavkirin. Dîsan bi navê "Jenosît" pirtûkeke bi sê zimanî (tirkî, ingilîzî û fransızî) li ser eşîra "Ciwananî" (li Kurdistanâ Iranê) hatîye nivîsandin, di vê pirtûkê de hilweşandinâ cih û warêni vê eşîrê û qirkirina şeniyêni wê tête kirin. Ev pirtûk Kamuran Bedirxan li Fransayê derxistibû û belavkirina wê a li Kurdistanê vê komelê girtibû ser xwe.

Mele Hesenê Kurdî, Nûreddîn Dersimî, Rewşen Bedirxan û hinîn din bi hevre bi navê "Wijdan" rojnamekê derdixin, dû re navê vê rojnamê dikan El Huriye, ev rojname bi alîkariya rêtixtina "EOKA" li Beyrûdê dihate weşandin. (EOKA rêtixtineke Kibrîsî bû û jî bo azadiya Kibrîsê li dijî ingilîzan têkoşin didan). Di vê kovarê de Qanatê Kurdo û İsmet Şerîf Wanîjî nivîs dinivîsandin. Seyda salê carekê kovara Agahî jî derdixist û heta sala 1985 li ser 19 hejmar derket.

Mele Hesenê Kurdi di nava gelê xwe de pir geriyabû û derdê nezaniyê û nexwendinê baş zanibû. Di nivîsekê xwe de Hişyarê Kurd weha dîbêje : «Ger em nexwînin dê ewrêñ reş û tarî, mij û dûman her li ser esmanê Kurdsitanê bin, û emê rojêñ xweş nebînin, û her li bin lingê neyaran bibin gêrik û mirî. Lê dîrok serxwebûn û serfirazîyê dixwaze û ji bo pêkanîna vê em xwedî dest û ling, çav û gav in, kêmasiyên me nezaniya me ye.”

Mele Hesenê Kurdi di nava gelê kurd de û di Ewrûpa yê de hatibû naskirin. Shoreşger û welatparêzên kurd û merivên pêşverû û demokrat ên Ewrûpa yê wî baş dinasiyan. Antropologekî Holandayî M. Martin Van Bruinessen bi navê “Agha, Shaikh, and State” pirtûkek di derbara tevgirêdana civakî û siyasi a Kurdistanê vedikolîne û di wê pirtûka xwe de salîxi û agahdariya şoreşa Şêx Seîd ji Seyda digre.

Mele Hesenê Kurdi li ser civak-aboriya gelê kurd pir pirtûk nivîsandîye. 18 pirtûkên wî hetanî niha ji ber bê îmkaniyên aborî nehatine çapkirin û weşandin. Em hêvîdar in ku rojekî berê pirtûkên wî derkevin û ji bo nifşen pêşende bibin çavkanî û rêçe ji bo gelê me, û ji bo têgihiştin, vekolin û dahûrandina civak-aboriya gelê kurd ber pêş bike.

Seydayê Hişyar wê her tim di dilê gelê kurd de bijî û gelê kurd dê wî ji bîr neke.

HÊMIN JÎ MIR

Joyce BLAU

Hozanê kurd ê navdar Hêmin di şeva 18 nîsan 1986 de li bajarê Wirmê (Ormiyê) ji sekteya dilî wefat kir. Malbata wî guhneda qedexeyiyên polîs û pasdarên Komara Islamî û wî li goristana Bidaq Sultan a Mahabadê veşart. Di Mizgefta Hecî Seyid Bayazîd a bajarê Mahabadê de dema nimêja cenazê de ji xelkê cî tunebû ; di mizgeftên Sene, Wirmê û Kermanşahê de roja duayêni ji bo guyana wî her wisa bû.

Seyid Mihemed Emînî Şêxulislamî Mokrî, ku bêtir bi navê Hêmin tê nas kirin di sala 1921 de li gundê Laçinê, nêzîkî Mahabadê hatiye dinê. Bavê wî Seyid Hesenî Şêxulislamî Mokrî yek ji neviyên Mela Carnî Çorî ye û ev malbat ji sê sed salan bi vê de li Mahabadê dijî. Diya Hêmin Zeyneb ji mala Şêxî Borhan, ji giregirên Mokriyan e. Di sala bûyina Hêmin de peyayên Ismaîl Axa Sîrko êrîşê anîbûn ser Mahabadê û bajêr talan kiribûn. Wekî gelek malên vî bajêrî malbata Hêmin jî hindê bajêr diterikîne, diçe gund. Di mala wan de heft zarok hebûn û Hêmin, bi temenê (emrê) xwe brayê duwemîn bû. Hêmin pirîcar li xwe mikur dihat ku zarotiya wî di xweşiyê de derbas bûye, xasme dayêna (diya şîr) wî Yasemîn û lâlâyê wî Izet, ku xelkên Azerbeycanê bûn û tirkî hînî wî dikirin pir jê hez dikirin.

Mamosteyê wî yê pêşîn Seîd Nakam bûye. Nakam nivîskar û rojnamevan bû û *Seyahetname* ya Ewliya Çelebî wergerandiye kurdî. Paşê bavê wî ew dişîne Xwendegheha dewletî Seadet. Li wir mamosteyekî faris ê ku ne bi kurdî ne jî bi adetên kurdî dizane dersê dide Hêminê biçük û ew van dijwariyên destpêkî qet ji bîr nake.

Gava ku sêzde salên wî temam dibin bavê wî ew dişîne cem Şêx Borhan, zaneyekî kal ï tarîqeta Neqşebendî. Tekya Şêx li Şerefkendê bû û ev bajarok li navbera Mahabad û Bokanê dimîne. Nav û dengê Şêx ji sînorên Kurdistanê pîr dibuhirî û ne tenê xortêni ji hemû navçeyên Kurdistana Mezin, wisa ji feqehêni hindî, afganî, tirkî, turkmenî û farisî jî dihatin li ber destêni wî dixwendin. Ev peywendî bi dinya derveyî re bandûreke (tesîreke) mezin dihêlin li ser Hêmin ê xort. Gelek jî zaneyêni navdar dihatin dîtina Şêx Borhan û bi xwendekarêni wî re dipeyivîn, dersê

didan wan. Bi vî awayî Hêmin kesên wekî Qazî Mihemed, serek-komarê kurd ê wêbeyê, pismamê wî Seyif Qazî, hozan. Hecî Mela Mihemed Şerefkendî, ku zaneyekî mezin bû û ronakbîrê pêşverû Elî Xanî Emînî dinase û ji han hîn dibe. Lê yê ku bandûra mestir li ser Hêmin dihêle Mamosta Ehmedî Fewzî ye.

Li ber destêne wî Hêmin mamosteyêne mezin ên edebiyata kurdî nas dike. Pêşiyê ew afirandinê heyama geş a tarîqetêne sofi û helbesta dînî hîn dike : Mehwî Neqşebendî (1830-1904), Mela Herîq (1851-1907). Lê ew bêtir ji şairêne welatparêzî û evinê, xasme ji Nalî (Mela Xidî Ehmedî Şawêysî Mixayîlî, 1797-1856) hez dike. Nalî yekemîn hozanê soran e ku qeside û xezelêne xwe bi kurdî nivisiye û himdarê ekola helbestî ya soranî ye. Şagirtê bîriqoktîrîn ê Nalî Hecî Qadir Koyî (1816-1894) ye ku xasitiya afirandinê wî hakimiyeteke mezin a teknîkêne helbestî, naverokeke civakî û bikaranîna zimanekî sade ye. Hin ji misreyen wî êdî bûne methelok, ketine ser zimanê xelkê. Hêmin helbesta hicvî ji Şêx Riza Telebanî (1832-1909) fêr dibe. Di nav hozanê hizkirî yên wî de divê ku em navê Ebdulla Beg, ku bêtir bi navê *Edeb Misbeh el-Diwan* tê nasîn, hildin. Helbestêne Edeb ji alî bedewî û estetikê ve pirr dewlemend in û wan ji bo evîna jina xwe nivisiye. Hozanêne "klasîk" li vê "evîna adeti" rexne digirtin û li dijî Edeb bûn.


Di hivde saliya xwe de Hêmin xwendîna xwe diqedîne û diçe ser milkêne xwe, li gundê Şilan Awê. Jiyana gundi û rîncberî ewê jê re dijwar xuya bikiranâ heke pirtûk û kovarêne wî ne li ber destêne wî bûna. Piştî karêne zeviyan, Hêmî vedigeriya malê, dixwend û dinivîsî.

Di 16 tebax 1942 de gava ku tevgera nihêni Komeley Jiyanewey Kurdistan tê danîn, bi piştgiriya Ebdul Rehman Zebîhî, tevî piraniya hevalêne xwe dibe endamê wê û wekî navê nihêni "Hêmin" heldibijêre. Helbesta wî ya navdar di wê demê de hatiye nivîsin :

Kurd im emin

Gerçi tûşî renceroyî û hesiret û derd im emin
Qet ledes em çerxe siple nabezim, merd im emin
Aşıqî çawî kejal û gerdinî pir xal nîm
Aşıqî kêw û telan benden û berd im emin
Ger le birsan û le ber bêbergî imro req helêm
Nokeri bêgane nakim ta le ser herdem emin
Min le zincîr û tenef û dar û bend bakim niye
Let letim ken, bimkujin, hêşa delém kurd im emin

Helbesta yekemîn a Hêmin di 1943 de, di hejmara duwemîn a kovara *Niştiman*, ku Şêx Ebdul Letîf, kurê Şêx Mehmûd Berzincî li Lahican, derdixist, belav dibe. Li jêr wê imza M.Ş. Hêmin hatiye danîn. Helbest tê ecibandin. Bavê Hêmin ku helbestê xwendibû û jê hez kiribû, ji kurê xwe dixwaze ku ew navê rastî yê nivîskarê vê helbestê hîn bibe !



Hêmin di demeke kurt de dibe endamê desteya nivîskarên *Niştiman* û tê de helbestine nû neşir dike. Ew hin helbestên xwe jî di kovara din a Komelê Awat de belav dike.

Ew dîsa di wê demê de şanoya xwe ya menzûm *Daykî Niştiman* dînivîse. Babeta wê gelek hêsa bû : jiyan û dîroka Kurdan. Leyistkar dikaribûn li ser sahnê vê jiyanê bi serbestî bileyizin. Ev şano gelek tê ecibandin. Qasî sê-çar mehan di piraniya gundêñ welatê Mokriyan de tê leyistin û ji hemû bajarêñ Kurdistana Iranê dişinîn pey leyistkaran. Şano bê gûman arîkariya hişyarbûna neteweyî ya temaşekaran dike. Hin jî wan dikûriyan, digirîn û paşê li ser wêbêya Kurdan dipeyivîn. Hatinî yên vê şanoyê ji hemû hêviyan dibuhurî. Bi saya van hatiniyan Komele karî jî xwe re çapxaneyek bikire û wê li Mahabadê bi cih bike.

Di teşrina 1945 de *Hizbî Democratî Kurdistan* li Mahabadê kongreya xwe ya yekemîn dicivîne. Qazî Mihemed ku bi navê nihêni yê Binayî bûbû endamê Komelê Serokê partiya nû tê helbijartin. Bi vê hincetê, ji bo cara pêşîn, Hêmin yek ji helbestên xwe ji xelkê re dixwîne. Baweremendêñ ecêbmayî guh didin Seyid Mihemed Emînî Şêxulislamî ku ji minbera Mizgefta Sûrî ji wan re helbestên welatparêzî dixwîne û hîn dibin ku hozanê hizkirî Hêmin ew bi xwe ye.

Komîta neteweyî ya rêxistina Partiyê Hecî Baba Şêx dike heldibijêre serokatiya xwe û Hêmin jî maweyek dibe sekreterê wî, lê paşiyê ew xwe bi temamî dide xebata Komisyonâ Weşanan û tê de çavdêriya rojnameya *Kurdistan*, û kovarêñ *Hawarî Kurd*, *Hawarî Niştiman* a zaneyê hêja Ebdul Rehman Zebîhî (ku di destpêka salêñ 1980 de di zîndanêñ Irarqê de mir), *Girûgalî mindalan*, *Helale* dike û di wan de helbest û bendar jî dînivîse.

Di çileya 1946 de Kurdêñ Iranê li ser keriyejk ji welatê xwe azadiya xwe bi dest dixin û Hêmin bi dilşahî danîna Komara Mahabadê dibîne. Ji çar alyêñ Kurdistanê welatparêzêñ kurd têne Mahabadê û Komara nû zû dibe nîşana biserketîna xwestekêñ hezarsale yên neteweyê kurd. Komar payeya "şaîrên neteweyî" dide Hêmin û Hejar û her du jî bi heyecan û fedakarî beşdarî avakirina wêbêya gelê kurd dibin.

Hêmin bi şexsiyetêñ ku di jiyana siyasi ya kurdî de roleke mezin dileyîzin re dikeve temasê : Qazî Mihemed, Hemze Ebdillah, Mistefa Xoşnawî, Mîr Hec, Kake Rehmanî Muhtedî Qudsî. Ew her di wê sala 1946 de jî jin tîne.

Lê, di kanûna 1946 de, leşkerêñ Şah êrîşî Komarê dikin û wê dagir dikin, serokêñ wê digrin. Hêmin bi dilikî peritî şehîdbûna Qazî Mihemed, Sedr Qazî û Seif Qazî, di berbanga 31 adar 1947 de li ser Meydana Çarçira dibine, ew meydana ku salek berê lê Komara Mahabadê hatibû ïlan kirin. Ew li ser vê bûyerê dînivîse :

Zana bû, kurdîperwer bû
Pêşewa bû, raber bû

Her Kurd nebû beşer bû
Xemî xelkî le ber bû

Da xira derkî rojname

Şikawin nûkî xame

Kurdî nûsîn heram e

Dujmin delê bê tam e

Diran kaxez û defter

Gîran şârî û nûser

Ji bo Hêmin, her wekî ji bo dostên wî Hesen Mela Qizîlcî, Ebdul Rehman Şerefkendî, Ebdul Rehman Mihemed Emîn Zebîhî, derveyî sîrgûnê rê namîne. Ew xwe davêje Qele Dizê li Kurdistanâ Iraqê lê piştî çendekê pirr bêriya axa xwe dike. Çawa rewş piçek ber bi aramîyê diçe ew vedigere Şîlan Awê cem maliyên xwe. Di wê navê de bi endamên Partiya Tûdeh re peywendî datîne û dostaniya gelên Iranê distirê :

Kurd û Azarbeycanî her dû dawayn rewa ye
Her bijîn û payedar be yeketî em dû braye

Rexna axa û began dike :

Ewî axa be bêkar e

Cebûn û qeles û lasar e

Dizî û régirtinî kar e

Emin deylêm û bê bak im

Le şer im û şûreyî mirdim

Be xom min çon bilêm Kurd im

Ke axa abrûyî birdim

Emin deylêm û bê bak im.

Di 1948 de teşebisa kuştina Şah li Zanîngeha Tehranê dibe bahane ji bo qedexekirina partiyên siyasi û demeke dirêj a stemkariyê dest pê dike. Hêmin jiyanekê milîtanî ya bêdeng dijî. Ew endamê Hîzbî Demoqratî Kurdistan e û dilê wî bi dîtinên komunîstên Iranî ve ye. Di 1968 de ew biryara terikandina her tiştî dide : Kurdistanâ Iranê, malbata xwe, jiyana xwe ya dewlemend û hêsa. Diçe besdarî şerê Kurdên Iraqê dibe û li wir dostên xwe Hejar, Zebîhî, Qasimlû dibe.

Demeke ji alî afirandinê ve pirr dewlemend dest pê dike ji bo wî. Ewî di kovarêñ kurdî yên Iraqê de helbest û lêkolînan belav dike. Berhevoka yekemîn a helbestên wî *Tarîk û rûn* di 1974 de li Bexdayê çap dibe. Ew metnên mokrî yên di her du cildêñ Oskar Mann, *Die Mundart der Mukri-Kurden* ku di salêñ 1906 û 1909 de li Berlinê derketibûn werdigerîne tîpêñ erebî û li jêr navê *Tohfeyê Mozaffariye* tevî ketiniyeke dirêj û nîşeyêñ ronakker di nav weşanêñ Korî Zanyarî Kurdî de dide çap kirin.

Kurdên Iranê çibigre bi tevahî besdarî tevgera şoreşgerî ya 1978-1979 a ku xanedana pehlewî ji text xist û şah mecbûrê revê kir bûbûn. Ew li hêviya dawiya

bêdadî û stemkariyê bûn. Wekî hemû berpirsyarên Hizbî Demoqrat û piraniya welatparêzên kurd Hêmin jî vegeriya Kurdistanâ Iranê. Xelkê Mahabadê bi şahiyêne mezin vegera şairê navdar pîroz kirin.

Piştî rojên şahî û azadiyê pêkahiyên siyasi bi xurtî xwe nîşan didin. Tûdeh (Partiya Komunîst a Iranê) ji Hizbî Demoqrat dixwaze ku xwestekênet weyî yên kurdi bide paş û piştgiriya "rejîma nû ya anti-emperyalîst" a Tehranê bike. Lê Kurdan piraniya navçeyên kurdî kiribûn destêna xwe, azadiya xwe tam dikirin, êdî nedixwastin ku di welatê wan de kesên din wan idare bikin û doza "xud-muxtarî" (otonomî) ya Kurdistanâ Iranê dikirin. Heft endarmên komîta navendî ya Hizbî Demoqrat, li jêr nifûza Tudehê, li dijî xêza otonomiyê derdikevin, istifa xwe pêşkêş dikin û ji Kurdistanê diçin Tehranê. Hêmin jî tevî Xenî Bilûrian û Mihemed Rehîm Qazî di vê "grûbâ heft-neferî" de ye.

Piştî pênc salên gelemše û tevliheviyê ew tê li Wirmê (Ormiyê) bi cih dibe û li wir weşanxana Selahedîn datîne. Ew *The Prince and the Pauper* a Mark Twain werdigerîne kurdi, çapeke nû ya afirandinên Nalî û Wefâi û ya dîwana Herîq (hozanekî Mahabadî yê dawîya sedsala XIX û destpêka sedsala XX) amade dike. Wî di 1979 de berhovokeke piçûka helbestêna xwe li jêr navê *Naley cudayî* çap kiribû. Di 1983 de jî li Mahabadê *Paşerokî Mamosta Hêmin*, berhevokeke girîng a lêkolîn, nivîsar û helbestêna wî yên di kovarêna cihê de belavbûyi derdikeve.

Sirgûna di welatê xwe bi xwe, di nav gelê xwe de jê re gelek giran dihat. Ew dikeve nav xemgîniyeke mezin û di helbestêna wî de dixuye ku ew pirr ber dikeve ku bijartineke siyasi ya xirab kirîye. Dostêna wî yên nav Hizbî Demoqrat gazî wî dikin û jê re dibêjin ku ewê timî bi vegera wî pirr kêfxweş bibin. Lê nexweşî bezatir bû, Hêminê westiyayî, berî wextê xwe kalbûyî li Wirmê ji sekteya dil tevî hemû kul û hesretêna xwe çû. Ewê helbestêna wî yên nazik û bedew bi sedsalan di dil û bîrên nefşeyen kurdi de bijîn

Ew nivisara Joyce Blau, mamosneya zimanê kurdi li Zanîngeha Parisê, ji bo kovara HÊVÎ bi zimanê transizi hatîye nivîsin û hevkarêna Kovarê wê wêrgerandine kurmancî.

BÎRANÎNÊN İHSAN NÛRÎ PAŞA (IV)

Piştî bi kurtî qalkirina serxwerabûnê kurdî ji sala 1514 ta Agrî, nivîskarê bîranînan çend gotin li ser dîroka Qiyayê Agrî gotibû û paşê herdu serokên serhilanîna Agrî, Bro Heskî Tellî û İhsan Nûrî nasandibû. Di salêن 1926-27 de mîrxas û welatparêzêن kurd ên sereke yek li dû yekî xwe digihandin Agrî. Dewleta tirk ji bo pelaştina tevgera kurdî qanûneke «te'cîl» derdixe, bi serokên Kurdan re dikeve gotûbêjê da ku ew ji dewleta re itaat bikin. Kurd van pêşneyaran qebûl nakin û piştî hin bûyerên cîgehî li gundê Kanî Korkê şerekî mezin diqewime di navbera hêzên rizgarîwaz ên kurdî û leşkerên tirk. Leşkerên tirk şkest dixwin. Ankara tê digihê ku ewê şer pir bidomîne, bi Kurdan re serî derketin hêsa nîne ; di milekî de ew hêzên nû dişine ser Agriyê di milê din de dixebite ku berberî û dubendiyêن nav Kurdan xurtir bike, wan li ber hev rake. Di 1929 de hin xêlén kurdî yên din jî teví şerê welatparêzî dîbin. Du giregirêن navdar Hecî Müsa Beg û Kor Huseyn Paşa jî teví pêgirtiyêن xwe diçin Bin Xetê û xwe ji xizmeta Xoybûnê re amade nişan didin. Xoybûn ferman dide ku ew vegeerin Kurdistanâ bakur teví İhsan Nûrî Paşa şerê dewleta tirk bikin. Di rê de Hecî Müsa Beg nexweş dikeve, dimire. Kurê wî Medenî bi pîlan û nexşeyek pîs, bi hêviya ku ewê Ankara wan efû bike, Huseyn Paşa dikuje.(binêre Hêvî, hejmarêن 2,3,4).

Temirê Şemkî cardin zivirî Agrî. Ev car xeyn ji brayê wî Çerko du brayênebez* Osê û Feto, ku di azayetî û şerkarî de bi rastî bê hevta bûn, ligel wan hatibûn. Nebezek din Şêx Zahir, xortê azayê kurd, ligel brayê xwe hatin gundê Şêx Abdulqadir ketin rêza têkoşeran.

Min li Agrî rojnameyek bi navê **Agrî** bi zimanê kurdî derxist. Ji bona vê rojnamê kaxez bi qederê pêwîst nebû, ji ber vê zor kêm derdiket. Çün çapxane jî nebû bi dest nivî hinek jî bi jelatînî ku li Agrî kelandibûn, sar kiribûn, min li ser wî çap dikir. Tîrkan têgihîştibûn ku bi neyarekî zor netirs ser û karê wan heye, gelek ditirsiyan. Tenê bi ev xeyal e ku Kurdan pelamar* û êrîş dikirin, di tariya şevê de li bin gulleyêney peya û mîtralyozan digirtin, bomba davêtin ; li postek ku dengê tifingê bilind dibû postêن din jî dest bi gulle avêtin dikirin. Ev karanan bi çavê Agriyîyan wekî agirbazî dihat.

Wê zivistanê bû ku Şêx Mihemed Hesesorî, ku muti'î dewleta Tirkîyê bû û li çend kilometir ji bajarê Bayzîdê rûdinişt, bi destûra Tirkîye ligel tifingçiyên xwe bi erdê Iran diçû Iraniyan talan dikir dizviriya. Ji talana xwe para qomandarê tirk dida û vê xerabiyê bi navê me dikir. Taqimek şerkar bi serokayetiya Resûlê kurê Şêx Abdulqadir çûn gundê wî, Şêx Mihemed kuştin. Şêx Mihemed aliyek ji xêla Bro Heskî aliyê din ji pismamê jina Şêx Abdulqadir bû. Pêş vî karî Xoybûn lê fermanek dabû û ragiyandibû ku pêwest e niştimanperestê kurd kelkên* siyasi û aborî yên dewleta şahenşahî ya Iranê ragirin, brayetiya manewî û siyasi û bêlayeni* ya dewleta şahenşahî bi dest bînin. Ev rayigandin bi muhri navenda Xoybûn muhirkirî bû û ev destûr dibe ji bi çavê serokên eskerî yên Iran gihiştibe. Ev kar ji berê ji bi rê ve diçû, bi çesnek ta vê çaxê ji ewelê çêbûna idareya Agrî karesatên* piçük bi pêçevaneyâ ev ferman neqewmabû. Hêzên Agrî li helperanî* de ligel dewleta Tirkîyê weka leşkerek rasperdar e parastina navçeya sînorê Iranê bi menfaeta xwe dizanî ku ji dewleta Iranê çavnihêriya padaşen* çak be. Mevaxina karesatên ku paşê me dît ez di laperên pêş de li ber çavêñ xwendevanan datînim.

Zivistana 1929 temam bû. Çar sal temam bûn ku Agriyyan serboxo* di bin ala serboxoya Kurdistan de bi hêzeke zor kêm bi dewleta Tirkîyê re di şer debûn. Bihara 1930 hat, hêjî sermayên Agrî dom dikirin. Hêzên dewletê ligel taqimeke xêla Keskoîi caş bi serokatiya qomandarê alaya siwarî Mîralay Ferhad Bey, dor û pişta gundê Şêx Abdulqadir girtibû. Gundê Şêx li bin tarê rojavayê Çiyayê Agrî di hindurê ciyek rast û nerman de bû, li bakur û rojavayê wê girekî berdî mîna dîwar ser bi felekê kêşa bû. Neyar bi şev hatibû vî girî girtibî. Çaxê beyanî* Şêx ji bo destmêjê derdikeye derva, li bin gulle tê girtin. Gundî bi dengê tifingan şiyar dibin. Gulaleyên tifing û mîtralyozan mîna teyrokê bi ser gund dibare. İndî çaxê gotûbêj û tedbîr girtin nebû, çavnihêri komek* sebebê telefata zor dibû. Wek dizanîn, mîrên kurd hewsele ji midafea zêde re nîne. Temerê Şemkî, Osê Feto, Çerxo, Şêx Zahir, Resûlê kurê Şêx û kurapên wî Eloyê Êzdî û çend peyayên din ji şêxan her bi kiras û derpê, derfeta kinc lixwekirin peyda nekirin, bi destek tifing bi destê din qetarê fişeng, ji xêni xwe avêtin derva. Agrî di maweyê* şes mehan ev cara duduyan bû ku nebezî* û azayetiya* rolekanên* xwe re bi rexên neyarê kurd dikişya, serxwariya qimênbihurî re cubran dikir. Qaremanan notelê pezê kuhî* ji kevirek bi kevirê din berî zûda xwe bi rêsên neyar gihadin. Neyar çavnihêri ev nebezî û çalakiya* Kurdan nebûn, dest û pêyên xwe winda kirin. Ev esker û zabitên ku nêzikitiya pelamar* bûn, giyanê xwe ji dest dan ; şkest bi temamî neyar ket, helatin, êdî revarev bû. Ta ez û Bro li gel çend pêşmergê xwe gihadin meydana şer, Rûmî belavkirî bûn ; hinek ji wan bi şûnî ewelê xwe gihişt, berekî perakende bûbûn, her yek bi aliyek direvî, çend kes ji ji tirsa can xwe avêtin qubekî nêzikî şûna wan a berê. Kurd bîst esker ji dîl girtin. Şêx Zahir û Osê riya eskerî birîbûn, esker çend sindoq fişeng, di çaxê revê de, avêtin nav vê qubê ku Kurdan tenê çend sindoqên wan derxistin, radeyek çek û fişeng bi dest anîbûn ; li nav çekan çend ta mîtralyozên piçük ji hebûn.

Ez û Bro û Şêx li pêsiya xaniyê Şêx rûniştin, çawabûna şer mijûl dibûn, Kurdek ji layê Agrî yê ku tabiê Dewletê bû hefsarê qatirek dikêşa, hat nêzikî kondê Şêx bû. Li ser qatirê du laş bar kiribûn ; yek cendekê zabitek rûmî yê din yê Kurdek bû. Li rûyê laşê Kurd mêze kîrin Temirê Keskojî bû ku çendekî berê gotibû : « Ez Tirk kurê tirk im ». Broyê Heskî jî welama* wî dabû, gotibû : « Ji Xwedê Te'ala dixwazim, tu li gel Tirkê brayê xwe li yek cî çal bî ! » Bro ku evanan nas kir go : « Hevseleyê Xwedê jî nemaye, xayînan zûtir ceza dike ! ». Me qerar da laşen herduyan li ciyek, di nav gorek de çal bikin û wisa jî kîrin. Temirê Keskojî bi peçivaneyê ku pêwist bû bi padaşî fedayê canê xwe şanazî* bi jin û zarê xwe bihêle, rûreşî bi cî hişt. Têkoşeranê Agrî dixwastin mafêñ serbixoyî û azadiya neteweyê kurd rabigirin, ji bona wî xwîn dirêtin ; Temirê Keskojî Kurd bû, di basa mafê dagirkirinê de, zariyên wî û eşîra wî jî tev bûn ; reng e xîret û cesareta wî jî hebû ku bi şer hatibû, lêbelê nezanî û pesfitretî çavê wî girtibûn bi çesnê ku li gel neyarêñ neteweyê xwe Tîrkan yek bûbû, hatibû Kurdan bikuje.

Dîlêñ Tîrkan ji bo navenda qomandarê kurd şandin. Roja din çend neferêñ kurd ên çekdar wan birin sînorê Iranê, bi sînordarêñ ïranî spartin. Çaxê bi rê diketin jîneke kurd bi navê Horik, ku bi xwe feqîr bû, dîtibû ku goreya yek ji wan dîlan peritî ye, goreya piyê xwe derxistibû, bi wî dabû ta ku piyêñ wî dîlî serma nexwin. Ev mirovayetî û peyavetiya kurd bi dîlêñ tirk bû bi peçivaneyê ku Tîrkan yek Kûrdê ku heke bizanibin tabiê Agriyîyan e welew jin bûna jî dikuştin !

Sala 1930. Bû pênc sal ku şerê ji bo azadiya kurd li Agriyê tê diperî, dirêj dibû. Neteweyê kurd şiyar bû mîratê bav û kalêñ xwe dixwast, 'efû, xelat û bexşînan red dikir. Têkoşerêñ Agrî digotin ef divê bi tavanbaran be : em hîç sûc û tavanê me tune, maf û hiqûqêñ xwe yên meşrû dixwazin ; ne ef bûn belkû ev em in ku divê bibexşînin. Dewleta Tîrkiyê bi tenê bi hêza ordiya xwe cêriband, dît ku naqedîne bi tenê serbexojuwazêñ kurd ji Çiyayê Agrî derxe, şoreşa Kûrdistanê bitemirînê muhtacê yarmetîya derva bû.

XEBATA DİPLOMATİK A TIRKIYÊ

Agrî di nav sînorêñ Tîrkiye, Iran û Rûsyâ de hilketibû. Xebata siyasî û dîplomatîk a Dewleta Tîrkiyê gurtir bû. Bi propaganda û fêrofişal ên nerast ên xwe hikûmata rûsî bi layê xwe kişand. Esasen bêrê jî dostêñ hev bûn. Li Ankarayê jî di nav wezareta karûbar ên derveyî ya Trikiyê û balyozê* Şahenşahê Iranê gotûbêj li bereyê Agrî bi xesaret û zerara Kurdan, dest pê kîrin. Her weha li Tehran jî li layê Tîrkiyê û Iran axaftin hebûn. Agriyîyan zor bi vurdî* û dilniyarî li ev axaftinan mêze dikirin. Çun min Iranê dostê Kurdan dizanî bûm min bawer nedikir ew bikare bi zerara me encam* bide bikare ku mîna tevşo bi rehê xwe xe ! Belam* ji xebatêñ destêñ mermûz ên ku ji bo kelka* Tîrkan dixebeitîn bêxeber nebûm !..

Rojnameya Agrî ku bîr û rayêñ me belav dikir li jêr nav û nîşana « Bi yek kevir du teyr » gotarekê nivisibû : « Dewleta Tîrkiye dixwaze nav Iran û Kurdan nifaq bavêje,

Dewleta Iranê bi aleyhê têkoşeranên kurd tê perîne, şoreşa kurdî bi Iran jî bikşîne him xwe ji şoreşa kurdî piçekî rahet ke û him jî Kurd û Faris, ev du kurapan bi canê hev bavêje, her duyan jar bike, girtinî Azerbeycan ku hedefa esasî ya Dewleta Tirkiyê bû, ji bona xwe hêsatir bike. Xoşbextane' em karbidestêن Agrî hişyartir bûn, behaneyek bi dest nedida ku amanca çepleyan cî bi cî bibe !

Frokeyên Tirkiyê hemû rojan beyanî mirin pêşkêşî Agriyîyan dikirin. Hêjî em bi zozan derneketibûn. Ez li gel Şêx Abdulqadir bi bîst siwaran ji bona serlêdan bi liqê Xoybûn li bakurê Agrî û geriyan, bi nav deşta Ikdirê çûm. Ev cara pêşîn bû ku ala azadiya kurdî bi destêne nebez ên siwarênen me li vê deştê de pêl dida. Li ser riya wan rûniştevanen tirk ên ku Tirkîye di van navçeyan de vadâr' kiribû, li pêşîya vê ala azadiya kurdî serên xwe berjêr kirin.

Havîna pêşîn bû ku Agriyîyan reşmalênen xwe li pesarê rendolê çiya hildan. Hê sê roj bûn me çadir vekiribûn ku dengê teqeteqa tifingan ji aliyê rojavayê bakur bihîstin ; ev teqîn li ser wê rîyê bû ku beşen nîvro' û bakurê Agrî bi hev girêdida. Li pey wî, çend frokeyên neyar bi ser zoman firiyan û çadira min, ku li nav konêñ reş bû, bombaran kirin. Jina min Yaşar Xatûn brîndar bû, berreçeranek' hate kuştin. Paşê tê gîhîstin ku Tirkan di tariya şevê de tabûrek peyan du topêñ çiya bi riya Qabaq Tepe, ku li rojavayê Agrî hilketiye, dager kiriye. Ev seretaya' pelamara mezin a Tirkan bi ser Agrî, ya 1930 bû.

Qabaq Tepe mîna kela bû ku tenê şiverêyeke wê hebû. Zabitê tirk Ruşdî Güven nivîsibû ku şaqîyan vî girî bi temamî hêzên xwe difa' dikirin. Bi rastî li ser û kîlekêñ vî girî ji bona parastina wî merivek kurd jî nebû. Hejmara şerkarênen me ev qas nebû ku her aliyêñ çiyê bigirin û biparêzin. Frokeyên Tirkan bi pêçevaneyê salêñ berê hemû rojê li serê Agrî difiryan, bomb û gulûleyan bi ser jin û zarokêñ bê tavan' direşandin. Lîbelê ji tirsa tîravêjîn me zor bilind hildifirîn. Di aliyê din de jî, Kurd hîn bûbûn çawa xwe veşîrin, xesara giyanê wan hindik bû, tenê xesara wan jî merr' û malat dibû.

Dewleta Yekîtiya Sovyetî zor esker li beramberê sînorê Iran û Agrî berhev kiribû. Dewleta Iranê jî navçeya Makoyê bi eskerê xwe tejî kiribû. Tirkîye xebata siyasi û eskerî bi hevra dest pê kiribû, ordiyên xwe li nêzikayetiya Agrî bi cî dikir. Rojnameya tirkî Cumhuriyet li tarîxa 30 temûz 1930 de bi nav û nîşana «Giliyê axir ê me ji Iran» nivîsibû : «Xeberçinê **The Times** li Stenbolê zanînikê bi rojnameya xwe daye, gotiye ku bi hezaran Kurd ên asî li ser çiyayê Araratê' ciyêñ mustehkem girtine, Kurdêñ Iranê jî bi wan yarmetî didin. Erkanî Herbiye ya tirkî ji bona mucadeleyek dirêj şest û şeş hezar esker û cendirme û sed froke hazir kirî, bi navçeyen Wan ê Bayzîdê verêkiriye...» Rojnameya Cumhuriyet li tarîxa 30 temûz 1969 li bin nîşana «40 sal berê» vê xeberê cardin çap kir.

Hezarêñ kurd ên asî ku Erkanî Herbiye ya Tirkiyê îşare dabû, heke ne hezarek pênc sed çekdar jî li Agrî hebûya nizanîm bi şerê çend salan ordiya Tirkiyê nikaribû Agrî bigire. Em mecbûr bûn tifing û fişenk ji xwe re ji destêñ eskerênu ku dîl digirtin an dihatin kuştin digirtin, çun me ji hîç cî tifing û fişenk komek nedigirt. Tifinga min



bi xwe jî nebû, di nav şerê Kanîkorê min bi dehtîrek ku Fille ji bo min şandibûn rekêbê ser siwarên tirk kir, wan dîl girtin, ji destêن wan tifing girtim û bûm xwedî tifing. Eskerêن ku teslîm bûbûn bê şik negotine ku tenê siwarek hat, em teslîmê wî bûm. Dîsa qomandarê alayê nikariye bêje "em ji pêşîya hevde Kurdan revîn, me ev qas dîl da". Xwedê dizane êdî ewan çawa rapor daye ku wezareta ser a Tirkiyê bi hezaran Kurd ên asî îşare daye !

Min bawar nedikir ku Iran bi zidê me karî bike, belam ji gotûbêjên Iran û Tirkiyê dîsa nîgeran bûm. Ev sal ji bona Agriyîan sala netirsî bû. Qomandarê kurd xwast navendeke din a helsanê* mîna Agriyê li Gelyê Zilan û Çiyayê Sîpanê çêke, bizotina* azadiyê frehtir û mestir bike, nexşeyê Tirkan bi hev xe, barê Agriyîan siviktir bike. Çend roj bi navber ji serokên Gelyê Zilan û Heyderiyan li gundê Deren civîn, qerara helsanê dabûn, ji min jî bi qorsî xwastibûn ku icaze û destûra pelamarê bidim !.. Me dît Xêlê nebezê Heydaran ji bona cubarana emelên xengînê xwe yên berê bi dil û can amede bûn vê pelamarê bikin. Li aliyej jî Tirkîye dest bi pelamara muqedemati kiribû.

GELIYÊ ZİLAN

Geliyê Zilan malbenda diduya bû ku di şerê Mezin ê Cihanê, wekî Agrî, ji hêzên Rûsyâ re li nav navçeya xwe rê nedabû, ta dawiya şer axa xwe ji destavêjiya Rûsên Çar parastibû. Diyar bû ev gel imtihana xwe daye û demarê req û siftê xwe her parastiye. Ji ber vê yekê min xweziya Gelyê Zilaniyan qebûl kir, fermanek ji bona rêk û pêk kirina vê pelamarê nivîsî û belav kir. Min tê de digot : "Li pey pakkirina Gelyê Zilan ji hêzên tirk bajarên Bargirî, Ercîş, Ernêş, heke qedandin Adil cewaz jî dagir bikin ! Ewê cî bi cî kirina vî karî bi yarmetiya taqimek Celalî, Heyderan, Ademî û Zilan çê bibe. Divê ku Heyderan girtina Çiyayê Sîpanê girîngitir bizanin."

Di vê ser û bendê de hêzên Ararat jî pêwîst bû postên bihêzbû yên Tirkan ku di dor û berê Agrî de bûn ji beyn bibin, bajêrê Başkend, li bakurê Çiyayê Agrî û li nîvroyê Agrî bû dagir kin, êrişa bajarên Ixdir û Bayzîdê bikin. Min bi Temir Şemkî spart ku bi xêlê Şemkan bajarê Qolp dagire, ku êrişî ser Qaxizmanê bike, riya Qers-Agrî bibende. Di vê fermanê de min tarîxa destpêkirinê li hemû navçeyek bi hûrî diyar kiribû, fermanê li çend berper* de ziyad kiribû û bi serokên navçeyan şandibû. Zabitê tirk Zuhdî Güven, yek ji fermannameyên me bi dest xistibû û di bîranînê xwe de wisa dînivise : "Dewlet ji bo pelamarbirina ser Agrî xwe hazır kiriye ; ordî bi aliye Bayzîdê bi rê ketiye, ji bona perçiqandina Agriyîan fermanên xwe dide, harekatê mezin dest pê dike. Hêzên tirk Qabaq Tepê ku li navçeya rojavayê Agriyê dimîne dagir dikin. Paşê serokê şaqiyan Ihsan Nûrî fermaneke dûr û dirêj bi eşîrên ku li dervayî Agrî bûn û ji xwe dizanibû şandibû." Jimareyek ji vê fermannamê ku di şerê qors ê Agrî de li paşila yek ji kuştiyênd kurd de bûye, bi destên wî ketiye.

Ihsan Nûrî nusxeyek ji vê fermanê bi reîsê eşîreta Adaman Hezretî İbrahim Axa şandibû. Ev ferman biritibû ji destûra êrîş a neyar. Li quncê jorîn ê rastê Xoybûn, li jêra wê Civata Welatê Kurd, li bin wê hejmar û li quncê çepê jorîn jî Ciye qomandariyê Agrî, li binê wî jî 18 juen^{*} 1930 nivîsîbun.

FERMANA ÊRÎŞÊ

Ev ferman biritibû ji heft made, bi zimanê kurdî hatibû nivîsandin, Zuhdî Güven wê wergerandiye tirkî. Vaye li jêrê kurdîya wê.

1 - Neyar 11 juen 1930 êrîş anîye ser Agrî, Qabaq Tepe, li quncê bakurê rojavayê Agrî dagir kiriye û cîbicî bûye. Şeş frokeyên neyar di vê pelamarê de hevkarî kirine. Di rojê 11 heta 18 juen tenê frokeyên neyar li serê Agrî difirîyan, bom davêtin. Sê froke ji aliyê hêzên Agrî lê dan e û yek ji wan frokan li meydana frokeyî ya Bayzîdê ketiye xwarê, frokevan miriye.

2 - Desteyên gerok ên Agrî êrîş û pelamara xwe bi ser bingeyên neyar ku li dor û berê Agrî da ne dest pê dîkin.

Bi liqê naverastî ferman dane ku hêzên xwe bişînin çiyayê Tendûrek, pêsiya karwanê bar û benê hateçûyên neyar bigirin. Qolordiyek tirk ku bi mebesta êrîşkirina ser Agrî ji nîvroyê rojavayê Anadolê bi rê ketiye, li ber helsoran û pêkbûna mezin a me li malbendên nîvro yên Sûriye û Dersim û Xarpûtê neqediyaye pêş de were.

3 - Hevirgeyê yekem ê pêkanîna Xoybûn: bi arîkariya Xwedayê mezin, êrîşê ser hêzên Tirkîyê bike.

A -Qomandarê giştî yê jandermeriya^{*} Agriyê Temir Axa, bi hêzên ku li bin destêni wî datînin li bervarê^{*} 3 juiye^{*} 1930, bi arîkariya xêlê xwe Şemkan ku li malbenda Qolpê rûdinên, êrîş dide ser navenda qezaya Qolpê, paş dagirkirina bajêr pêşmergeyan heya girtina gundê Pernavot berepêş bişîne.

B - Şeva 4 juiye qomandarê qorxan serheng Veli Beg ji eşîrên Gizkan û Zilan hêzên bigire, bi pelamerek nişkeva bajêrê Ikdir dagir ke. Her di vê rojê de hêzên Agrî êrîş dibin ser postêni neyar li dor û berêni Agrî.

4 - Serokên eşîrên ku li nav gundê Deren kom bûbûn, hêzên wan roja ïnê, 4 juiye, hêzên tirk ên ku li navçeya wan hene rikêb kin, idareya navçeyê bi dest bigirin, bi ev çesnê ku li xwarê dînîvîsim bi kar bînin.

A - Liqê Ercîş ji Gelyî Zilan yarmetiyê digire paşdamalina idareya hikûmet bi aliyê Adilewaz diçe, pey dagirkirina vî bajêrî xeta jor a Çiyayê Sîpan digire, girêni nîvroyê Adicewazê digire û bi aliyê Axlat û Tatwan û Çiyayê Nemrûd desteyên siwar dişîne.

Serokê Gelyî Zilan : pey dîlgirtin û bêçekkirina hêzên tirk li malbenda xwe rojavayê Çiyayê Aladax bigire, bi aliyê Melazgirt desteyên siwarî bi hêz bişîne ji bo yarmetiya êla Hesenan rîyêni Qere Kosê (Tırka iro navê bajêrê Qere Kosê Agrî danîne) û rîyêni Melazgirt, patnos, Ercîşê bigire !

C - Eşâîrên Heyderî ku li malbenda Patnosê rûdinên û ji xêla Melazgirt wan ên ku têv pêkbûna me ne ; bajarê Patnosê dagir bikin, girêن bakur û rojavayê Sipanê bigirin, aliyêن Çiyayê Nemrûd, Mûş û Kopê desteyêن siwarî bisînin, bixebeitin hateçûyêن neyar bianin !

D - Liqê bargirî : navenda Bargirî û Ernisê dagir ke, rêtêyê ji aliyêن Wan, Ercîş û Seray têbende !

E - Liqêن naverast bi yarmetiya xêlên Celâli, Mîlan û li gel eşâîrên ku di Alega de rûdinên û tevî yekbûna min navenda Bayzîd-Agrî dagirt, sê sed çekdar bi Çiyayê Tendûrek şand ji bo ku hêzên din ên şerkarêن Bargirî bihêztir ke, ji bona tirsandina Wan û Serayê bixebite, ji aliyêن Wan, Tarp, Seray, Başqele û Hekarê zanînê bi dest bîne, xeber bide !

F - Liqêن Ercîşê : çi qas dikare bi liqê naverast yarmetî bide !

G - Reisê xêla Adaman Qaymeqam -îro yarbay dibêjin- Hezretî İbrahîm Axa bi zûtirîn kat li gel Elî Begê Mîrza Axa û Resûl Begê Zîlî û serokên eşireten Qotan û Hesesorî gotûbêj bike li gel van eşair, li ber varê 4 juiye 1930 roja ïnê êrîş bikin ser bajarê Diyadînê, rêya Qere Kose-Bayzîdê bi temamî hildewşînin, bi taybetî hêz û xebatên neyar li Qere Kosê bi tevahî berewurd' bikin, bi desthênanâ çend û çûna li gel Hemîd Beg têbikoşin, rêya hatecûnê li neqeba Tahir bixin metirsîyê !*

H - Paş dagirkirina van ciyên ku min diyar kirine, liqêن Ercîş, Patnos û Geliyê Zilan beşa zor a hêzên xwe li pişta xeta Dutax-Melazgirdê, liqê Bargirê tevahiya hêzên xwe li Ernis-Norşatê kom bikin !

5 -Şûna fermandeha giştî li Agrî ye ; paş diyarbûna wez'ê şer ji vê ciyê re xeber bidin !

Zuhdî Güven paş nivîsandina vê fermanê wisa nivîsiye : "Revoke û tavanbar* Ihsan Nûrî xwe bi çesnê qomandarê giştî daniye û nexşa mezin a hikûmetê bi rê ve biriye, li jêr vê fermanê navê Ihsan Nûrî û li jora wê "Komsêrê fevqelade yê eskerî yê Xoybûnê" nivîsiye. Ji temamî hal û hereketên Ihsan Nûrî derdiket ku dixwast dewleteke Xoybûnê pêk bîne !

Ihsan Nûrî li gel vê fermanê "hînbûnek giştî" jî ji bo eşiqiyayêن xwe belav kiribû.

Ev hînbûn bi navê "hînbûna giştî ku li katê şer de peyrevî bikin" e û metna wê li jêr e :

1. Her beşe ji bona xwe qomandarek bibjêre, navê wî bi min binivîse !

2. Li her navçeyek de birêvebirina idarî pêk bêt, nisbet bi hejmara têkoşeranên xwe, xoreki' pêk bîne, ji wan re bişîne !

3. Çek û qorane û enbarêن xorekî û tiştûmiştêن eskerî û navsandoqêن pereyêن hikûmat û eskerî ku bi dest têن, top û mîtralyoz hemû li gel tiştûmiştêن ku bi wan re ne malê Hikûmata Kurda ye ; di vê babetê de memûrek helbijêrin, pêşıya talanê bigrin, ev mal malê xelkê ye, kes navê destî lêde !

4. Zabit, esker û memûrêن tirk ku bi xwe bixwazin ji bona me kar bikin, li jêrî çavdêrî û agahdarî de ji wan kelk bigirin, navendêن bêtêl, telgraf û telefonê isläh

*bikin û ji karbidestênu ku bi wan tê bawer kirin kelk bigirin, tenê xetênu ku li nav me
û neyar de ne bibirrin !*

*Divê ku froke, frokexane û bêtêli li jêri çavdêri de bin, hêç kesî nehêlin nêzikê
wan be !»*

Zuhdi Güven hinekî fermanê guhuriye û ew madeyên ku di babetâ çak bizotina li
gel dîlketiyen tirk nivisibûm hêç bas nekiriye !..

Min ji bona çavderî û birêvebirina vê pelamarê kurên Kor Huseyn Paşa, Memo û Nadir, Seyid Resûlê Berzincî, ji xelkê Ercîşê û Sefdîn Beg kurê Fethullah Begê reisê sabiq ê xêla Hesenî, li gel taqimek siwar rê kir Gelyî Zîlan. Min dixwast paş têperîna tofana bela ya vê salê bi berevurdî çawabûna vê pelamarê, tecdîda çavnihêri û guhariyek ku bi kelka têkoşerên kurd be bi kar bînim.

Rojek desteya Dawo -kurê Bro-kar girt bi şev rêya îrtibat a Qabaq Tepê bi navenda xwe bibirre, Emerê Besê ji ji pişta Qabaq Tepê êrîş bike. Taqîmek panzde esker ku ji bona damezrandina peywendî li gel navenda xwe, ji meterisê xwe derketin, ji çiya berjêr bûn ketin rastê. Desteya Dawo peşîya wan girtin saetek şer kirin, her panzde esker hatin kuştin, çekêن wan xenîmet birin. Eskerên Qabaq Tepê, ji jor temasagerên mirina hevalên xwe bûn, belam nikaribûn yarmetî bidin wan. Wê gavê ji du alî desteyen piçük agirê helperinî yê xapandinê dest pê kiribûn. Ji wan desteya Emerê Besê li gel ku şûna wî zor nalebar bû, ji tariya şevê kelk girt û xwe gihad nêzikî esker, çend nefer kuştin, çekêن wan girtin anîn. Ji ber ku şûna esker zor sext bû nikaribû zêdetir pêş de derkeve. Desteya din a piçük ji ji dûr Qabaq Tepê gullebaran dikir û şer ta nîvro kêşa.

Evî ji bêjim ku roja ku Tîrkan Qabaq Tepê işxal kirin ala serbixoyî ya Kurdan li rûyê girê pêşîya wan daçikandibû ; çun ji bona parastina vê alê hêza me nebû tenê carcaran yek kes diçû, xwe nîşan dida. Tîrkan ji curet nekirin nêzik bin ; rêya me ya bakurê Agrî di kêleka vê alê de diçû. Ev ala kêleka rojavayê bakurê me ta axirê parastibû.

☆☆☆
☆☆

Havîn li bin tarê Agrî zor germ dibû, gelek mês hebûn. Ev av û hewa ji bona me Kurdan zehf naxoş bû. Hewa ku germ dibû em ber bi bilindahiyêni Agrî hildikişîn, diçûn zozanan, çunkî Kurda av û hewaya xoş a zozanan adet kiribûn ji bo çêrîna pez û dewarxweyî pêwist bû bi çiya hilkişin. Şûnên zivistanê, kundaran temamî vala dîkin, ji bo parastina wan ji kes namîne.

Tîrkan ji çûyîna me bi zozanan kelk girtin, şevek hêzên xwe ji perê Şexlû derbas kirin, hatin nav erdê Agrî, girêna rojavayê gundê Şexlû girtin, çadirêna xwe vegirtin. Taqîmek ji hêzên Agrî ji bo derxistina neyar ji çiya berjêr çûn, belam ew hê bi

mesefa teqîna tifingan negîhiştibûn ku hêzên neyar çadirêن xwe hildan, ber bi Bayzîdê paşekêş kir. Em teecub kirin ! Ev paşekêş ji tırsî hêzên Agrî ku ji çiya ber bi Şexlû berjêr bûbûn nebûn, cunkî neyar çaxê hate hundurê sînorê Agrî dizanibû ku dikeve ber pelamara Kurdan. Tê fikirin ku pelamara siwarêن Agrî li navçeya Geliyê Zîlan hê dest pê nekiribû, ji Geliyê Zîlan hêç xeber jî nehatibû. Hêç sebebek nebû ku neyar pêşengêن xwe yên ku şandibûn erdê Agrî bi vî çesnî pare bikşe !

Di navçeya Geliyê Zîlan de ji xêla Heyderan taqimên Qalqan, Bekiran û eşîrên Adaman hebûn. Serokên Qalqan Mihoyê Temir Axa, Mihoyê Derwêş Axa û Tahirê Elî Beg bûn. Serokê Bekiran Reşoyê Silo bû. Ji wan serokan, Mihoyê Derwêş Axa bawer pêkirayê serokên hikûmatê yên Erciş bû, bi çesnê ku rojekê siwarêن Agrî li mala Mihoyê Derwêş Axa mêvan bûn qomandarê jandarmeriya Erciş ji ber baweriya ku bi wî hebû axayê navberê gazî kir ku çavê pê bikevin û wî ji meqsed û mebesta van siwaran agahdar bikin. Qomandarê jandarmeriyê wisa dizanibû ku Mihoyê Derwêş Axa bi rastî kelka netewayê xwe fedayê axaftinêن şîrîn ên serokên hikûmata tirk dike, hêç nizanibû ku ew yek ji endamên Xoybûn bû.

Geliyêzîlanyan siwarêن Agrî ku fermaña destpêkirina şer li gel Dewleta Tirkîyê li gel xwe anîbûn bi şadiyek zehf pêşewaz kirin, bi çesnê ku ji zêdeyiya xweşhaliyê roja ku di fermanê de nivîsî bû tê negîhiştin, pêş katê mue'yen bi ser Hesen Ebdal êrîş birin. Hesen Ebdal ordûgahek bû ku du sed esker tê de hebûn. Paş şerek giran Kurdan eskeran dîl girtin, çêkên wan stendin. Pey wî bi ser şarê^{*} Noşar, ku navenda navçeya Geliyê Zîlan bû, êrîş birin. Di nav vî şarî de tabûrek peya, bolûkek mîtralyoz hebûn. Qomandarê Noşarê ji bo bergirî li her rûdave kela Noşarê bi tevahî teyar kiribû, belam tiştê ku bi bîra wî nehatibû hesta^{*} canbihuriya kurd di rêya azadiya netewayetiya xwe de bû.

Kurdan çaxê bi Noşar rikêb dikirin bajarêن Erciş û Bargirî ji bîr nekiribûn, zor bi xurtî êrîş bi ser van şaran jî birin. Serokên raperînê di germiya şer de bûn ; ji bîra wan çûbû ku destpêkirina şer bi min ragehînin !. Ez û serokên malbendan çavrewan bûn ku roja pelamardan bighije, hemû bi hevra dest bi şer kin.

Kela Noşarê tevî hemû canbihuriya zêde ku qomandarê tirk û zabitên wî nîşan dan, tevî ev tehkîmatêن ku li çiyayê bilind çêkiribûn, parastina wan hêsa kiribûn, nikaribûn tenê bîst û çar saet li pêşîya lehiya êrîşa şerkarêن qareman ên xêla Adaman bigire. Pey dayina xesareke zehf bi destên Kurd, qomandarê tirk hatibû kuştin, zabit û eskerê wî yên ku nehatibûn kuştin dîl ketin. Pelamarbirên kurd roja pêşîn beşek ji bajêrê Erciş û tevahiya bajêrê Bargirî dagir kirin. Hêzên tirk li nav beşa din a Erciş û Kela Bargirî difa' dikirin. Desteyek şandibûn rêya Ernîs-Wanê bigirin ; ew qurbana bêhiyyadiya xwe bûn, pîroziya mezîn a ku bi saya curet û şehameta xwe bi dest anîbûn, car jî ji dest dan, wez'a wahîm a Tîrkan li Erciş bi wez'eke çak guhirandin. Mesele wisa bû : Tîrkan ji malbenda Wanê çend top û taqimek esker ji bona hawara şarê Ercişê verêkiribûn. Desteya Kurdan li nêzikayetiya şarê Ercişê pêşîya wan digirin ; pey şerê nîv saetê çun Tîrk dîtin nikarin bifilitin, teslim dibin. Leşkerê Heyderî li pêşîya vê teslimbûnê, şûna ku taqimek ji wan li gir

bimîne tenê çend kes ji bona girtina çekên neyar biçin, hemû pêkra* sengerên* xwe bi cî dihêlin, ji gir berjêr dibin. Qomandarê tirk çaxê dibîne ku taqima Wan zor kêm e, peşîman dibe, fermana agirbaranê dide. Serokê têkoşeran û çend kesên din hatin kuştin, wan ên ku mabûn teslîmbûna neyaran nenk* dizanin, ta fişenga xwe ya dawîn şer dikin û têr kuştin. Bi vî çesnê hêzên yarîde* yên tirk xwe bi Ercîş dighînin.

Ewelîn pelamarê bi ser bajêrê Ercîşê xêla Bekiran kir. Ev xêl çek û saz û teyar tune bû. Ji wan desteyek ku meydana frokeyan dagir kiribûn tifingên wan nebûn ! Di şûna tifing bi bêl û das û gopal êrîş kiribûn, bi vê çesnê mirina bi mîranî ji jiyana dîlî gelek çêtir girtibûn, bi şewqa azayetiyez zor rîgezî Kurd pelamara frokexanê dabûn, çend qurbanan di riya azadiyê de dan, eskerên ku ji bo parastina vê derê bûn dîl girtin, ji çek kirin, bi xwe çekdar bûn, du frokeyên ku dixwastin bifirin girtin, çûn nikaribûn ji wan kelk bigirin her duwa şewitandin.

Memed Beg, kurê Kor Huseyn Paşa li gel taqimek şerkar bi aliyê Patnosê bi rê ket, bi şarê navberê êrîş bir, ketin nav şar belam eskerên Patnosê bi mîtralyozan li ser banê mizgeft û serê minaran danîbûn, ji bona wî nikaribûn xesar bi ordûgahê bîghînin. Gava rikêbî ser Patnosê kiribûn riya Qere Kose-Ercîşê jî birribûn. Çend zabit ku li gel çend siwar ji xêla Sipkoyî bi Patnosê dihatin dîl girtin, hemûyan ji çek kirin, zabitan bi Seyid Resûl tehwîl dan. Sefdîn Beg, kurê serokê pêşû yê kozî Hesenê Fetullah Beg li gel çend siwarên nebez çûn deşta Melazgirt, agîre şer bi wan deran kêşan.

Ev raperîna Geliyê Zîlan li encamê destpêkirina zûtir ji katê ku li nav fermanê hatibû nivîsin tenê ma, Dewleta Tîrkiyê ji her layê ordû şand ser wan bi çesnê ku her ev ser û bendê da ku Kurda li bajaran de pêkevê helperana xunavî bûn hêzên eskerî yên tirk bi alîkarî û rîberiya caşen Keskoiyân pêş ve hat nav Geliyê Zîlan û Hesen Ebdal dîsa girtin. Hêzên Agrî nizanibûn ku xêla Heyderî zûtir dest bi şer kiriye, li hêviya roja muquerer bûn, neyar ji her alî ser Heyderan ordû şand. Xetayê mezin ê Memed Beg û Seyid Resûl bû ku xebera destpêkirina şer nedabûn.

Pêşketina Tirkan ji rûyê :

1. Karê ku bi serheng İbrahîm Axa û Hemîd Begê Zîlan muhewel kiribûn nekirin.
2. Zor bêîhiyatî hate kirin di pelamaran de.
3. Ji hemû mestir ixtilafa gewre ya wicdanî û insanî di mabeyna du serkirde Memed Beg û Seyid Resûl, ku heq bi Memed beg bû.
4. Ji hemû ewel destpêkirina zûtir a êrişê berî roja muquerer û xeber nedidan bi min ku pişta wan vekirî mabû.
5. Xianeta xêla Keskoiyî.

Heke wisa nekira hêzên tirk nikaribûn bi Geliyê Zîlan dakevin, derfetê peyda nedikir.

Ev pîroziya tirk tenê ji ber bê ihtiyadiya Gelîyêzîlaniyan bi çengê Tirkan ketibû ! Ji vê zêdetir, müşacereya lefzî di nav du serkirdên kurd Memed Begê Huseyn Paşa û Seyid Resûl Berzencî jî rûyê teesuba eşîretî radabû, bi vî awayî jî Kurd belav bûn, çûn layê jin û zarêن xwe ku li zozanêن çiyê de bûn, li nêzikê zozanêن xwe pêsiya neyar girtin, heta wê ku derfetê peyda kirin, jin û zarêن xwe bi Agrî paše kêşan. Seyid Abdulqadir, kurapê Seyid Resûl jî xan û xêzanêن xwe li Ercîşê bi cî hişt, li gel têkoşeran bi rê ket.

Di şerê Ercîşê de ji xinca du frokeyên ku bi destêن Kurdan ketibûn, frokeyek din jî ku Kurdan lê dabû, anîbû xwarê, yek ji wan li ser girekî çend saet berê bi destêن Kurdan ketibû, difiriya her bi xeyala ku ew gir dîsa di destêن eskerêن Tirk de ye, ji bo ragihandina deng û basêن şerî nizm bûye, di wê demê de Kurdan lê dane, anîne xwarê. Ew deng û basêن ku nivîsî bûn bi destêن Kurdan ketin ku ew hatina hêzêن Tirkan bi vê navçeya helperînê û bi aliye Ercîşê diyar dikirin. Di wan helperînênu ku li çaxê paşekêşê de li ser rê didan Kurdan di bareyên jin û zariyan zor nîgeran bûn û gelek xesaret didîtin û telefat didan. Ji kurên Emîn Paşa, Osman û Ebûbekir jî hatin kuştin. Kuştinê tekrayî yên jin û zariyên bê dîfa' ên Gelîyê Zîlan bi layêن eskerêن tirk dom dikir û çend laperêن din ên rûreşiyê li tarîxa facîeyên Moxol zêdetir dikir. Caşen Keskoyî mal û dewar ên Kurdan talan dibirin.

Caxê qomandarê kurd rûdaveyên Gelîyê Zîlanbihîst kar ji kar bihûrbû, çunkî Tirkan hêz û ordûyeke zehf anîbûn ser xêla Heyderî. Pêwist bû her ci zûtir barê giran ê Heyderiyan sivik be ! Ji bona wî Dawo, kurê bi cerg û aza yê Bro Heskî, li gel taqimek siwar şandin ku postên eskerî yên gundên Subhan û Noreşînê belav bikin. Navenda hêzêن eskerî li nav Subhan de bû, li Noreşînê tenê cil esker hebûn, ji bona wî şer li nav gund zor xesaret ji bo Kurden gund dida. Biryar wa bû nêzikî beyanî pelamar bibin ser postê Noreşînê, li ser riya Subhanê jî beşekê xwe veşêrin ; di katê ku eskerên Subhanê jî bo yarmetiyê ji gundê Subhan derdi Kevin bavêjin ser wan. Ew hêza ku pê spartibûn karê xwe bi çakî temam kir, paş şerekî giran eskerêن her du postan dîl girtin, çekêن wan stendin. Hejmara wan eskeran sed û bîst kes bûn. Eskeran ji bo jiyan û guzeran bi ser malêن Agrî dabeş kirin. Dotira rojê dora pelamardana Burnê Sor û Burnê Reş hat. Bi Agriyîyan zor xweş bû ku wan topêن mezîn ên ku li ser Burnê Sor danîbûn, ji hatin û çûyina Agriyîyan re mezahimet çedikir bi dest bînin. Kurdan dixwestin devêن van topan bi aliye ordûgaha Tirka bizivirîn ! Bi şev terîbata pêwîst hate girtin, berê beyanî êrîş bi ser her du postan dest pê kir, hê tarî bû li ser bingeyê Burnê Reş dest bi teq û taq kirin. Qomandarê Burnê Sor bi telefon bi bajêrê Bayzîdê got : "li bingeyê Burnê Reş şer dest pê kiriye, belam hê li malbenda me tiştek tune ! "Qomandar nizanibû ku Kurdan dora wî girtiye, hinde nêzik bûne ku temamê axaftina telefona wî jî dibihîsin.

Hewa ronî bû. Dengê tifingan ji ev post jî bilind bû. Tirkan li ser gir zehf baş meterîs* kola bûn û rîya hateçûn û peywendiye girtibûn. Kurd di helmeta* ewil de ew beşê gir ku top û çadirêن zabitan li ser wî de bûn bi dest xistin. Topçî ji topan

dûr ketin, eskeran li nav meterisên xwe cî girtin. Mîtralyozê bi xwe qomandarê wan xebitand û fasila wan û Kurdan tenê 15-20 metir bû. Kurd ser pê rawestayî tîr davêtin, esker li nav sengerên xwe nikaribûn serê xwe bilind kin, nîşanê bigrin.

Dirêjbûna vî şerî bi zerara Kurdan temam dibû çunkî dibû ku Tîrkan yarmetî bistenda. Her çend bi şev me ev jî hesab kiribû : taqima Fetoyê Şemkî xaniyek ku li nav Burnê Sor û îsteğaha Bayzîdê de bû girtibû, sedek* li ser rêya pêşîya hêza yarmetî ya Tîrkan çêkiribû. Sedê hêza yarmetî ya tîr her çiqas bihêztir be nikaribû hilweşîne.

Siwarêñ tîr di pişta Taş Burun de kom bûbûn, curet nedikirin pêş de werin, çunkî meterisa gulleyên mîtralyoza Feto nikaribûn nedîti bigirin û li dûr ve xerîkê temasayê qîrbûna eskerên xwe bûn. Li gel vê yekê jî piçek derengketina têkoşeran xirab dibû ; rêya paşekêşê rast û rût û dûr û zehf bi tîrs bû ; bi pêçevaneyê şûna eskeran li ser girekî bilind û bi temamî bi ser dor û ber de zaî bû. Lewra pêwîst bû ku kar yeksere be ! Di ser û bendê teqe û gurmegurma şerî de du siwarêñ kurd ji perrê hawirû Şexlû perîne û rast ber bi girê ku ciyê şer bû bezandin. Her çend tifing û mîtralyozêñ neyar nehiştin, belam heke bi rastî bizanibûna ku jî wan du siwaran yek bi xwe qomandarê kurd yê din Broyê Heskî ye, her çawa bibûya bi bihayê giyanê temamiyan jî bibûya ne dihiştin ev du giyan bi selametî derbas bibin ! Paş gihiştina bi girê şer, qomandarê kurd qîrîn kir, got : "Gelî eskeran ! Ez Ihsan Nûrî me. Ji bona wî hatim vir ku bêjîm Kurd zerarê nagihînin we. Hê jî me kes nehatîye kuştin. Teslîm bin, çekêñ xwe bavêjin erdê, metirsin !.."

Eskeran tifingêñ xwe danîn, dawiya şer hat. Telefata ku eskeran dabû zehf bû, qomandarê wan jî hatibû kuştin. Di vî şerî de devêñ gulleyên tîr mixabin li singê Edo Emkî Hesesorî, ku dilê pakê bi atifeyê wî hebû, ket. Devê topa mezin a ku bi destê Kurdan ketibû bi alîkariya topçiyêñ dîlketî yên tîr bi alîyê ordûgaha Bayzîdê zivirandin. Wê gulebaran kirin. Ev topçiyêñ dîlketî jî ber naçarî bi qiseyêñ me itaet dikirin. Lê mixabin ev top tenê 27 gulleyên wê hebûn. Top gewre û giran bû, wesîleyê birina wê jî nebû ; naçarî bi wesîla Tîrkên dîlketî bi zehmetê ber bi Agrî hate kişandin. Birina wê bi qoç û çaxêñ çiya mimkin nebû ; ji bona ku bi derdê Kurdan nedihat, mekanîzma wê derxistin veşartin, ta ku Tîr jê kelk wernegirin.

Di vî şerî de nuwînerê* teze yê ermenî Vahan ku di ordiya rûsî ya Çar de zabit bûye ji girekî gundê Şexlû temasayê pelamara şêrane ya Kurdan bû.

Fermandarê desteyê ku bi ser Burnê Reş şandibûm Ferzend Beg bû, di navbera pêk helperanî ewel de birîndar bû, arîkarê wî Nûro, kurê aza yê Mûsa Bêrkî, hate kuştin. Tîrkan di nav çar dîwarêñ ku çêkiribûn cî girtibûn, mezgel danî bûn difa' dikirin. Pey temambûna karê Burnê Sor, Bro Heskî bi tenê ji Çiyayê Qotîs ji jor bi alîyê jêr bi yarmetiya şerkarêñ Burnê Reş çû, wanana wisa dizanibûn ku qoçê Çiyayê Qotis cil siwar girtine. Têkoşerêñ ku bi birîndarbûna Ferzende Beg û kuştina Nûro bê ser mabûn, Bro Heskî bi hêza yarîdeder a neyar zanibûn, bi alîyê Agrî paşekêş kirin. Bro Heskî jî zivirî bi Çiyayê Agrî, idî pêş de neçû. Ev desteyê ku karê giringtir ji dîlgirtina hêzên neyar, Burnê Reş bi ohdeyê wan danîbûn, mixabin ji

ewel de ferma qomandar bi cî neanîbûn. Qerar bû ku cil siwar bi şev di qoçê Çiyayê Qotis derkeve, beyanî kela Bayzîd û bajêr ji Neqeba Şeytan gulebaran bike, pey temambûna karê Burnê Reş, Ferzende Beg bi hêzên xwe ji qoçê derkeve, ji jorê bi Gerdene Şeytan û bajêr pelamar ke. Desteyê Burnê Sor jî bi yarîdeya top bi Taşboran pelamar bibe û dagir bike, topê pêş de bibe Bayzîd û îstegeh gulebaran bike. Ev cil siwar ta nîvê rê çûne, girê Noreşîn girtin, ji qûçê derneketine. Tenê karekî kiribûn : siwarêneyar ku ji Kurcî Bulax -sînorê Iranê- bi yarmetiya Taşboran dihatin pêşî li wan girtine, wan zorê paşekêşê kirine.

Wê şevê Tirkan postên eskerî yên xwe ji pêşîya merivêن Agrî hildan, birin Serê çiyayê pêşîya Agrî. Dotira rojê froke dest bi bombarana navçeyê kirin. Bombeyek li ber diya Bro teqîya û ev pîrejina ku temenê* sed û deh zêdetirê wê hebû, ev dayik ku Bro û Eyûb Axa xwedî kiribû hûr kir.

Dewleta Tirkîyê ji bona çêkirina vî şerî Kemaleddîn Samî Paşa ku sefirê Tirkîye bû li Berlînê ji Almanyê anîbû. Navenda vî generalî navçeya bajarê Wanê bû. Samî Paşa di navbera salê 1919-1920 de fermandarê firqeya 9 a Qafqasê û nuwînerê Mustefa Kemal Paşa bû di nezda Istenbolê de. Di wê çaxê de Ihsan Nûrî li nav Istenbolê de eleyha hikûmata Ferîd Paşa helsa. Dewlet wî ji kar avêt, paşê Ihsan Nûrî bi wî re gotebêj dikir, deng û basênu bi Ihsan Nûrî pêwîst bû dida. Hikûmeta Ferîd Paşa ket, Alî Riza Paşa ku li gel Mustefa Kemal bed nebû bû Başwekîl, Ihsan Nûrî ji nav fermanê dest kêşa, Kemaleddîn Samî Paşa jî cardin hate ser firqeyê. Dibêjin çun berê li gel Ihsan Nûrî aşînayıya wî hebûye Ankara wî ji Almanyê anîye.

SOVYET Ú IRAN ARÎKARIYA TIRKIYÊ DIKIN

Wan rojan hêzên tirk ji erdê Iranê ji rohelata Agriya Piçûk de lêdidan, Serdar Bulagirê girtin, çun hêzên Agrî ew qas nebûn ku her aliyêni Agrî biparêzin, bi hêsayî girtibûn û bicî bûbûn. Nuwînerê Filleyên Taşnaq ku ewî dît, digot : "Heke ta 24 saetan em ji Agrî dernekevin hemû bi destê Tirkan dikevin." Pêşneyara îşev valakirina Agrî dikir. Belam Kurd ku pênc sal bû tama lezîz a azadiyê girtibûn, bi hêç çeşnî nikaribûn hazır bin azadiyê bi vê erzaniyê ji dest bidin, ji Agrî derkevin, navenda şoreşê bi neyarar bispêrin. Li ser wî qomandarê kurd welam* da, got : "Rast e di nav ev deryaya neyar de nexeniqîn dijwar e, belam em kurd in, ji gemarobûn* natirsin. Her an dil bikin û gemaro çiqas tengtir û zortir be jî dikarin wê bisikînin. Ji xwe em naxwazin ji Agrî derkevin !.."

Nuwînerêni israr dikir, digot : "Qe nebe, fermandarê kurd nefsa xwe li gel xanima xwe ji Agrî derkeve." Welama qomandar jî wisa bû : "Ev pêşneyara te ji bo gotin nahêj e : ez ji bona jiyana şexsê xwe ji azadiya netewî dest nakêşim, giyanê min ezîztir ji hevalên min, ji ev qaremanan nîne, jîyan û mirina min yek e, ez tu car ji wan naqetim ! Heke teqdîr be, em tevî hev dimirin ! Tu bi xwe dibînî sî-çil hezar hêzên neyar dor li me girtine, li pêşîya yek pêşmergê me ji sed û pêncî esker kêmîtir nîne.



Top û bombe û froke jî zêde ne. Mayina te li cem me êdî pêwîst nîne, hê helqeya gemaro bi temamî li dora Agrî nekêşane, hêzên Tirkan ku teze hatine Serdar Bulaxê Îşev nikarin aliyêن xwe qors bikin, ji vê derfetê kelk bigrin, şarezayêن xwe jî hilde, Îşev ji Agrî derdkevin !..”

Ev şarezayan pênc Ermenî bûn ku çend roj berê bi Agrî hatibûn. Fermandar çû layê şerkarêن xwe û nuwînerê ermenî li gel hevalên xwe çûn ji bo sazkirina ciyêن xwe, wê şevê ji Agrî derketin. Çaxê çûyinê xwastine jina fermandar jî ji Agrî derxin, gotine : “Ihsan Nûrî jî li pey me tê”. Jin di welamê de gotibû : “Her meteris be Ihsan Nûrî hebe ez jî hevbeş im, qet ewî di nav agir de nahêlim, xwe xelas nakim, hun herin, Xwedê yarê we be !”

(Dûmahîk heye)

akam : dawî ; Ararat : Agirî ;
aza : mîrxas, cesûr ; azayeti : mîrxasî, cesaret ;
balyoz : sefir : bedaxewe : mixabin, maelesef
belam : belê, lêbelê ; bêlayenî : bêalîti, bêterefî ;
berwar : tarîx ; berewurd : dan ber hev, teşbih ;
berper : kopya ; beyanî : sibehê ;
bizotin : livîn, hereket kirin ;
çalaklı : jêhatîyi, faalî ;
encam : dawîne, netîce ;
froke : balafir, teyare ;
gemaro : mihasere ; gemaro kirin : dor lê girtin, mihasere kirin ;
helmet : êriş ; helperanî : serhilanîn, isyan ;
helsam : rabûn ; hest : his ;
qorsî : giranî ; jandermârî : hêza, cendirmeyî ;
ji nav birin : şkînandin, mexlûb kirin ;
juen : hezîran ; juîye : temûz ;
karesat ; bela, xax, mûsîbet ;
kat : dem, wext ;
kelk : faîde, istifade ; kelk girtin : istifade kirin ;
komek : alîkarî ; kuhî : kûvî ;
mawé : dem, weş, navber ;
meteris : senger, mewzî ;
merr : pez ;
nebez : ê ku piştä wî nayê erdê ;
neng : şerm ; nîvro : başur, cenûb ;
padaş : xelat, perû ; pêkra : teví hev, hevre ;
pelamar : êriş ; pena : stare, îltîca ;
role : zaro, mindal ; senger : mewzî ;
sereta : destpêk ; serboxo : serbixwe, misteqîl ;
şanazî : iftixar ; şar : bajar ; tavan : sûc ; tavanbar : sûcdar ;
temen : emr ; vurdî : hurî ;
xoşbextane : bextewerane ;
yaride : alîkarî ;

NÊRÎNEK LI SER JIYAN Û XEBATÊN BASILE NIKITINE

Helkewt HEKİM*

«Majî bîlî lêgerîn û nîvîsinê Nikitine tiştekî din kiriye!» Gava karmenda pirtûkxaneyeke Parîsê ya rohelatnasiyê bersîva min da, ew behitibû. Dîtina lêger a aborî ya ku li Banka Ticareta Dervayî ya Fransayê şûna Nikitine girtiye pir ji ya pirtûkxanevanê cuda nebû. Ew ne tenê ji Nikitine hiz dikir lê berdiket ku wê ew ne dîtibû. Lê, bê gûman, Kurd hê bêtir hewcê nasîna vî zaneyê hêja ne. Vêca, piştî borîna 25 salan li ser mirina wî, sedemek heye ku destpêkirina nasandina wî bi min xweş dike. Gerçî meznahî û çakiya karêن wî destûra mirovî nadîn ku bi lez û bi awayekî serveyî (sethi) wan bide nîşandan, lê ev destpêkek e, hêvîdar im ku dê xwendevan li kêmasyiyen vê nîvîsarê nenêrin.

JIYANA WÎ

Nikitine di sala 1885 de li bajarê Sosnovitsê li Polonyayê ji diya xwe bû ye. Di nav mirovên mala wî de kes nebû ku hewesa xwendin û lêgerîn li ser Rohelat bike an wa li ber wî şîrîn bike. Çaxê bû xort ew dest bi hînbûna Rohelatê kir û li ser wê diaxift bi seydayê xwe yê zimanê fransizî ku li gelek welatên Asyayê geriya bû. Kurtegerên wî li dorûberên Derya Reş û li Qafqasyayê di dilê wî de evîna Rohelatê peyda kiribû. Ev evîn ta rojîn wî yên dawî di dilê wî de mabû.

Piştî qedandina lîseyê, di sala 1904 de Nikitine xwe li xwendegeha Lazarev, a Moskovayê, nîvîsi ji bo fîrbûna zimanên farîsî, erebî û tirkî. Çaxê vê xwendinê temam kir wî bingheke baş a van zimanân hebû. Paşê, wî çend rîvingî kirin, li İstanbul û li Parîsê guhdariya dersên hin rohelatnasên fransizî kir. Di sala 1908 de ew diçe paytexta rûsî San Petersburgê (Lenîngrađa iroyî) xwe li xwendegeha wergerandinê ya girêdayî bi Wezareta Dervekariyê dînîvîsi. Piştî salekê, wî ji bo

* Eslê vê nîvîsarê bi zimanê erebî ji bo "Hêvî" yê hatîye nîvîsin, Mûsa Kaval wê ji erebî wergerandiye kurmancî.

zanîna xwe têkûztir bike şandin qonsilxaneya rûsî ya Afganistanê. Li wê derê karî ji nêzîk ve bi nûçeyên şoreşa meşrûtî ya Iranê agahdar bibe. Gava ku sala wî diqede ew dizivire San Petersburgê û li wir keçeka fransizî (H. Laure) mehir dike, Laure ta mirina wî di gel wî ma.

Di 1911 de Nikitine imtihaneke Wezareta Dervekariyê derbas kir û hate bijartin Sekreterê werger li qonsulxaneya rûsî ya Reşte (navçeya Gêlanê). Ewî tabihara 1915 an li wir kar kir û paşê hate bilindkirin payeya dewsgirê qonsul û çû bajarê Tebrîzê. Ew gelek di vê payê de nema, zû wekî qonsul ji Ormiyê re hate şandin. Ev bajar hindê meydana dijayetî û xireciran bû di navbera Tirkan û Iraniyan, Kurdan û Filan de.

Nikitine sê salan (gulan 1915-nîsan 1918) li wî bajarî ma, sê salên pir girîng ji bo lêkolînên wî yên paşîn. Di van salan de wî karî hînî zimanê kurdî bibe li cem Mela Seîdê Qazi yê Kurdistanê. Vî mirovî tesîreke mezin li ser wî hişt. Ji ber vê yekê di nîvîsînên xwe de Nikitine her ji wî diaxive, hestêن (hisêن) xwe yên kûr ji bo wî diyar dike, bi çavekî mezin dinêre li têgihiştin û zanîna wî ya di warêن ziman, ol û torê de, dîtinêن wî diecibîne.

Ji ber bûyerên wan salan, Nikitine bi xebateke siyasî ya mezin bilî bû. Êrîşen Tirkan, rewşa Kildaniyan û aloziyên eşîrên Kurdan wî mecbûr kirin ku li Kurdistanê bigere, bi eşîrên kurdî re danûstanê bike. Di van hate-çûnan de wî karî gelek belge û malzeme berhev bike ku ew paşê bûne bingehêne sereke ji bo lêkolînên wî yên li ser Kurdan.

Pey şoreşa bolşevîk baweriyênen komunîstiyê belav bûn li nav eskerên rûsî yên Iranê. Rewşa nû ne bi dilê wî bû û wî biryar stend ku Iranê yekcari biterikîne. Di sala 1919 de ew hate Fransayê da ku her li wir bimîne. Bi vê hatinê jiyana wî bi awayekî giştî hate guhirîn. Dev ji karên siyasî berda xwe bi temamî da lêgerîn û nîvîsînê. Ji bo ebûra xwe ew 28 salan di şaxê lêgerînên aborî yê Banka Fransizî ya Ticareta Derveyî de xebitî û piraniya demêن xwe yên vala bi lêgerîn û nîvîsandinênu ku têkiliya wan bi karê wî nebûn diborand.

Di heftê hezîrana sala 1960 de, Basile Nikitine çû rehmetê. Xebatênu ku li pey xwe hiştine ewê navê wî di bîran de timî jîndar bihêle.

Piştî mirina wî, mudirê kovara Afrîka-Asya gotineke xatirxwastiniyê li ser wî nîvîsî ku hêjâyê wergerandinê ye : *heke di vê gotina xatirxwastinî de em ji çakiya vî mirovî neaxivîn, bêgûman, dê tiştine girîng bîhêlin :*

- *Nikitine dergehê serîkaniya zanînên xwe vekirî hiştibû ji bo xortêñ hewesdar*
- *Ew merd bû ji bo komeleyênen zanistî ku ew di wan de endam bû, nexasme ji bo komeleya me ya Asyayî*
- *Basile Nikitine di rojêñ dijwar ên jiyana xwe de jî xwe bê rawestan dabû nîvîsandineke paqij a kêmheval¹*

1 L'Afrique et l'Asie, 1961, r. 46-49.

XEBATÊN WÎ YÊN LI SER KURDAN

Bi kotevê mirov dikare lêgerekî bibîne ku lêkolînên wî yêñ li ser Kurdan wekî yêñ Nikitine fireh bin, ewêñ ku wî di nîv-sed-sala jiyanâ xwe de pêk anîne. Firehiya fîkrêñ wî ne tenê ji bo gelêñ kurd meyweyê xwe daye, wî li ser gelêñ din ên Asyayê jî nivîsiye : ji ziman, dîrok, aborî, siyaset ta edebiyat û hinerê wan. Hejmara pirtûk, bend, nivîsar û wergerandinêñ wî digihê pênciyan. Ji wan hinek hê nehatine çap kirin. Bi borîna rojan, toza bîrkirinê li ser wan pir dibe ; kaxezêñ wan ku bi daktîloyê hatine nivîsin kurm dixwin, wekî wergerandina wî ya Şivanê Kurd bi zimanê fransizî ku ev sî sal in radizê di hin pirtûkxaneyêñ Parîsê yêñ rohelatnasiyê an li ser refikêñ pirtûkxaneyêñ arizî yêñ hin kesêñ ku bi Kurdan biliñ dibin.

Caxê ku B. Nikitine dest bi belav kirina nivîsarêñ xwe kir bi fransizî, zanîna gelê fransizî, bi awayekî giştî, pir kêm bû li ser Kurdan. Tiştêñ ku Fransiz ji Kurdan dizanîn, bi kotevê ev bû : fikra besdarbûna Kurdan a qirkirina Ermeniyan û daxwaza Kurdan a bidestxistina mafêñ wan ên neteweyî piştî cenga cihanî ya yeka.

Heçî rûçikê Kurdan li cem rohelatnasan, bi awayekî giştî, ew hatibûn naskirin bi nivîsarêñ rêwingêñ ku li Kurdistanê û dorûberêñ wê geriyabûn. Di vegera xwe de wan agahiyêñ neqenc li ser Kurdistanê diyar kirine. Wan tenê bi hinek nêrînêñ serveyî û çend sérpêhatiyêñ xwe Kurd didan nasîn. Ev hikm pir zor bû û ji bêalîtiyê gelek dûr bû. Nikitine ku baş gelê kurd dinasî û ji wî hiz dikir li ser xwe ferz dît ku dest bi belavkirina nivîsandinêñ rast û durist bike li ser Kurdan. Di yekê ji bendêñ (meqaleyêñ) xwe yêñ pêşîn de ku di kovareke ne ji bo pisporan de hatiye belavkirin, wî çend bîr û dîtin ên giştî nivîsîne. Paşê li ser Iranê û Filan bend belav kir û bi vî awayî wî hejmareke mezin ji hewesdarêñ nasîna Rohelatê baştir agahdar kir.

Nikitine, ji bo baş fîrîşkê civata Kurdan a hemden bizane xwast ku dîroka wan, pêşveçûna wan a siyasî, aborî, civakî û ramanî (fikri), sîstema eşîrtiyê binase. Eşîrtî ji mercêñ xwezayî (tabî) yêñ Kurdistanê peyda bûye. Ji ber ku her navçeyek Kurdistanê têra xwe dikir û serbixwe bû, serokatiya wê ketiye destêñ eşîran. Bi vî awayî li nik mirovê kurd kesdarî xurt bû û wî her tiştê derveyî eşîriyê avêt. Demeke dirêj pergala (nîzama) mîrîtiye bi ser eşîran ket. Gerçî ev pergäl tiştekî nebaş bû ji bo civaka kurdî, lê, tevî vê yekê jî ew, li gora Nikitine, tê hejmartin yek ji wan pêkeran (faktoran) ku zanava (huwiyyeta) Kurdan parast. Ew dîn jî gelek girîng dibîne û bawer dike ku dîn yek ji kîlîtêñ sereke ye ji bo nasîna gelê kurd, nexasme lêgerîn li ser tarîqetêñ sofiyan wekî Qadirî û Neqşebendiyan. Belavbûyinya xelîfêñ şêxan di nav eşîran de hézeke nû peyda kir di nav civaka kurdî de. Xurtahiya wan tixûbêñ eşîrê dibuhire. Di gel vê yekê destelata (otorîteya) şêxan a navendî. Nikitine bawer e ku misilmaniya Kurdan xas û xweser e. Bê güman iro dîtinêñ wî yêñ li ser van pirsan rastiya xwe nîşan didin. Lewra vêga pêlêñ misilmaniye li welatêñ islamiyê din xurt in lê li Kurdistanê tu deng ji wan nayê.

Lêkolînên Nikitine li ser pêşveçûna tevgera neteweyî ya kurdî jî yekemîn lêgerînên zanistî ne û pirtir bi serûber in. Ew dîroka vê tevgerê dike sê qonaxan :

I. Qonaxa serhilanîn û tevgerên bê tenzîm

Van tevgeran tu bernameyên giştî nebûn. Ev qonax bi serhilanîna Abdurehman Paşayê Baban dest pê dike (1806) ta tevgerên Mîrê Kor (1839), Bedirxan (1843-1846) û serxwerabûna Şêx Ubeydullahê Nehrî (1880).

II. Qonaxa destpêka tenzîma tevgera neteweyî

Eve dest pê dike piştî salên pûçbûna tevgera 1880 û ta dawiya Cenga cihanî ya yeka dom dike. Di vê demê de yekemîn teşkilata siyasî ya kurdî çêbû, çapa kurdî peyda bû. Ew li nav Kurdan belav bûn û şûnên xwe çêkirin li ser xwendayêñ kurd û li ser ramana wan.

III. Qonaxa nasîna navneteweyî ya daxwaziyêñ Kurdan

Lihevkirinê Sevr (1920) û Lozanê (1923), pirsiyariya Müsilê, çêkirina Komîta Serxbûnê û gelek tevgerên din ên Kurdan ta cenga cihanî ya duwemîn dikevin vê qonaxa sêyan.

Bawer im ku ya çêtir ev e ku nivîsarên sereke yên Nikitine li ser Kurdan bi kurtî bidime nasîn.

- *Quelques observations sur les Kurdes* (Çend müşahede li ser Kurdan), di kovara *Mercure de France*, cild CLV, r. 662-674.

Tê de hin dîtin li ser dîroka Kurdan, fîrişkê (karakterê) civaka wan û sedemîn peşveneçûyina wan a ta destpêka sedsala XXan hatine pêşkêş kirin.

- *Les Valis d'Ardelan* (Waliyên Erdelanê) di kovara *Revue du monde musulman*, Paris, 1921, cild XLIX, r. 77-104.

Ev wergerandineke kurt a pirtûka Elî EKBERXAN-SADIQ bi navê *El Melîk Baxê Nasîrî* ye. Tê de agahdarî li ser coxrafya Mîraniya Erdelanê, hejmara eşîrên ku di bin hikmê wê de dijîn û qasiya bêşa ku wan didan, hatine dayîn û çend rûpel jî li ser dîroka vê mîraniyê û li ser jiyana wê ya siyasî û leşkerî hatine nivîsin.

- *Les Kurdes et le christianisme* (Kurd û fileyi), di kovara *Revue de l'histoire des religions*, Paris, 1922, cild LXXXV, no.3, r. 147-156.

Piştî nasandina afirandinên filan wekî dêrên wan ên kevn, adetên wan û teqlidên wan ên ku niha di nav Kurdan de têne dîtin, Nikitine dibêje ku di navçeyên

Kurdistanê îroyî hejmara filan di deh sedsalên pêşîn ên mîladê de ji ya Kurdan bêtir bûye.

- *La vie domestique kurde* (Jiyana navmalî ya kurdî) di kovara *Revue d'éthnographie et des traditions populaires*, Paris, 1922, r. 334-344.

Ev bend li ser jiyana rojane li Kurdistanê ye : Teşe û pergala malan, xwarin, lixwekirin, orf û adetên di nav Kurdan de belavbûyî wekî banqutkan ji bo ji dayikbûna zarokan, jinanîn, veşartina miriyan, xurafe, hwd...

- *Les thèmes religieux dans les textes kurdes de la collection de B. Nikitine* (Babetên dînî di metnên kurdî yên ku B. Nikitine berhev kiriye) di *Actes du Congrès International de l'histoire de la religion*, Paris, 1923, cild II, r. 413-431.

Çaxê ku Nikitine hînî zimanê kurdî dibû li cem Mela Seîdî (di navbera salên 1916-1917) wî hin çîrok û serpêhatiyan jî berhev kiribû. Li ser naveroka wan a olî (dînî) lêgerînek pêk anîye û wê di Kongra navneteweyî ya dîroka olan, ku di 1923 de li Parîsê civiyaye, de pêşkêş kiriye. Di vê lêgerînê de ew qala Kurdan û misilmaniya wan (şêxên Kurdistana Tirkîyê, dîtinên Mela Seîdî li ser cihadê), helwesta (mewqifa) Kurdan li ser şîftî û li ser fileyiyê dike.

- *The tale of Suto and Toto* (Çîroka Sûto û Toto) di *Bulletin of School of Orient and Africa studies*, London, 1923, r. 69-88.

Çîroka Sûto û Toto di nav Kurmancan de rind tê nasîn. Nikitine wê bi alîkariya Major Soane wergerandiye ingilîzî û tevî kurdîya wê (bi tîpênererebî) çap kiriye.

- *Vue d'ensemble sur le théâtre de la Grande Guerre dans le nord-ouest de la Perse* (Nêrîneke tevayî li ser cîgehîn Şerê Mezin -cenga cihanî ya yeka- li bakûra rojavayî ya Iranê) di kovara *L'Asie française*, Paris, 1924, cild XXIV, r. 340-345.

Ev nivîsar ji rewşa Afşar, Kildanî û Kurdan diaxive ; para pirtir a wê li ser peywendiyêñ Kurdan digel Kildanî û Afşaran di salên cenga cihanî ya yeka hatîye nivîsin. Tê de agahdarîyêñ hejmarî hene li ser eşîrîn Kurdan ; ciyêñ wan, navêñ serokêñ wan û hejmara malbatêñ her eşîretê jî hatine diyar kirin.

- *La féodalité kurde* (Derebegîtiya kurdî) di kovara *Revue du monde musulman*, cild LX, Paris, 1925, r. 126.

Di vê lêgerînê de agahdarîyêñ çak li ser dîroka derebegîtiya Kurdan, xasîtiyêñ wê, peywendiyêñ wê digel dewletêñ misilman -dewleta tirkî û ya farisî- hene. Nikitine bawer dike ku derebegîtiya kurdî di hundirê împaratoriya osmanîyan de bipergaltır û pêşveçûyîtir bû ji derbegîtiya kurdî ya hundirê împaratoriya farisî.

- *Les Kurdes racontés par eux-mêmes* (Kurd li ser xwe dipeyivin) di kovara *L'Asie Française*, Paris, 1925, no. 231, r. 147-157.

Ev bend piştî perçiqandina serhilanîna Şêx Seîdê Pîran hatîyê nivîsin. Di wê heyamê de rojnamevanêñ fransızî bi awayakî rast an derew li ser vê tevgerê dinivîsin. Nikitine dêmekî nêzikî rastiyê ji Kurdan dide nîşan dan ji bo ramana

tevane (reyî a'm) a fransizî. Ew berxwedanê kurdî yên berê bi bîr tîne, ji dîrok, civak û siyaseta Kurdistanê û ji rewşa Şêxên Barzanê û Nehrî diaxive û çend agahdariyê kurt li ser Şêx Xalit jî dînivîse.

- *Kurdish Stories from my Collection* (Çîrokênd kurdî ji yên ku min berhev kiriye) di *Bulletin of School of Orient and Afric Studies, London, 1926, cild IV, r. 120-138.*

Ev sê serpêhatî ne ku Nikitine ji Mela Seîdê Qazî yê Kurdistanê wergirtine. Wan tevî pêşgotineke kurt bi kurdî (tipêñ erebî) û wergerandina wan a ingilîzî çap kiriye. Me'neyê hin gotinan li rexên pelan nivîsiye.

Ev çîrok ev in : Çîroka Mam Mizgo ; Xort û pîr ; Şêx Silêman ; Çîroka mîrê Hekarê û mîzgîniya teyrê biharê.

- *Où en est la kurdologie ?* (Kurdnasî gihiştiye ku ?) *Annali del Real Institute Orientale de Napoli, Napoli, 1932, r.1-5.*

Ev nasandineke kurt e li ser lêkolînênd kurdî ji zimanê keşe M. Garzonî (bavê kurdnasiya awrûpayî), nivîskarê *Gramatica della lingua kurda* (Gramera zimanê kurdî, Roma, 1787) ta salênd Cenga Cîhanî ya Yeka.

- *Une apologie kurde du sunnisme* (pesneke kurdî ya sunîtiyê) di kovara polonî *Roeznik Orientalistyczny, cild VIII, Lwow, Polonya, 1933, r. 116-160.*

Ev nîvsar hatiye hilkişan ji çîrokeke kurdî bi navê *Serpêhatiya Derwêşê Kurd ji Silêmaniye digel Mictehîdê Kerbelayî*. Nikitine vê çîrokê tevî wergerandinê xwe bi fransizî, tevî çend dîtinênd xwe li ser pîrsîn zimanî belav kiriye. Di pêşgotinê de ew lêkolîneke kûr dike li ser vê serpêhatiyê û dixwaze astengên ku derdi Kevin ser riya lêgerên hewesdar ên nasîna sunîtiya Kurdan nîşan bide.

- *Notes sur les Kurdes* (Nişe li ser Kurdan) di kovara *Oriental Studies, Oxford, 1934, r. 305-335.*

Ev lêgerîneke li ser ziman e. Tê de B. Nikitine sê tiştan dide nîşan dan.

- Gelo kurdî zimanekî ûranî ye ?
- Teoriya Jafetiya kurdî
- Avahiya zimên : çêbûna gotinan, lêvandin (telaufuz), hevok, hwd...

Wekî gelek zaneyênd din Nikitine bawer e ku zimanê kurdî ji malbata zimanê ûranî ye. Baweriya wî li ser daneyênd zimanevanî, nijadî, dîrokî û folklorî ava ye. Ew li ser teoriya zimanênd jafetî (zimanênd asyayî yên serbixwe wekî gurcî) dimîne û nîşan dide ji ber çi kurdî naakeve vê malbata zimanî.

- *Le système routier du Kurdistan* (Sîstema rîyênd Kurdistanê), di kovara *Géographie, Paris, 1935, r. 360-385.*

Ev bend li ser rîyênd Kurdistanê û awayê çêkirina wan e. Nivîskar ji tiştênd ku çaxê li welatê Kurdan bûye bi çavênd xwe dîtiye diaxive. Tê de hin nexše (xerîte) û dîdemên ji Kurdistanê jî hene.

- *Essai de classification du folklore kurde à l'aide d'un inventaire socio-économique* (Cêribandina tesnîfa folklora kurdî bi alîkariya envanterek civakî û aborî), di *XVème Congrès International de l'Anthropologie, Bruxelles, 1935.*

Nikitine vê gotarê li Kongra XVI ya navnetawî ya mirovnasiyê ku di 1935 de li pâytexta belçikî Bruxelles'ê civiyaye pêşkêş kir. Ew çîroka Mem û Zinê ji xwe re dike bingeh û dixwaze dîdemek civakî û aborî ji jiyana gelê kurd bide nîşan dan, ji avahî, cil, çek, jiyane rojane, çandin, nêçîr, dewarxwedîkirin û karê destî yên wê demê diaxive.

- *Le Problème kurde* (Pirsa kurdî), di kovara *Politique étrangère*, Paris, 1946, No. 3, r. 251-262

Piştî Cenga Cihanî ya Duwemîn li pir ciyan ji Kurdan dihate axaftin û Nikitine bi vê nivîsandin a xwe xwast wan bi qencî bi xelkê bide nasîn. Ew daneyên bingehî yên vê pîrsê pêşkêş dike, qala dîroka wê dike, Kurdan diparêze û benda xwe bi gotinê han didawîne : daxwaza gelê kurd daxwazeke adîl e, nabe ku hela wê her bête paşvedan.

- *La poésie lyrique kurde* (Helbesta evînî ya kurdî), di kovara *L'éthnographie*, Paris, 1947-1950, r. 39-53.

Di vê lêgerînê de Nikitine xasîtiyên stranên kurdî daye nîşan dan û çend helbestên Kamuran Bedirxan wergerandiye fransızî. Wergerandina erebî ya vê gotarê di kovara *Studia Kurdica* N°. 2 de çap bûye.

B. Nikitine dîtin û lêgerînê xwe bi awayekî kurt kom kirine di pirtûka xwe ya bi navê *Les Kurdes*. Ev lêgerîneke civaknasî û dîrokî ye. Ew nivîsandina vê xebatê di 1943 de temam kiriye, lê ew piştî sêzde salan karîbiye bê çap kîrin. Hindê pirtûkên li ser Kurdan nivîsi kêm dihatin xwendin û ji ber vê yekê çapkeran di xwe re nedidît wê belav bikin. Li ser daxwaza çend zaneyên fransızî yên navdar, wekî rohelatnasê bi nav û deng Louis Massignon ku pêşgotinek ji bo wê nivîsiye û bi alîkariya diravî ya Navenda (merkeza) neteweyî ya lêgerînê zanistî ya Fransayê, pirtûk hate çap kîrin. Ew tê hejmartin wekî firehtîrin pirtûka ku ta niha li ser Kurdan hatîye nivîsin, lê her lêgerek, di ci warê kurdnasiyê de be, pêwîstî vê pirtûkê ye di warê lêgerînê de di dema nihoyî û di salêن wêbeyî de.

Pirtûk berê bi zimanê fransızî hatîye nivîsin, paşê hatîye wergerandin bi çend zimanên biyanî : tirkî, rûsi û erebî. Wergerandina erebî ya xerabtirîn e ku li Beyrûdê *Dar Al Rewaïh* çap kiriye.

Ji bili van lêgerîn û nivîsaran, B. Nikitine hin bendan li ser şexsiyetên kurdî û hêlîn Kurdistanê nivîsine di Ansiklopediya İslâmî de, wekî : Bradost, Bedirxanî, Şemizdinan, Oremar û Rewandiz.

Dîsa wî di kovara *L'Afrique et l'Asie* de li ser hin pirtûkên ku li ser Kurdan hatîne nivîsin bendêñ nasandinê belavkirine. Gava wî li ser gelêñ cînarêñ Kurdan nivîsiye, wekî Iran û Yekîtiya Sovyetî, di pir ciyan de dîsa ji Kurdan axiviye.

Basile Nikitine qencîyeke mezîn li me Kurdan kiriye. Hêvîdar im ku ev çend gotinêñ ji bo bibiranîna wî wekî spasiyek biçük bêñ qebûl kîrin.

SERDAR

Tosinê REŞİT

Serdar kesirî gihişte mal. Pirejina wî, Xatê, hema ber şêmîkê şerbikê av li ser destê wî da kir û Serdar idî nehişt pêşgîrê bîne, hema bi dawa dêrê wê destê xwe ziwa kir. Paşê kete hundur, kurtikê xwe êxist stûnê va bi dar da kir û li ser kulavê ber stêr qatkirî rûnişt. Xatê textê ku spartibûne stûnê li ber wî danî û şîv da berê, kerî nanê ceh, kaxikek tijî dew û hebek pêqaska bê rûn kelandî, pêqask ewê bi xwe hema li dora malê berev kiribû.

Serdar du parî nan di nava dew da şil kirin, kirine devê xwe, demeke dirêj cüt, paşê hema ji kaxikê hinek dew bi ser xwe da kir û pişta xwe da stêr. Xatê texmîn kir, wekî mîrê wê idî nan naxwe û sîfrê berev kir.

Serdar berê jî pirbêj nînbû, lê van çend mehên paşin çiqas diçû, ewqas kêm dipeyivî, tê bêjî roj bi roj ji bona neferê malê xerîb dibû, roj bi roj li dora xwe çit vedigirt, dîwar hildijenî. Car dibû, wekî Xatê bi heftiyan gîlî ji devê wî nedibîhist, bi heftiyan çavê wana rastî hevûdu nedihatîn. Serdar timî serî berda bû, timî bi xwe da diponijî, te digot gunekî mezin kiriye û niha nizanê xwe çawa efû bike. Xatê carna dizîva li mîrê xwe dînihîrî, rojêd buhurî xweş danîne bîra xwe û kızîn ji dilê wê dihat, bi xwe dikewgirî.

Êvarêñ xwe ew û Serdar li ser kevirê rex şêmîkê derbaz dikirin. Timî di pey şîvê de li ser wî kevirî rûniştî, pê kêra berya xwe, ya her roj tûj dikir, ji darê tayê kevcî, hesk, an jî darikê nexşe ji bo stuyê nêriyan û beranan çedikirin.

Lê iro ew ji mal derneket. Çû quncikê malê li ser qonc rûnişt û cixara xwe vêxist. Xatê idî zanibû, wekî mîrê wê dixwaze pal de. Loma jî kulavê li ber stêrê qatkirî hema di cî de vekir û li ser wî ciyê mîrê xwe danî. Serdar cixara xwe kişand, derê vekirî avête derva û kete nav nivîna.



Ew îro dîsa bi gewrayiya sibê re ji malê derket. Hê negihîştibû serê zeviya xwe, gava pencê rojê yê pêşin esman tîş kirin, xwe avêtne serê çiyayê bilind û di bin wan penca de berf mîna durê qaşa gustîlka çîrisi. Bakî tenikî, lê seba vê dema biharê hebekî sar, ji berpalê çiya peya dibû û tê bêjî li Serdar kinc tune bûn, bi carekê re çermê wî qul dikir û nava hestiyê wî derbaz dibû. Ricif kete navdilê wî yê xalî û ji bo hebekî germ be, ewî xwe li ber kendalekî teland. Kalitiyê idî zor didayê, canê wî, laşê wî bêdeyax bûbû. Van demê paşin ew zû jî diwestiya. Ew yek, ewî çend meha pêş de texmîn kir û gelekî ber xwe ket. Gava pêşmerge bû, dibû tevî hevalan piştiyê giran li pişte 70-80 kilometir rê diqedandin. Serdar zexm bû, carna piştiyê hevala jî ewî hildida. Ew jî wan roja, gava dibû rojê carekê nan dixwarin, bi şeva ranedizan. Lê hingê ew nedîwestiya. Ewî hingê li ber her tiştî deyax dikir, li ber riya dirêj, li ber piştiyê giran, li ber birçîbûn û tîbûnê, li ber şevê bê xew û zivistana sar. Tu tiştî hingê zora wî nedibir. Lê germa başûrê, li ku ew salekê sirgûniyê bû, ew qels kir. Pêşiyê ew çend cara li ser hev bi tayê ket, paşê rûviyê wî êşîyan û ji mehekê zêdetir hema wisa vedireşıya, nava wî diçû. Mehêñ sirgûniyê paşin movikê hestiyê wî êşîyan û di pey vegerandina malê êşa rûviya û ta derbaz bûn, êşa movika ma.

Ü niha, gava Serdar dabû ber kendêl, mîna birîneke ku xwey têkî ser, dîsa şewat ketibû movikan.

Vê zûla erdê ewî havîna derbazbûyi kirî. Lê tenê navê wî erd bû. Berpala çiyê, tijî kevir, kuçik, ker biketayê dê diranê wî bişkesta. Heynese cîkî wisa, wekî tenê gûnî û gongil lê şîn dibûn, ew jî di nava keviran re. Tu cara, ne gîsnê cot, ne jî devê merê bi wî erdî neketibûn. Ew çi bikira, diravê paşxistî ancax têra erdê wisa kirin. Lê çawa jî hebiya dîsa ax bû, dîsa berbîn bû.

Ü Serdar heşt meha bi axê re kete şer, ewî berî gişkî axê ji striya paqîj kir, kevirên ser erdê berev kirin, paşê bi kulinga kevir jî nav axê derxistin. Kevirên mezin bi çakûça dişkêndin, dikirine xurcê, xurc davête ser milê xwe û ew kevir dibirin, li dora zeviya xwe dikirine sûr, wekî pez dewarê xelkê nekevê. Zeviya Serdar pey derxistina keviran re bû mîna erdê bombakirî û ewî bi sepeta xwelî anî, ew çalekort tijî kirin. Heta zivistanê jî ewî bi bêran berf dida alîkî û ji axa tevizî kevir derxistin. Ü bi vî teherî heşt mehan.

Li ber kendalekî telyayî Serdar texmîn kir, wekî tavê navmila wî germ kir. Ewî hizingek da xwe, xwe hebekî raçivand wisa rûnişt, wekî tav bide pişta wî gişkî.

Xweş bû. Tîrêjîn tavê tê bêjî hêdî-hêdî ba û serma ji nav canê wî derxistin û ciyê wan digirt. Demekê şûnda Serdar kolozê xwe êxist danî ser kevirekî, zivirî ser pişte û singê xwe da ber tavê. Vê siba biharê ji van tîrêjîn tavê xweştir tiştek tune bû. Refê reşelan, dûmequeskan û çivîkên firo jî li erdê wî danîbûn û ji nav xweliyê kurm berev dikirin.

Roj gelekî bilind bû . Serdar dixwast rabe, lê tîrêjan mîna mîxan germê yên mezin ew bi kendêl va mîx kiribûn û nedîhiştin ji cî bilibite. Lê Serdar rabû, çû mer û

kulingê di qûçê da veşartî anîn, bi devê merê hin şelê mezin şikenandin, hin kevrên hûr ên ber destê xwe berev kirin û careke dinê rûniştî. Di cî da, rûniştî, bi kulma xwe hinek xwelfî hilda, di destê xwe da guvaşt û dîsa berda. Xweliyê hev berda, wisan e îdî dema çandiniyê bû.

☆☆

Ü niha, gava ew ketibû cî, ji dew û nanê cehê xwarî qure-qura zikê wî bû, movikên pişa wî ji eşê hev berdidan, ewî ew gişk texmîn nedikir. Wê sibê axa xwe biçine ! Wê berbangê zû rabe, cehê xwe bibe bireşîne, tîrmix ke, paşê çalê ji bo darê fêkiyan kolayî bijmîre û peyayî nav gund be wekî dara peyda ke. Sêv, hirmê û xoxêñ berpalêñ van çiya di temamiya welêt da kifş bûn û eger ew dar ber bigrin, bawer bikî wê bikaribe zmîrê zivistanê bi firotana fêkiyan bikire. Serdar bawer dikir, wekî viya sala nangiraniyê ya paşîn e ji bo mala wî ; wekî payîzê wê çandiniyâ axa xwe berev ke û sala bê rojê sê caran nan wê bê ser sıfıra wî. Hêviya Serdar li jor mabû li Xwedê, li jêr li vê bihusta axê.

☆☆

Serdar ji 65 salî derbas bûbû. Xata jina wî jê re sêzde zik zarû anîbûn. Lê zarû anîn hê hindik e ; gerekê bikaribî wan zarokan xwedî kî, mezin kî. Li dinê hê şer-ceng hene, birç'bûn û xelayî hene, li dinê hê nexweşî hene û li serê wî çiyayî bê doxtor û derman, rokê têr, yekê birçî, bi tañî tengiya wanana ra li hev hat tenê sê zariyan mezin kin. Ü ewana dîsa ji Xwedê gazin nînbûn.

Zariya wan a nûxurî Fatê bû. Fatê di 16 saliyê de dane mîr. Du sala şûn de, gava îdî dergûş li ber milan bû, di gund de mîr hate kuştin, dijminayî kete gund û mala xezûrê Fatê barkir çû wî berî sînor, çûne Makûyê, nava pismamîn xwe. Çend salêñ pêşîn hatin-çûyîn hebû, lê eva îdî panzde sal bû tu behs ji wê tune bû.

Milkê Serdar tune bû. Li vî gundê nava çiya de, ji bajar û riya dûr, ku ne lingê tiyan lêdiket, ne jî yê birçîyan, ewî ebûra zariyên xwe bi xebata milê xwe dikir. Sal donzde mehê rezê Hecî Hesen xwedî dikir û bi vî teherî heba nan tanî nav zariyên xwe. Lê gava kurê wî yê mezin Silêman zewicî û zar jê re bû, qazanca Serdar îdî têra neferê malê nedikir. Silêman di gund de kar nedît, mecbûr bû here bajêr û piştî çend mehan gava îdî kete ser kar, cîwer bû, hat jin û zarê xwe jî birin. Barê bavê jî hebekî sivik bû. Herke hebe şekir biya, çay biya, an jî kincek biya, çawa jî hebiya Silêman destevala bi ser bavê de nedihat.

Lê zûtirkê jina wî Eyşê tevî kurê xwe vege riyan Gund û gotin ku Silêman çûye gihîştiye pêşmergan. Pey 11ê adarê da ew carna dihate gund, çend rojan li malê dima, alî bavê dikir.

Di destpêka sala 1974a bi sipartineke girîng ewî dişînin bajêr. Dema vegerandinê ew dikeve destê caşan û wî gule dikin.

Birê Silêman î çûk, Dilşad, ku îdî bavê du zariyan bû, guh neda lavayiyê dê û hema ji şîna birê tiving avête stûyê xwe û hilkişıya çiyê. Dema şkestina şoreşê, di adara sala 1975a de ew derbasî Iranê bû û ji wî îdî tu behs negihîştine wana. Carekê gilî ketibû guhê dê ku Dilşad li ser sînorê hatiye kuştin. Di malê de bû şîn û girî, bav pey enena ket, lê kesekî gilîkî rast neda destê wî. Ü kur bû xema şevê bê xew, bû daxeke şewat li dilê Serdar.

Lê rojekî leşker hatine gund, gazî Serdar kirin, birine qereqolê. heta sibe ronî bû lêdidan, dizêrandin, pirsa kurê jê dikirin. Ü Serdar bi devûdiranên xwînî lavayiya wan dikir :

- Ez benî, axir ez nizanim Dilşad li ku ye, eva ji du sala zêdetir e ku ez tu tişti derheqa wî de nizanim . Xwezî min bizanibiya niha sax e, rûbarê dinê ye, bila Xwedê hema wê demê ruhê min bistenda.

Lê leşkerekî kin î qalin î bî lêvî fistiqî, ku bîriyê wî yê reşê dirêj hatibûn li hev qelibûn, tê bêjî dixwast heyfa vê eblûbûna xwe bi lêdanê hilde. Bi qamçîkî rêzîn bê rawestan li Serdar dixist û pê re jî digot :

- Keftar, ezê wan hersê qîlê te jî bikişînim di nîtka te de bikutim, hingê tê ka ser de bi xwe me bibî bal wî, yan ji te tirê tê bi dek û dolaban me bixapînî. Qey bêjî em hay ji wî emrê te yî gemarî tune ne.

Ü wisa heta Serdar ji xwe ve diçû. Paşê ava sar lê dikirin û dîsa lêdidan. Evan lêdana bi dilê Serdar bûn, wana şabûneke geş dikire dilê wî ; «ne axir Dilşad sax e, wekî sax nebûya van kûçkana wê çira ha har bûna». Ji Serdar pê ve zêdetir îdî tu tişt vê demê ji Xwedê nedixwast.

Gewrayî ketibû sibê, gava zabitekî zirav î bejinbilind kete hundur. Ji çavê wî yê werimî dihate xwanê, ku hê ji xewê rabûye û têr raneyaze. Ewî bi destan leşkerê kinik da sekinandinê û di bin pozê xwe da kire mirte-mirt :

- Tişt nabe, zûtirkê emê laşê kurê wî bidinê, wê hingê cîyê wî baş zanibe. Leşkerê kin î qalind, bêjî dilê xwe qamçî wê da avêt, bi hêrs Serdar ber bi derî kişand, bi pihîna tevda derva û di nava dirana got :

- Here kelbo, tu vê carê hêsa ji destê min filitî, lê wisa bike careke dinê nekevî destê min.

Serdar xwast xwe li ser piya bigre, lê ji wî re li hev nehat, ew hebekî şewişi û mîna simla dirûtî jor de nixilî. Ewî hew çavê xwe vekir, di mal de ne û gundi li dorê top bûne. Li ser lêvî wî yê werimî xwîn bûbû wekî cegér, beşeriye sar çîrûsî û ewî bi dengê ew qas hêdî, ku meriva bêjî libata lêva ewê tiştek jê fehm nekira, got :

- Dilşad sax e.



Bûka Serdarê mezin, Eyşê, herdû keziyê xwe yê zer jêkirin dane ser meytê mîrê xwe û xwast here bigihîje pêşmerga, lê xesiyê û jintiyê nehîştin. Lê yeke, pey kuştina mîr re dilê wê hêsa nedibû, tebatî nediketê û zûtirkê ew bi ciyê binka (qışla) pêşmergan hesiya û bû qasida wan. Rûn, çay, tütin, birinc û tiştên mayînê, ku gundiya danîne mala wan, ewê êvarê dereng, dizî ve digîhande binkê.

Wê payîzê berf zû ket. Eskerê ku mîna kûçkê bînê, îdî çend meh bûn ji sibê heta êvarê gund serobinî hev dikirin, wekî bizanibin, kê qasidiya pêşmergan dike, li pey rîça wê çûn û ew girtin. Girtina Eyşê dilê wana şâ kir. Ew bawer bûn, ku bi çend derbê zexm, wê dest xwe da zimanê jina canik vekin û tiştê eva çend meh bûn nikaribûn pê bihesyana, wê hêsa bizanibin.

Lê Eyşê tiştek negot. Tê bêjî ji zar-ziman ketibû. Na, ewê ne ku xwe li lalîtiyê danîbû, ne ku dixwast xwe bi teherékî ji destê wana bifilitîne, lê rastî bi xwe nizanibû ci bêje. Helbet ewê ciyê binkê nebêje, lê di dewsa rastiyê de gere ci bêje, ci bersîva wana bide, ewê bi xwe nizanibû. Lewma jî çila bûbû û tu deng jê dernediket. Vê kerbûna wê leşker lap har dikirin.

Pir lêdan. Pêşiyê bi qamçıya lêdan, paşê bi pihîna, bi qundaxa tivingan, lê xeyn ji nalînêni fetisandî, wana tu tişt ji devê Eyşê nebihîst. Paşê ew dane ber sînga hespa û berê xwe dane gund. Gava îdî ranêzîkayî gund kirin, zabitê ku li pêşiyê dicû, ji hespê xwe peya bû, dizgîna hespê da destê leşkerekî, çû ber Eyşê sekînî, herdû destê xwe qure-qure dane ser navkêlka xwe û got :

- Binhêr, em îdî dikevine nav gund, (ewî bi destê xwe yî çepê gund nîşan kir). Ez cara paşîn bi namûsî ji te re dibêjim, herke tê ji min re ciyê binkê bêjî, bêje û tê hema li vêderê aza bî û herî mala xwe, yan nebêjî, ezê yeke wisa bînime serê te, ku te ne dîtiye, ne jî bihîstiye. Lê nefikirî ku ezê te bikujim, li ber kirina min, kuştin def-dawet e.

Lê ev gilyana tê bêjî nedigîhiştine guhê Eyşê, ew zûr bûbû, li cîkî pêşiya xwe dinihêrî.

- De baş ! (Zabit bi gotina xwe re pihîneke zexm da hêta wê), ezê niha zimanê te vekim, (û zivirî ser leşkeran),

- Kinca jê bişiqitînin, (bi xwe jî paş de çû ser kevirekî rûnişt, pakêt ji beriya xwe derxist û cixarekê vêxist).

Eyşê tê bêjî nişkê va ji xewê hişyar kirin, vecêniqî, bû kûrîniya wê :

- Na ! (Û mîna dîna li dora xwe nihêrî.)

Lê şurtiya îdî kinc jê dişiqitandin.

Jina terecan mîna gureke har ber xwe dida, nedîhişt dest bidinê, ew tev didan, pencirûk dikirin, dest û milê wan digeztin. Lê ci feyde, kincê wê gişk

zîtl-zîtol kirin, jor de anîne xwarê. Eyşê di cîda qincilî, xwast xwe sitar ke, lê sitar nebû û zariya :

- Ax li min bênamûsê !

Paşê leşkerek herdu destê wê girêdan, serê şirîtê avêtine zînê hespekê û bi rêketin. Li ser canê Eyşê berfa qerqaşî, şiverêd reş di dewsa derba dihatine xuyanê, porê gjikbûyî ketibû ser çavan. Wisa di nava gund re anîne mala wan. Di rê de Eyşê çend cara dixeriqî, leşkera bi ava sar hişê wê danîne serî, hey jî wisa pey hespê re kirkaş dibirin, heta gihadine mala wan. Eyşê çawa çav bi kurê xwe ket dîsa ji xwe ve çû, dîsa av bi ser de kirin, dîsa dest bi pirsa kirin, dîsa dest bi lêdanê kirin. Lê Eyşê îdî tu tişt nedibihîst.

Demek hat, tê bêjî leşker jî tê gihiştin, wekî lêdan bêfeyde ye, an jî dibe ku bi xwe westiyan û rûniştin, cixarê vêxistin.

Lê celat ji betaliyê hiz nakin, gava celat betal dibin, cezayê hê zor disêwirînin. Gava leşkera cixarêñ xwe kişandin, rabûn, xesî û nevî ve bi stûnê ve girêdan û pêşiyê zabit, pey da jî hersê leşker çûne bal bûkê.

Paşê leşker tevî çend çêlekên gundiyan wisa jî çêleka wana tenê birin. Wana digot, wekî çêleka dibin, jî bona îdî gundî nikaribin rûn, penêrê wan ji pêşmergan re bibin. Wana wisa jî ji malê gundiya gelek tûtin, rûn û çay berev kirin.

Di pey çûyîna leşkeran de gundî hatin Xatê û nevî vekirin.

Xesî û bûk, mîna merivê nenas heryekê bi alîkî de çûn. Herduyan jî nikaribûn li çavê hevdu binhêriya, tê bêjî ji bo herduya tevayî ser vê dinê cî nemabû. Bû kûrîniya Azad, xwe avêt pêşîra dê. Eyşê pêşiyê serê wî bi bedena xwe ve guvaşt û paç kir, paşê bi herdû destâ serê wî girt, hebekî dûrî xwe xist û dûr bû lê nihêrî. Ji meriya tirê dixwaze nas bike, an jî tiştekî têke bîra xwe. Çavê wê zoq mezin bûbûn û bê jîn li kurê xwe dinihêrî. Merivê li dorê nizanibûn ew ci dixwaze, nizanibûn bi xwe ci bikin. Paşê ewê hêdîka kur ji xwe dûr xist, hizing da xwe rabû, şewişi, lê xwe girt û hêdî-hêdî ber bi tendûrê çû. Bista ber tendûrê hilda, serê wê yî tûj da ser kevçika dilê xwe û xwe bi ser de avêt.

Xatê pişa xwe dabû stêr, destê xwe tevver kiribû û lê dinihêrî. Cînarê berevbûyî kesek ji cîyê xwe nelebitî, kesî necêriband wê bidine sekinandinê, tenê bûkeke canik kurê wê hemêz kir, serê wî bi sîngê xwe ve guvaşt û bû îske-îska wê.

Kesekî ji bo Eyşê jîn nedixwast, ji bo wê îdî li ser vê topa dinyayê cî nemabû. Paşê jineke pîr carcimek anî avête ser meyîtê Eyşê û çavê wê girtin.

Pey mirina bûka mezin û birîna çêlekê re rewşa wana hê xirab bû, devê wana lap ziha bû. Berê dîsa çawa hebûya, herdu bûka tevayî dicûn malê xelqê zibaretî dikirin, qene nanê rojê danîn û teví şîrê çêlekê abûra xwe dikirin. Pey bênamûsî û mirina Eşê, Xatê nedixwast bûka xwe yê tere-can bi tenê bişîne malê. Ewê digot : «Eva bênamûsiya heta-hetê besî me û heftê heft bavê me ye. Hê baş dibe em gişk bi ser hev li ser hev ji birçîna bimrin».

Ü wisa roj bi roj arvanê wan kêm bû, roj bi roj şikeva wana vala bû û rojekê jî bûkê tap nekir, zariya :

- Dayê, tu çira dengê xwe nakî ? Bes e, ez îdî nikarim bibinim çawa zarê min ber çavê min ji birçîna roj bi roj ditemirin. Were em vî welatê wêranbihêlin herin, vî welatê kambax de kes nemaye meriv here ber derê wan pars jî bike !

Xatê pêşiyê dengê xwe nekir. Paşê ji kîsikê xwe kaxez û titûn derxist, cixara xwe pêça, vêxist, qulapek dudu danê, çavê xwe kutane çavê bûkê, bi hênsira ve tijî û got :

- Lê ezê vî goristanî li hêviya kî bihêlim.

Roja dinê, hê gewrayî neketibû sibê, bûkê herdu zarê xwe ji xewê hişyar kirin, kincê wana lêkirin û her sêka da ser riya bajêr. Ewê ji malê tu tişt hilneda. Xesiya, ku temamiya şevê xew neketibû çava, xwe razayî avêt û wisan jî wa xatirê xwe ji hev nexwest.

Gava îdî bûkê derî li pey xwe girt, ew bi tena kiras rabû, çû çok da ser bermalê, herdû destêñ xwe ber bi esmên bilind kirin û bû zarîniya wê:

- Ya Xwedê, seva kîjan guna tu ewha tînî serê min, ya Xwedê te mala min şewitand, kaf-kûn kir, qene li wan her du zarokê biçûk were rehmê, hêviya me ji erd û esman hate birînê, tenê tu mayî, yekî jorînî bê heval, tu bibe piştevanê wan her du biçûka, tu î cara, tu î dermanê hemû derda.



Hema wan roja, Serdar ji sirgûnê vegeviya. Mala viqî vala. Xatê heta nivînê şevê, heta derdanê malê jî firotibûn, dabû bi kerîyê nan, ku neviyê xwe yî bê dê û bav mayî ji devê mirinê bifilitîne.

Serdar hebek arvan anî malê, quî-bûcaxê di arîkê de vebûyî girtin, du bizin û zûlek erd kirî.

Ü niha, gava Serdar di nav çiyan de difikirî, wekî wê sibê çandiniya xwe bike, şabûnek ketibû dilê wî. Ew gelek şevê bê xew li hêviya vê rojê bû. Mîna xewnerojka, ew hebekê erdê di nav kevir û kuçikan de, rezê kulîlkdayî dihate ber çavê wî. Nava van mitalan de ew hê ji xew re neçûbû, gava li derî xistin.

Xatê, ku ber çirê kincê neviyê xwe pîne dikirin, li mîrê xwe nihêrî. Eva îdî salekê zêdetir bî kesî derê wan venedikir, kesî li deriyê wan nedixist, ew jî awa bêwext.

- Rabe binihêr kî ye. (Serdar di nav cî de rûnişt).
- Ew kî ye ? (Xatê bi dengekî nizim pirsî, çimkî neviyê wê dî xew re çûbû).
- Rêwî ne, metê, çika derî veke. (Ji derva dengê xordekî hat. Xatê dîsa li mîrê xwe nihêri).
- Veke, veke, (Serdar got û jî nav ciya rabû).

Salên ew li ciya pêşmerge bû, hîn bûbû tevî kinca razê û ew yek, ji wî re bû xeyset, niha jî tevî kinca ve radize, tenê heftê carekê kincê xwe seba şûştinê derdixe.

Xatê derî vekir. Li ber şêmîkê du mîrên tifing di milan de sekinibûn. Ewana ketibûne bin milê xordekî. Serê xort bi laçikeke spî pêçayibû. Fêza çavê çepê xûnê di laçikê re dabû der. Ji rengê wî yê spîçolkî dihate xuyanê, gelek xûn jê çûye.

- Kerem kin, kerem kin werine hundur,(Xatê got û ha hanga qoncek danî ber sitûnê).
- Êvara we bi xêr ! (mêrekî bi baqê simêlê qalin, ku îdî têlê sipî ketibûnê, ber poz got).

Ew hatin hundur û xortê birîndar li ser qonc dane rûnişstandinê. Xort xwe sparte stûnê, çavê xwe girt û av xwast. Xatê şerbikek av jê re anî û bi destê xwe dayê. Lîvê xortê çila dilerizîn. Gava ewî xwast bi destê xwe şerbik bigre û destê wî bi destê Xatê ket, ewê texmîn kir, wekî destê xort ji germa dişewitin.

- Ser çavan re hatine, keremkin hûn jî rûnên, (Serdar gote herduyê sekînî).
- Na mamo, Xwedê bi siheta te re be, em rûnanên, em bi lez in, (vê carê xort got) tenê ricak me heye, birîna hevalê me giran e, em nikarin wî bi xwe re bibin. Wê ci bibe, tu ewî di mala mala xwe de xwey kî, sitar kî, heke me îşev hesp bi dest xistin, emê îşev bêne pey, lê heke me hesp bi dest nexistin, şeva bê emê ese bêne bibin.

Serdar dengê xwe nekir, zûr bûbû li neviyê xwe dinihêrî, ku ji denga hişyar bûyî, di nav cî da rûniştî çavê xwe mîzdidan û dixwast bizanbûya ci dibe. Evê bêdengiya Serdar dirêj kişand. Xatê demekê serê xwe kiribû ber xwe nizanibû ci bike, paşê tevhîbûyî li mîrê xwe nihêrî, xortê birîndar nihêrî û xwast vê bêdengiya giran bibire.

- Ew ci bû ? lawo, (Xatê got). Hê tu mîvan, bêqedir ji vê malê neçûbûn.

Lê gava çavê wê rastî bi çavê mérê wê hatin û ji wê re li hev nehat bizanibe gelo wan çavan de hêrs e, eynat e, êş e yanê çi ye, ewê dengê xwe birî,gilî li devê wê da nivîşkan ma.

- Na ! (Mîna dengê birûskê yî ji dûr hatî, Serdar dengê xwe di bedena xwe de fetisand,) mala min de nabe.
- Lê emê vê şevê ku de bibin, mamo ?
- Ax waye, gundî li biniya me ne, çi ye, dibêy qey li vira tenê mala min e, bibine maleke gund a dinê.
- Mamo, axir gund hin gelekî dûr e em naxwazin paş de vegerin, hin jî li wê mal li ser hev in, tu were behs belabe û giî bigihîje leşkeran. (Xort xwast ecêbmayina xwe veşêre.)
- Na, mala min nabe, (Serdar giî di devê wî de birî), herin ku de dixwazin herin rê li ber we ye, dibêy qey li vî welatî de tenê mala min e, hûn çi ji min dixwazin, herin, jî mala min derkevin, xeta xwe jî mala min dûrxin, (Serdar, wisa zû-zû peyhev got, tu bêjî qey ditirsiya da nikaribe gotinê xwe gişka bêje.)
- Erê, baş dibêjî, (pêşmergê xortî ku simbêlê wî teze xû dabû got), em xwe dane mala te, erê tu rast dibêjî, qey em ji bo beriya xwe xûna xwe dirêjin, lê çawa.
- Herin, herin, ez nizanim hûn jî bo kê xwînê dirêjin, ez nizanim min ji bo kê xwîn rêt, lê bes e, seba min xwîn nerêjin, bes e, me îdî têra heftê bavê xwe xwîn rêteye.
- Hêrsa xwe ranake, mamo,(pêşmergê bi salan mezin got), tişt nabe, em ewqas jî acizayê nadine te, emê va herin, (di dengê wî de hêrsa fetisandî dihate texmînkirinê. Paşê vege riya ser hevalê xwe), de rabin, rabin, eglebûn ji me re dest nade, em gere xwe bilezînin, wekî qena heta sibe li me ronî be em xwe bigihînine mêsê, yanê nav van berpalê reqe rût sibe li me ronî be, em ji dest leşkeran nafiltin.
- Bisekinin, lalawo, ezê va çayê deynim ser, hûn kesirî ne, hebekî bîna xwe bistînin, paşê hûnê dîsa herin. (Xatê, ku ewqas wext şaş metel mayî li wan dînihêrî, tê hêja bi ser hişê xwe de hat).
- Na, metê, em bi lezin, (îdî ser şêmîkê yekî bersiva Xatê da).

Pêşmergê birîndar, bi şev nîvê şevê, tî-birçî ji mala xwe derxistin.
Tirsîya ?

Ewî gelek cara bi çavê mirinê nihêrîbû û tu cara berê xwe jê neguhastibû.
Lê vê carê tirsîya. Vê carê seba neviyê xwe yî tayê bi tenê tirsîya. Niha jî seba wî vê dinya rengîn bi tenê nevî bû. Nevî bû xema dilê wî, ew bû hêviya

wî yê paşîn. Ü ewî nedixwast duyê ocaxa wî bê birînê, nedixwast konê rengînî niha ser stûnekê mayî jor da bê xwarê.

Serdar bi xwe tayê bi tenê bû. Ewî derdê tenêbûnê dîtibû û nedixwast zârên wî tenê bimînin. Bi cor cefa, bi talî tengiyê sê zariyan mezin kirin, qîz da mîr kur zewicandin, nevî jê re bûn. Lê niha dîsa ew e û neviyê biçûk î tayê bi tenê. Ew hê di nava van mitala de bû gava dîsa li derî xistin.

- Ew kî ye ? (Kalê metelmayî pirsî û di bîra wî de di nava çend deqîqa de hezar û yek tişt derbaz bûn). Cara dudiwa bi qundaxa tivingê qewîn li derî xistin.
- Ew kî ye ? (Kalî dîsa pirsî û ji ciyê xwe rabû).
- Leşker in, zû veke, (ji wî aliyê derî deng hat û dîsa ser hev li derî xistin).
- Ava, niha vedikim, (Serdar bi lez bi ber derî çû û di tariyê de likumî). Ewî zerze ancax vekiribû, gava leşkeran derî wisa tev de, ku Serdar paşopêş çû û ancax xwe bi stûnê girt.
- Pêşmerge li ku ne ? (Yekî bi fenera destê xwe nav malê kire ronayı). Xatê serê nevî bi singê xwe ve guvaştibû û bi çavê tirsiyayî li leşkera dînihîrî.
- Çiya te re nîn im, (yekî xwast bi qundaxa tivingê li serê Serdar xe, lê paşê di nîvî de poşman bû û tivingê hêdîka danî). Serdar, ku bê hemdê xwe destê xwe bilind kiribû wekî xwe xweyîke, zarî bû.
- Pêşmergê çi, maqûl, di mala min de pêşmerge tune ne.
- A gişk wisanîn, gava dikevine destê me haj bayê dinê tune ne, dibine teyrikê buhuştê, lê hema fersend dikevê, dibine gurê har, (û dîsa vege riya Serdar û ji nivşkeva pihînek da kîlekê.) Serdar kîleka xwe girt û mîna dîwarekî ji erdê jînê bîhîşe, jor de hate xwarê.
- Bê şeref, yekî idî gotine me, wekî pêşmerge bi vê rê de çûne, ew bifirine ber perê esmana jî ji destê me naflitin, baş dibe tu zû bêjî hela hê ew rihê teyî gemar di nava laşê te yî genî de ye. Gunê te bi te nayê, bira bi neferê te bê, tu bi xwe jî baş zanî ev koxika te xurê narincökekê ye.
- Destê we ye ez çi bêjim. Ez im ev koxik e, yek jî wê kîlekê mereka viqî-vala, dibêy qey şaneşînê min hene, wekî min pêşmerge tê de veşartine.

Leşkera idî mal gişk serobinî hev kirin, dû re jî ji wana tivingê xwe ji stuyê xwe anîne xwarê û ber bi merekê çûn.

- Keftar, yekî tevî wana birîndar heye û ew nikarin dûr herin, çawa jî hebe gere te ew dîtibin.

- Ezê li ku wan bibînim, çawa tarî dikeve erdê ez idî ji mal dernayêm, çavê min jî idî nabînin.

Leşker tu tişt nedîtin û hatin ber zabitê xwe sekinîn.

- Saet idî çar e, em îşev jî ranezan, (leşkerekî xort got).
- Tişt nabe, va sibe ronî dibe. Yek, ew di vî destî de nin, (ewî kefa destê xwe yê rastê nîşan kir), ez van ciya baş zanim. Wê ku de herin. Ger li tu ciya egle nebin, niha idî peyayî deştê bûne, eger egle jî bibin, niha li berpala ciyê ne. Heke niha saet çar e, emê berbangê re bigihîjine serê ciyê û li wê her tişt wek li ser kefa destê merya wisa tê xwanê.

«Rastî jî ev kûçkê devxwîn van ciya baş zane, -Serdar fikirî-, eger evana niha bi rêkevin, wê xwe bi pêşmerga bigihînin.»

- Lo kê zane pêşmerge di ci rê de çûne, hûnê vê şevê ci bidine ser rê. Ne ev jî mal e, ava ye. We îşev derê me vekiriye, qe nanekî, avekê, de ci heye. Serê vî ciyayî mîvanê mînanî we tu her roj derê meriya vedikim ? Kerema xwe rûnên, ezê ji we re du mirîşkan şerjîkim, hema bi sivikayî parî nan bixun, heta sibe jî ronî dibe, paşê rê li ber we, Xwedê li ser we.
- Ax ! Kelbo, ew tu çawa wisa merd bûyi, ne min ji te re got ez van ciya û merivê vir baş nas dikim. Ji te tirê ez nizanim, wekî niha ji destêbihata te yê em her şes bînekêra bışandana wê dinê. (Ewî gilyê paşin nava dirana re gotin). Heke rastî wisa merd i, emê di vegerandinê de bêne mîvaniya te, (ewî got û ji malê derket).

Serdar pey wan derket, demekê li ber derî sekinî li wan nihêrî û vege riya malê. Serê wî bûbû gêjgerînga fikra. Mîna girtiyê li hebsa teng de, ewana cî nedidane hev. Lê fikrekî li mejûyê wî de nik bibû û yê din gişk li dora wê diçûn dihatin.

Leşkera saeteke şûn de dê xwe bigihînine gêdükê, paşê li berpalê rût in, binatarê jî hemî deşta rast e. Wisan e ku pêşmerge li tu ciya nikarin xwe veşîrin. Helbet ewana hay ji van leşkeran tune bûn, yanê na wê çawa bixwastana birîndarê xwe di mala wî de bihêlin. Mala serê rê ya tekûtenê, cîkî wisa, wekî qet tu şik tune be jî, leşker dikarin hema seba kasek av jî derê mala wî vekin. Paşê jî eger ewana hay ji leşkera hebûna, wê çawa jî hebiya bigotana.

Wisan e filitandina pêşmerga tenê dikaribû qelaçiya gêdükê be. Eger ewana pêş de hay ji leşkera hebûna û di qelaçiyê de hêviya wana bûna, şes na bîst û şes leşker jî bihatana, bi wana nikaribûn. Xudanê vê qelaçiyê, siltanê vê riyê ye. Her tişt di ber lûla tivinga wî de derbaz dibe. Lê ew nasekinin û degme ji destê leşkeran bifilitin.

Serdar aniya xwe ya xwêdayî mizda.

Lê wekî ew bibe xudanê qelaçiyê. Ne axir van gelî-gêdûka, deşt newala kesek mîna wî nizane, ne axir gelek cara ewî li wê qelaçiyê şer kiriye û hê tu cara ji dijminan re li hev nehatiye ewî ji wê qelaçiyê derxin.

Tekinga "Birno" tevî sed fişekî di keloşkê de veşartibû.

Leşker çiqas jî bi lez herin, ji saet û nîvekê zûtir nikarin xwe bi gêdûkê bigihînin. Lê di şiverêya binê newalê va, ku ewî mîna pênc pêçiyê xwe zanibû, dikaribû lap pir, cil deqeyî de bigihîje qelaçiyê.

Lê paşê...

Ü seba «paşê» neyê, ne be hasêgeh li pêşıya niha, ewî benikê sola xwe girêdan, potê xwe yî ji stûnê dardakirî avête ser milê xwe û ji malê derket.

Xatê, neviya êdî di xew re çûyî nixamt û da pey mîr, li ber şêmîkê sekînî. Ewê dît çawa Serdar bi lez ber bi keloşkê ve çû. Ü her tişt ji wê re ronî bû. Ewê turiş nekir pêş de here, destê xwe tev werkir û dûr ve li mîrê xwe nihêrî. Xatê baş zanibû ku vê demê gîlî-gotin êdî erzan in, vê demê tu tişt nikare qirara Serdar biguhêze, tu kes nikare wî bide sekinandinê.

Destê wê dîsa ji erd û esman qetiyan.

Gava reşê Serdar di nava tariya berbangê de bîşkîfî, Xatê vege riya koxikê û bû xule-xula hêsi ra ji nav îske-îska fetisandî de kişiyan.

Ya Yezdanê mezin, tu ci ji me dixwazî, kurê te bimre, tu ji xwîna me têr nebûyî ?

Demeke dirêj di nava bêdengiya berbangê de tenê îske-îska Xatê dihat. Pşaê ji aliyê gêdûkê bû xurmîniya gullan. Xatê ha-hanga derkete derva.

Dengê çend gulla jî hat. Paşê her tişt kerr bû.

Sibe îdî ronî dibû...

ENWERÊ MAYÎ Û BERHEMÊN WÎ

Dildar BERWARI

Di kovara Hêvî, hejmara 3 an de, min gotareke Dr. Rehber Rêzan xwend ku li ser nivîskar û diroknîvîs Enwer Mayî û berhemên wî bû. Bi rastî gotara Dr. Rehberî cihê nirxandin û spasiyê ye. Çunkû hêsta kesî mafê Enwerê Mayî ji xwendin, lêgerîn û vekolînê nedayê. Lewra gelek aliyên jiyana wî nependî mane.

Dr. Rehber di navkirina berhemên Enwer Mayî de, para bêtir li ser Ronahî palpiş (îstînah) kiriye. Mixabin ku piraniya van berhemên hêja, ên ku Ronahî û Hawarê navkirine, wenda bûne an jî ji ber serûberê Kurdistanê yê aloz, hatine sotin.

Di vê gotarê de, dixwazim bêtir ronahiyê bixim ser jiyana şehîdê toreya kurdî Enwerê Mayî.

Navê wî Enwer, kurê şêx Mehemed Tahirê kurê mela Ebdulrehman, kurê mela Taha, kurê mela Mehemed, kurê mela Omer, kurê mela Îbrahîm, kurê mela Îmadeddin, kurê Xan Avdel, kurê Del'î ye. Del bi xwe jî gundê Elkê-Beytuşbabê ye, li devera Hekarî li Kurdistanâ bakur. Bi qinêta (silsile) xwe jî digehe hoza Mukriyan a bi navûdeng li Kurdistanâ rohelat (îranê).¹

Enwer Mayî sala 1913 an li gundê Mayê, li devera Berwarî, bakurê bajarê Amêdiyê, li Kurdistanâ başûr (Iraqê) ji dayik bû. Li jiyê (emrê) du saliyê bavê wî mir û diya wî ew xwedî kir ta ku jiyê wî bûye şes sal. Paşê wî şandiye bajarê Bamernê cem pismamê wî da ku li gel feqî û mirîdên şêx Behadînê Neqşebendî zanînê wergire. Enwer, ta ku Îngilîz Iraqê dagîr (zeft) kirin li Bamernê ma. Ancax di pey vê de Enwer çû Kurdistanâ bakur û heyamekê li wir ma, ta ku serûberê welatî aram bû, bi şûn de vege riya welat. Rêza (sinifa) şesan a destpêkî li dibistanê qedand, lê ji ber serûberên jiyana xwe yên aloz nema dikarî zêdetir bixwîne. Lewma vege riya tekiyan û li navbera bajarê Zaxo, Duhok û Amadiyê geriya. Dema birayê wî Kemaleddin hate kuştin, ji bona diya xwe xwedî bike naçar bû zivirî Mayê. Mela Enwer bû îmamê gundê Mayê. Lê nikaribû li wir bimîne, ji ber bîrûbaweriyê wî yên şoreşgerî û hesta wî ya netewî, ïna gund bi cî hişt û serûbinê Kurdistanê geriya.² Di

¹ Min ev qinêta (silsile) Enwer Mayî ji rehmetî Elî Ubeydullah Mayîbihîstiye, roja 14.4.1980 li Kurdistanâ jêri (Iraqê)

² Binêre : Rojnama Iraq, Bexda 6.5.1978, gotarek li ser Enwer mayî, Dildar Berwari.

sala 1933 an de bû bîst salî û ji xwe re jin anî. Lê piştî salekê jina wî mir û di pey de keça wî mir. Ew digel pîredayika xwe bi tenê ma.

Enwer li ser dawîkirina xwendina xwe gelekî rikoyî bû, bi rastî jî li ser vê çendê baş dixebeitî. Di sala 1936 an de li ber destê Şukrî Efendî, miftiyê Amêdiyê, rîdana zanyarî (îcaza ilmê) wergirt. Di 17.12.1936 an de careke din jin anî³, di vî çaxî dê jî helbestên xwe yên vehandî, baş xwendin û dubare çak kîrin.

Di sala 1939 an de li gundê Şîrwan bû mamosta û salekê li wir ma, paşê bû karmendekî mîrî (resmî).

Ji ber tevgera sala 1945 an, biryara girtina wî derket, lê karî du salan xwe veşêre. Paşê hate girtin û kete zîndanê. Piştî berdana wî, dest bi nivîsandina babetên dîrokî kir û di 1952 an de bi navê "Dîroka Berwarî Bala" pirtûkek derxist. Lê paşê wî ev pirtûk berfirehtir û mezintir kir, navê wê guhart kire "Kurd li Behdînan"⁴. Ev pirtûk di 1960 an de li çapxana El-hîsan, li Mûsilê bi erebî hate çapkîrin. Ji bilî çend gotinên pêşîyan, çend helbest û êdî tiştekî wî yê neçapkîrî nema.⁵

Piştî şoreşa 14 Tîrmehê, sala 1958 an li Iraqê Enwer Mayî di rojnama "Rastî" de bû nivîsevan. Ev rojname li Mûsilê bi erebî-kurdî derdiket ; ta bîst û sê hejmara derket, paşîyê hat daxistin.

Enwer di yekîtiya torevanên (edîbên) Iraqê de endam bû. Sala 1959 an digel zihvanekê (heyeteke) iraqî çû seredana Çinê û li wir, li ser Kurdan bi navê "muhadere li ser Kurdan li Çinê" bi zimanê erebî gotarekê xwend. Ev gotar di sala 1959 an de li Bexdayê çap bû.

Di sala 1960 an de fermana girtina wî derket, xwestin wî ji welat dûr xin, lê ew karî ji destê dijminan bifilite.

Di 15.1.1961 an de hate girtin û wî şandin Kela Salih li başûrê Iraqê. Gelek tê neçû, ew ji wê derê revî û xwe gihad şoreşa Kurdistanê.

Enwer bi qaremanîti besdarî gelek şeran bû. Di 22.6.1963 an de şehîd bû û li gundê Eredîna, nêzîkî bajarê Bamernê wî spartin axa Kurdistanê, ku ew tim û tim evîndarê vê axa delal bû û li dawiyê bi xwîna xwe ya sor av da.

3 Rojnama Iraq, Bexda 27.5.1978, gotareke Me'sûm Enwer Mayî.

4 Binêr li Jêderâ 2

5 Binêr li Jêderâ 3

HEMÎDO Û AVÛKAT

Firat CEWERÎ

Hemîdo li deriyê daîra avûkat xist û kete hundir. Avûkat ji cihê xwe rabû, destê wî hejand û cih dayê. Dû re cigara xwe ya Marlboro ji çavîka masê derxist û dirêji wî kir :

- Kerem bike, cigarê bikişîne, got bi ken.

Hemîdo cigarek ji pakêtê kişand û vêxist. Piştî ku du-sê hulm li cigarê xist, ji avûkat pirsî :

- Ma gelo rewşa lêwik çawan bû ebûkat beg ? Ewê bi vê ifadê bê berdan an na ?

Avûkat destê xwe avêt simbêlê xwe, hûrik hûrik pê leyist û bersiva Hemîdo da.

- Min ji te re carekê soz daye camêr... Vê carê ewê bê berdan. Soza min soza mérän e !

Gava ku avûkat wilo got, Hemîdo ji cihê xwe rabû, ku destê wî maçî bike. Lê avûkat destê xwe kişand û nehişt :

- Ez rica dikim Hemîd, got, em birayên hev in.

Hemîdo dîsa li cihê xwe rûnişt.

- Wisa kêfa min tê, ebûkat beg. Ji kêfan ez nizanim bê çi bikim. Axx... ku di vê mehkêmê de Seydobihata berdan. Wele ez di van riyan de birim, ez di bin deyna de şewitîm.

Avûkat destmala xwe ya kaxizî ji bêrîka xwe derxist û pozê xwe pakij kir :

- Lê bazara ku me kiribû nabe, got. Divê ku tu pênc hezar lîrayên din jî bidî.

Hingê ew kêfa Hemîdo hemî lê bû kul û derd. Ji hêrsan û heyecanê lerizî û çavên wî weke du fîncanên qehwê vebûn. Kîsikê xwe yê titûnê ji bêrîka xwe derxist û bi lez cigarek pêça. Gava ku cigare dipêça, ji hêrsan tiliyên wî weke hêlkan dihejiyan û bi qasî cigarekê jî titûna wî rîjiya ser şalwarê wî. Ew cigare bi hestê xwe yê gazê vêxist û du hulmên kûr li ser hev li cigarê xist. Dû re kursiya xwe ber bi masa avûkat ve kişand.

- Me berê bazara xwe bî deh hezaran kiribû, lê te kir panzdeh û te soz da, te got, ku ezê lêwik bidime berdan. Lawik nehate berdan. Dû re te pênc hezarén din jî li min zêde kir û te got, ku çawa bibe, bila bibe ezê vê carê lêwik bidim berdan. Lê

dîsa lawik nehate berdan. Va niha tu pênc hezarên din jî li min zêde dikî. Ma ezê van peran ji ku bînim ebûkat beg ? Ezê herim xwe bavêjim kê û peran ji wan deyn bikim ? Ma tu kesên ku min pere ji wan nexwestibin mane ?..

Avûkat hebekî bi sert peyivî :

- Tu peran ji ku tînî bîne. Ger ku tu pênc hezar lîrayê din jî zêde nekî dibe ku lawik vê carê jî neyê berdan.

Lawê Hemîdo du pirtûkên kurdî pê re hatibûn girtin. Ji bo herdû pirtûkan qala heft sal ceza dibû. Hemîdo ji bo ku lawê xwe bide berdan, tiştên ku ji destên wî dihatin dikir. Mala wan tê li Diyarbekrê bû. Lê ew ji bo ifada kurê xwe ji heftê carekê diçû Edenê. Ji ber ku lawik li Edenê hatibû girtin û divabû ku ifada wî li Edenêbihata dayin. Avûkatê ku girtibû hertim li wî holê dikir. Her car digot "A ezê vê carê kurê te bidime berdan,, û carê pênc hezar lîra lê zêde dikir û lawik nedihate berdan.

Dibû ku jî berdana lêwik ne di destên avûkat de bû. Lê wî her dem Hemîdo dixapand û digot "Bi soz ezê lêwik bidime berdan,,. Cara pêşî bazara wan deh hezar lîra bû, lê dû re avûkat lê zêde kir û kire bist. Her carê ku lê zêde dikir digot "Ezê lêwik bidime berdan,,. Hemîdo jî ji bo berdana kurê xwe diçû xwe davêt nas û dostan, pere ji wan deyn dikir û tanî dida avûkat. Lê hêviya Hemîdo ya mezin di vê carê de bû. Gava ku vê carê jî avûkat behsa pênc hezar lîra kir, Hemîdo di dilê xwe de got "Weleh vê carê jî lawik nayê berdan,,. Pişti ku hebekî hizirî.

- Baş e, got bi dengekî nizim, ezê vê carê jî qebûl bikim. Lê ku lawik vê carê jî neyê berdan ?

Yaho min ji te re carekê soz daye. Soza min soza mîran e ! Ma qey tu ji min bawer nakî ?

Wexta Hemîdo bigota, te berê jî digot soza min soza mîran e, lê negot. Rabû ser xwe û jê pirsî :

- Ifada wî saet di ci de ye ?

Avûkat milê çakêtê xwe hebekî hilda jor û li saetê mîze kir.

- Ifada wî saet di sisîyan de dest pê dike, got. Saet niha deh e. Pişti pênc saetên din divê ku em li wir hazır bin.

Hemîdo xatir xwest û ji hundir derket.

Hemîdo yekî dirêj û zeyif bû. Emrê wî an cil hebû an tune bû. Lê porê wî giş spî bûbû. Ne bi tenî porê wî, her wisa simbêl û rûyê wî jî spî bûbûn. Ku ne ji lixwekirina wî ya Diyarbekrî biya, mirov dê bigota kalekî şêst salî ye.

Wî bi wî awayî serê xwe xiste ber xwe û bi dilkulî ber bi mala dostê xwe ve meşîya. gava ku gîhişt ber mala dostê xwe û kete hewşê, dostê wî digel jin û zariyên xwe li hewşê, li bin siya mîwê rûniştî bûn. Ku ew çav li Hemîdo ketin, hemîji cihê xwe rabûn û cih danê. Pişti ku Hemîdo rûnişt, jînikê berî mîrê xwe jê pirsî.

- Kekê Hemîdo, ma rewşa lêwik çilo bû gelo ?

Hemîdo herdu destên xwe ber bi hewa vekir :

- Ez li ber rehma Xwedê me.

Mêrik ji cihê xwe rabû û cihê xwe da Hemîdo.

- Hela tu cihê xwe xweş bike kekê Hemîd, got û li jina xwe zivirî : Keçê niha kekê Hemîdo birçî ye, hela tu malhaziriyeke jê re bîne.

Jinikê destê xwe dane erdê ku rabe ser xwe, Hemîdo nehişt.

- Na xwişka min, got, Tu li cihê xwe rûnî. Ez têr im.

- Ma tu çayekê jî venaxwî ?

Hemîdo destê xwe yê rastê danî ser sînga xwe, serê xwe tewand û got :

- Xwedê zêde bike. Welel dilê min naçe tu tiştî. Lê tenê riceke min jî we heye.

Mêrik bi pêş de hat.

- Estexfurula kekê Hemîd, got. Em birayê hev in. Tiştê ku tu dixwazî ser serê min û ser herdu çavên min. Lê tenê ku ji destê min bêt.

Hemîdo qederê deqîqekê fikirî.

- Welel pênc hezar lîra ji min re lazim e, got, dû re bi stûxwarî, ifada lêwik îro saet di sisiyan de ye. Wî bênamûsê ebûkat disa pênc hezar lîra li min zêde kir. Ku ez îro wan peran negîhînimê berdana lêwik tune ye. Qala heft sal ceza dibe.

Mêrik ji jina xwe nepîrsî, ku bê tu perên wan li mal heye an na. Weke ku milyonên wî li mal hebin got :

- Wey ser serê min û ser çavên min. Mirov carekê li hev diqewime. Ji bo Seydo tiştêni ku ji destêni min bêz ezê bikim. Ferqa Seydo û Silêman li ba min tune ye. Li ba min ew jî weke Silêman e. (Silêman lawê wî bû).

Piştî wan peyvîn mîrik, héviyek ji Hemîdo re çêbû. Dîsa ew kul û derd hemî ji bir kir û şûna wan kêt şâhiyê girt.

- Çer ku ez vegekim ezê perekên we ji we re poste bikim, got bi dilşahî.

- Hela hiş be lo, jehr di nav peran de be. Bila lawik bê berdan bavo ji min re tu pere nelazim e. Dû re rabû ser xwe û çû hundir. Piştî du-sê deqîqan jina wî jî da dû, çû hundir û jê pîrsî.

- Kuro ma ka emê evqas pere jê re ji ku bînin ? Ma tu pere li mal hene ?

- Na Wele, evqas pere li mal tune bin , ka tu dê jê re ji ku peyda bikî ?

- Ma gelo dê li ba cîranê me Elî tune be ?

- Ku tu bi a min bikî li ba wî hebe jî jê nexwaze. Ew dînyanediya wê me di koda ribabê ke. (Yanî ewê ji herkesî re bibêje).

Mêrik tiliya xwe ya eşedî danî ser cêniķa xwe û hebekî fikirî.

- Ma dê wekî din li ba kêt hebe, got dû re. Gelo ez ji kêt bixwazim ?

- Ma dê li ba cîranê me Bozo tune be gelo ?

Mêrik herdu destêni xwe li hev xist.

- A Welel dê li ba wî hebe, got bi ken. Wî erdê xwe yê li gund firotiye. Ku li bawî hebe ew ji min re nabêje na.

- De zû here, berî ku ew ji mal derkeve, got jina wî û çû çaydan tijjî av kir.

Mêrik bi kêt derket der û çû ba Hemîdo. Destûra neh-deh deqîqan ji wî xwest û ji hewşê derket.

Hemîdo di çîrokê de derxistibû. Lê dê çi bikira ? Ger ku ew ne di wê rewşê de biya, wî tu caran dostê xwe fedîkar dernedixist.

Piştî ku mîrik ji hewşê derket, jînik di gel sîniya xwarinê hate bin siya mîwê, ba Hemîdo.

- Te dê zehmet nekira xwişka min, got Hemîdo bi devkenî.

- Ma çi zehmeta wê heye kekê Hemîd ? Me ji te re tu berx ser jê nekiriye. Weleħ malhazîrî hew ev bû. Divê ku tu li qusûra me nenihêrî.

- Ez ê çi li qusûra we binihêrim ? Yêñ ku li qusûra min nenihêrin hun in.

Dû re li ber sîniya xwarinê çarmêrkî veda û xwar. Piştî ku têr xwar, av vexwar û ji sîniyê vekeşıya.

- Xwedê zêde bike, min têr xwar, got.

Jînikê dîsa sîniya xwarinê ber bi wî def da.

- Çima kekê Hemîd, ji bo çi te nexwar ? Ma qey xwarina me ne xweş bû ?

- Xwedê zêde bike, got Hemîdo dîsa. Weleħ min têr xwar. Xwarina we ji serê min û bavê min zêde ye.

Piştî ku Hemîdo cigarek pêça û vêxist, mîrik bi kêf da ser mîderê. Hemîd cigarek pêça, dirêjî wî kir û bi stûxwarî got :

- Mehmûd, divê ku tu li min bibûrî, tu li qusûra min nenihêrî. Ez çi bikim, ku ez ne di vê rewşê de biwama, min tu caran tu fedîkar dernedixist. Lê ez mecbûr im, ku biraziyê te xelas bikim.

Mehmûd destê xwe xiste bêrika xwe, ew pênc hezarên ku ji cînarê xwe deyn kiri bû dirêjî Hemîdo kir.

- Ez rica dikim kekê Hemîd, got. Tu ne hewce ye, ku xwe evqasî kêm bibînî. Em birayêñ hev in. Ma bavê te hindikî alîkarî bi bavê min kirî ye ?

Hemîdo ew pere ji destê wî girt, spasên xwe jê re got û cigareke din pêça û vêxist. Piştî ku cigara xwe kişand, destûra xwe û rabûnê jê xwest.

- Ma gelo kerek we ya zêde tune ye, got. Belki ez ji xwe re li bajêr pê fêkî mîkî bixwim.

Jînikê bazda hundir, kerek piçûk anî û da destê wî. Hemîdo ew kêr ji dest jînikê girt û xist bêrika çakêtê xwe.

- Bi xêr ku ez carek din bêm ezê kêrika we ji wer bînim, got.

- Carek din çawa, got mîrik. Hun işev mîvanê me ne. Bi xêr çer ku kurik hate berdan rast werin vir. Bila kurik xwe rihet bike. Ev serê du mehan e, ku girtiye, niha ew pir westiya ye û aciz bû ye. Emî işev şîvekê bi hev re bixwin.

Hemîdo rabû ser xwe û destêwan hejand.

- Bi xêr ku lawik bête berdan em işev mîvanê we ne, got û derket û çû.

Piştî ku Hemîdo çû, mîrik lawê xwe şande bajêr ji bo ku hin goşt û hêşînayî bikire.

- Weleħ heqê vî bênamûsê ebûkat kuştin e, got jînikê ji mîrê xwe re. Ma îcar ev çi ye, ku her carê pênc hezaran li vî belengazî zêde dike. Derewan jî lê dike, dibêje, ezê lawê te bidim berdan.

Mêrik serê xwe hejand.

- Ne keçê tu bi vê hukûmeta bêbext nizanî. Ev hukûmet hikûmeta bêbavan e ! Bi rewşa feqîr û belengazan qet nizane !

Êdî hew peyivîn. Mêrik cigarek vêxist, çakêtê xwe avêt nav milê xwe û derket der ve. Lî, jina wî bi dû de bang kir.

- Mehmûd, iro hebekî zû were mal ha ! Dibe ku kekê Hemîdo û lawê xwe zû werin.

Mêrik weke ku di ber xwe de bipeyive.

- Erê erê, got, ezê zû vegeirim.

Gava ku Hemîdo gihişt ber avahiya avûkat, saet bûbû du. Hemîdo destmala xwe ji bêrîka xwe derxist, xwêdana ser çavêن xwe pakij kir û bi derencan de bi jor ket. Çû ber deriyê oda avûkat, li derî xist û kete hundir. Avûkat pirtûkek mezin di destên wî de bû û lê dînihîrî. Gava ku Hemîdo kete hundir, avûkat pirtûka xwe ji destên xwe de danî, rabû ser xwe û destê xwe da wî.

- Maşalê te pere anîbin, got bi dengekî ne zelal.

Hemîdo di mana «erê» de serê xwe hejand û ew pereyêن ku anîbûn dirêjî wî kirin.

Piştî ku avûkat ew pere hejmartin, çavîka masê kişand û xistiyê. Dû re li Hemîdo zîvîrî.

- Divê ku em hêdî hêdî herin, got, tenê nîvsatê me maye.

- Ma çi jê dikeve serê te ebûkat beg ? Got Hemîdo bi stûxwarî. ma tu dibê wê lawik bê berdan vê carê ?

- Erê erê, got avûkat. Ez texmîn dikim ewê bê berdan.

Paşê rabûn ser xwe. Avûkat çêntê xwe xist destê xwe, Hemîdo da dû wî û di derencan de daketin jêr. Li otomobila avûkat siwar bûn û berê xwe dane dadgehê.

Hemîdo ji hêrsan dilerizî. Müyên canê wî lê qîj bûbûn, çavêن wî fireh bûbûn û firmikên pozêن wî radibûn û dadiketin. Wî hêdî destê xwe dirêjî bêrîka çaketê xwe ya hundir kir, du-sê caran destê xwe di ser kêra xwe de bir û anî. Di dilê xwe de got "Ku îcar ji lawik neyê berdan, ezê vî avûkatî bidim ber kêran, eyn ez zanibim ku ezê bême bi dar kirin..,

Gava ku ketin hundirê avahiya mehkemê, wir tijî mirov bûn. Di êywanê, de du-sê caran çûn û hatin. Hemîdo kîsikê xwe derxist û cigarek pêça. Piştî ku cigara xwe vêxist, ji avûkat pirsî :

- Ma tu dibê wê vê carê lawik bê berdan ebûkat beg ?

Avûkat li ber pencerê bû, li derve mîze dikir ; weke ku dengê Hemîdo neçûyê, bêdeng ma.

Hemîdo dîsa got :

- Ma çi jê dikeve serê te, ebûkat beg ? Ma tu dibê ewê vê carê bê berdan ?

Berî ku avûkat deng bike mehkeme vebû. Avûkat û Hemîdo bi lez ketin hundir. Herdu destên lêwik kelepçekirî bûn û di orta du eskeran de di huzûra hakim û sawcî de rawestabû. Gava ku lawik çav li bavê ket, herdu destên xwe yên kelepçekirî jê re bilind kir û got :

- Bavo, ma te çi kir ?
- Leşkeran nehiştin ku lawik bipeyive.
- Hiş be, gotin, deng meke !
- Hemîdo şewqê wî di destê wî de bû û bi heyecan li wan du-sê gotinên ku avûkat gotin guhdarî kir. Avûkat ew tiştên ku ji Hemîdo re qotibû, ezê bibêjim, qet negotin.

Bi wî awayî, bi biryara dadgehê heft sal ceza li lawê Hemîdo hate birîn. Hingî Hemîdo bû weke dînan. Hêrs bû û lerizi. Mûyê canê wî lê gjjbûn, çavêن wî fireh, mezin û sor bûn. Mirov digot, a wexta çavêن wî ji nava serê wî bipengizin. Destê xwe hêdî bir ser kéra di bêrika xwe de û wextê êrîş bibira avûkat. Lê nekir, li lawê xwe zîvirî û bi dengekî nîvhêvî got :

- Ez bavê te me, tu hîç meraqan meke ! Ez zanibim ku serê min jî tê de here ezê te bidime berdan. Li xwe miqate be lawê min !

Lêwik xwest ku tişteki ji bavê xwe re bibêje, lê eskeran nehiştin bi milên wî girtin û ew kişandin hundir.

☆☆☆

Piştî wê bi mehekê, Hemîdo li Edenê ji otobusê peya bû. Wê êvarê ew çû mala dostê xwe Mehîmûd. Sibehê zû ku rabû ser xwe, berî ku taştê bixwe rast çû ba avûkatê xwe. Ser masa avûkat dîsan wek hercar tije kaxiz û pirtûk bûn. Lê ji berdêla ku ew li pirtûkan binhêre, pere dihejmart. Gava ku çav li Hemîdo ket, ew perên di destê xwe xiste çavîka masê, rabû û bixêrhatinî da Hemîdo. Hemîdo destê wî hejand, û bi destê çepê ew kéra kelanî, ya ku ji mal anî bû di zikê wî de çikand. çokén avûkat sist bûn û ew laşê wî yê giran li erdê ket. Gava ku ket jî, serê wî li qorziya masê ket û bi yek carê ve can da.

Hemîdo zû zû bi milên wî girtin û ew kişande paş masê. Dû re çavîka masê vekir, ew pere jê derxistin, xiste bêrika xwe û derket derve.

Sê-çar meh di navberê de derbas bûn nebûn lawê Hemîdo hate berdan. Dibêjin, bi saloxan, Hemîdo bi peran sawcî bertîl kiriye û lawê xwe daye berdan.

NEVÎ YÊ KALÊ SIYAMEND

KALO

*Siyamendê Silîvî şarge bûbû di Sîpan,
Pêgera hespê te ye tevayîya Kurdistan.
Di çavêن te dibînim şopa mîrxasên leheng,
Li pêş te rawestiye dozek mezin û giran.
Doza azadiya kurd di Rohilata Navîn,
Jê ra divêtin kesin dilpola û qehreman.
Bawer im tu ew kes bî, di pêşendeyek ne dûr,
Neyaran tarûmar kî şerpeze û perişan.
Welatê xwe aza kî, tê da serbilind bijî,
Damezrîn⁽¹⁾ dewleta kurdan di nava cîhan.*

10.10.1985

(1) Damezrandin : him danîn

ŞELMAQA COXRAFYAYÊ

Çerkezê REŞ

*Qiza min vegerya û giryâ !
Qiza min vege riya û giryâ !...
Ez idî naçime mektebê !
Ez idî naçime mektebê !...
Dersdar qe tiştekî nizane !
Dersdar qe tiştekî nizane !...
Min xwest ser xerîtê bibînim !
Min xwest ser xerîtê bibînim !...
Lê wê go - Kurdistan tune ye !
Lê wê go - Kurdistan tune ye !...
Qiza min vegerya û giryâ !
Qiza min vege riya û giryâ !...*

PIRTÜKÊN NÔ

Alde Médicale Internationale, Le Kurdistan d'Iran (Kurdistana Iranê), Paris, 1984, 95 r.

Komela Arikariya Tibbi ya Navneteweyi (A.M.I.) jibihara 1981 bi vê de li ser gaziya Partiya Demokrat a Kurdistana Iranê doktorên biyani dişine Kurdistana Iranê, nexweş û birîndarén kurd derman dike. Di vê pirtûkê de fotoyê hin ji van dostêr gelê kurd hene li ser Kurdan û welatê wan. Ew, her çiqas ne afirandinê pisporan bin jî, ji hemû gotinan xurtir sefalet û belengaziya ku gelê kurd tê de dijî nîşan didin. Mixabin ji ber kêmasiya gengaziyê diravî A.M.I. tenê fotoyê reş û spî kiriye vê albumê.

J.B.

ANDREWS, F. David, The Lost People of the Middle East, Documents of the struggle for survival and independence of the Kurds, Assyrians and other minority races in the Middle East, (Gelên windabûyi yên Rohelata Navîn, Belge li ser şerê ji bo jîyan û sexwebûnê yê Kurdan, Suryaniyan û rîgezêr hindikahî yên din ên rohelata navîn), Documentary publication, Salisbury, N.C., 1982, 171 r.

Ev pirtûk ku jê tenê 350 çèle (nisxe) hatine çap kirin, berhevokeke ji hijde deste belgeyên ji arşîvên hikûmata Dewletêr Yekbûyi yên Amerikayê derêxistî, yên ku ta niha «nihêni» an «ji bo xwendina kêm kesan» bûne pêk hatiye. Belge li ser heyama adar 1945 - çile 1947 in û bi serekeyi li ser Kurdan in, bilî sê ji wan : 1) Gaziyeke serokên suryanî ji bo neteweyek serbixwe (r. 26) û pirsîyara suryanî (r. 31). 2) Liga cihû ya anti-sionîst a Iraqê (r.73) û 3) Gelemşeyiyê nijadî li Xûzistanê (r. 113) û nûçeyên greva Abadanê (r.122).

Amanca vê berhevoka belgeyan, dibêje F. David Andrews di ketiniyê de, cefakêşî û xwestekêr gelên Rohelata Navîn û bi taybetî yên Kurdan danîn ber roniye ye.

Belge ji sefareta Dewletêr Yekbûyi li Bexdayê têr û ji servisên agahdarî yên Washingtonê re hatine şandin. Weki mînak : belgeya yekemîn nameyeke «nihêni N°. 674» eku di 22 adar 1945 de William D. Moreland, Jr., meslehetgûzar, ji Sekreterê Dewletê re şandiye Washingtonê. Ew li ser giliya welatparêzên kurd ji xedra ku hikûmata Iraqê li wan dike ye. Teví nameyê çend belgeyên ji kurdi wergerandî hene.

F. David Andrews fîristeke navên kesan û ciyan bi ser pirtûka xwe ve kiriye. Pirtûk agahdariyê balkêş dide li ser rewşa Kurdan li Iraqê pey Şerê Cihanî yê duwemîn.

J.B.

BELLİ M., Türkiye, toplum yapısı, ulusal sorun, Kürt davası (Tirkiye, avâhiya civakî, pîrsa neteweyî, doza kurdi), Emekçi Yayınları, Författares Bokmaskin, Stockholm, 1984, 167 r.

M. Belli ji 1965 bi vê de pir pirtûk û bendan li ser civaka tirkî û xaseten li ser Çepê

Tirkiyê nivîsiye, wan li Ankara, İstanbul û Munchenê belav kiriye. Ev pirtûka han jî di 1980 de ji çapê re amade bûye, lê darbeya eskerî imkana derêxistina wê li Tirkiyê nehiştiye.

Di birrê ku li ser pirsa neteweyî û doza kurdî (r. 109-136) ye, nivîskar dide pêş ku şerê gelê kurd ji bo rizgariya xwe ya neteweyî pareke şerê hemû gelên Rohelata Navîn û xasmê yê gelê tirk e. Dîroka hemdem pir caran nîşan daye ku sernivişa (qedera) tevgera neteweyî ya kurdî û ya şerê hêzên pêşverû yên Tirkiyê mişterek e. Di çaxê Şerê Serxebûnê (1919-1923) de Kemalîst, ku li dijî dagirkirina Tirkiyê berxwedaneke çekdarî dikirin, qewla nasîna mafîn neteweyî yên "demokratîk" ên Kurdan dabûn û Partiya Kommunist a Tirkiyê jî eşkere dixebeitî. Pişti perçiqandina Serxerabûna Şêx Seîd, di 1925 de, tevî teşkilatêne Kurdan hemû teşkilatêne tirkî yên pêşverû jî hatin qedexe kirin. Gava ku siyaseteke hov a asîmîlasyona Kurdan pêk dihat, dibêje nivîskar, weşanên marksîst û dijekariya (mixalefeta) çep jî qedexe bûn.

Sernivişa mişterek a çepê tirk û tevgera neteweyî ya kurdî iro bêtir eşkere ye. Rejîma eskerî bi eynî xedariyê li demokratêne Kurda tirk zilmê dike. "Bê çareyeke demokratîk ji pirsa kurdî re, dînivîse M. Belli, li Tirkiyê tu guherandineke bingehî û civakî nikare çê bibe".

J.B.

BLAU, Joyce, *Le mouvement national kurde*, di Les Temps Modernes, Paris, 1984, №. 456-457.

Kovara fransızî Les TEMPS MODERNES hejmareke taybetî (461 r.) li ser Tirkiyê derxist, ji ber ku dibêjin weşankarêne vê kovara navdar "Tirkiye kêm û xerab tê nasîn", dîroka wê, rewşa wê ya stratejik û têkoşînên ku li wê tê kîrin hêjaye baldanê ne. Ev hejmara rûmetar bi du nivîsaran yek li ser pirsa ermenî (Anahide Ter Minassian, *La permanence d'une revendication*, r. 419-446) û ya din li ser pirsa kurdî diqede.

D.F.

BRUINESSEN, Martin van, *The Kurds*, (Kurd), Merip Reports, №. 121, sebat 1984, r. 6-12.

Nivîskar ku çêtirîn pisporê rojavayî ye li ser pirsa kurdî li Tirkiyê, tevgera neteweyî ya kurdî li vî welatî ji Şerê Cihanî yê yekemîn bi vê de di çend rûpelêni xurt de pêşkêş dike û dixe bîrê ku piraniya gundiyan kurd ên Tirkiyê hê di bindestiyeke nîve-feodal de dijin.

Piştî salên 1920, îdeolojiya yekîtiya netewî wekî pêkerê (faktore) meşrûkirina karînê (iktidarê) şûna dîn digire : her xwesteke kurdî ji bo wekî gelekkî cihe jiyan dibe sedemê şerîn xwînrêj. Di êvara Şerê Cihanî yê duwemîn hemû "navçeyên rohelatî" hatibûn "aram kîrin" û mirov dikaribû bifikire ku Kurdîn Tirkiyê bi carekê hatine asîmîle kîrin. Di hemû gundêñ piçek girîng de qereqol hatibûn danîn û ew dixwîstin pêşî li aksaftina kurdî, lixwekirina cilêñ kurdî û her xuyabûniya çanda kurdî bigirin. Di bajarêñ piçûk de berebere zimanê tirkî ciyê kurdî digit. Lîbelê di dawiya salên 1950 de şoreşa 14 ê temûzê li Iraqê giyanekî nû anî, xasme nav xwendekarêne Kurda ên Tirkiyê. Partiyêni siyasi û sendîka hingî diçe bêtir bala xwe didin pirsiyara "Rohelat". Kurd li Ankara û İstanbulê komeleyan datînin û şaxên wan berebere li Kurdistanê bi xwe zêdetir dibin. Di 1979 de xedr û zordestiya dijî Kurdan bi ıllana idara orfi di hivde navçeyên kurdî de digihê bandevê.

Ev nivîsara hêja ya li ser tevgera neteweyî ya kurdî li Tirkiyê bi nêrîneke kurt li ser dîrok û bernameyên siyasi yên teşkilatêne kurdî yên sereke diqede

J.B.

DIZEYÎ, Awazî Hemedemîn, *Folklorî kurdî le nawçeya dizeyîyan da*, Idareya giştî ya çand û caniyê, Bexda, 98 r.

Li ser hunerê gelerî yê kurdî kêm pirtûk dertêñ û xebatêne ku pareke pêmahiya (mîrasa) çandî ya kurdî ji tariyê derdixin timî hêjayî balkêşîyeke mezin in. Stî Awazî

Hemedemînî Dizeyî şaireke kurd e, di sala 1946 de hatiye dinê ; malbata wê û ew ji vê navçeya Dizeyê ne û kes jê baştir nikaribû qala vê navçeyê bikira.

Birrê yekemîn ê pirtükê li ser adetên zewacê li nav Kurdan e (bedêlkirina keçan, dêyitî, lorî, êşen zarotiyê...) ; § 2, Cilêñ mîrân û jinan û "xemî" ; § 3, xwarin (xurînî, firavîn û şîv, çesneyen nan, xwarinê bi goşt...) ; § 4, leyistikêñ zarokan ; § 5, adetên kevnare û § 6, stranêñ folklorê (dawet, govend, stranê nêçîrê, yên ber dewkulê, yên jinan, ên şînê, ên paleiyê...)

Di dawiya pirtükê de "têderxistinok" hene.

A.M.

EFTEXAR Abdullah Nahid, Xatiratê men (Bîranînê min), Tehran, weşanê Nafisifar, 1983, 107 r.

Eftexar leqebeh Abdullah Nahid, wênekar û mirovê siyasî yê naskirî ye kurd e. Ew di 1891 de di gundekî nêzîkî bajarê Saqizê hatiye dinê û di 1945 de li Saqizê miriye.

Van "Bîranînan" Ehmedê Qazî, ji malbata navdar a Mahabadê, neşir kiriye. Merivatiya Eftexar bi vê malbatê re hebûye.

Eftexar di *Meclîsa XII* û *XIII* a Iranê de Kurdêñ Iranê temsîl kiriye. Bîranînê wî li ser demeke girîng a dîroka Iranê û Kurdistanâ Iranê di navbera her du şerîn cihanî ye. Beşê li ser bûyerên Mahabadê gelek balkêş e. Nivîskar bi xwe Ismaîl Axa (Simko), ku di 1930 hate kuştin, û serekên eşîra navdar a Feyzullahbegî (ku li nêzîkê Bokanê diman) û ya Dehbokrî (nêzîkî Mahabadê) dinasî.

Di dawiya pirtükê de çend ji tabloyê Eftexar hatine çap kîrin. Pirtük ji bo kesêñ ku balewarê dîroka Kurdistanâ Iranê ne gencîneyeke agahdariyê ye.

J.B.

GLAZERBROOK, Philip, Journey to Kars, a modern traveller in the ottoman lands, (Çûyîna Qersê, gerokek nûjen li ser erdêñ osmanîyan de), Penguin Books Ltd, 1984, 246 r.

Philip Glazebrook, ku di 1937 de hatiye dinê, ta niha çar romanian nivîsiye. Li ser şopa gerokêñ kevn ew li dînyayê geriyaye û navçeya Qersê, di welatê Kurdan de, qonaxa dawîn a rîwitiyeke dirêj a bêtîrî deh hezar kilometir e. Nivîskar pir xwendîye, hîn bûye û berî her tişti li pey serûwena ye. Xwastiye ku bide ser riya pêşhatiyen xwe yên navdar, ên ku nivîsandinê wan xeyala nîfşen (neslén) temam dagirtiye. Teví reşîya wan, li bin siya xebatêñ wan ew heyâ vê "kela ku Tirk, Rûs û Farisan ji heyamên kevtirîn ve li serê şer dikirin û ku ji bo min sînorê ku di cihanê de zêdetir bi dîrok û romantîzmê barkirî ye."

Xwendîna vê pirtûka ku niho û boriyê bi aheng tevî hev dike xweş e lê tê de agahdariyêñ bikêrhatî li ser jiyana nihoyî ya Kurdêñ van navçeyan kêm in.

Li ser rûyê pirtükê gravureke sedsala XIX ya Qersê ku S. Cholet li ber wêneyeke qelemî ya Kont B. de la Bourdonnaye (Musée des Arts Décoratifs, Paris) çêkiriye heye.

J.B.

ME'MÛN BEG ibn Beygebeg, Mudekkerat (Bîranîn), Mihemmed Cemîl el. Rojbeyanî û Şukir Mistefa ji tirkî wergerandine erebî, weşana Akademiya Zanistî ya Iraqê, destey kurdi, Bexda, 95 r.

Ev "Bîranîn" li jêr navê *Memun Beyin Hatıraları* di *Belleten*, kovara Civata tirkî ya dîrokê, cild XXXVII, no 146, nîsan 1983. r. 191-229 de bi destê Ismet Parmaksizoğlu ku li Bexdayê ser bi destnîvîsê vebûbû çap bûbûn.

Me'mûn Beg di nîveka sedsala XVI de waliyê Ardalanê bû û bêtir bi navê Me'mûn II tê nasîn. Pişti mirina bavê xwe di 1534 de di şûna wî de bû walî. Mecbûr ma bikeve jêr hikmê Osmaniyan û ew wî sirgûnê İstanbulê dîkin. Bi arîkariya Şêx Tahmaspê Sefewî, mamê wî Surxab Beg Ardalan milkê wilayetê Ardalanê digire. Hindê Sultan Suleyman Qanûnî Me'mûn Beg dişine Hillayê, navçeya Bexdayê, da ku ew milkêñ xwe ji nû ve zevt bike, lê ew bi ser nakeve. Şeref Xan Bedîsî di *Şerefnama* xwe de dinivise ku di 1597 de Me'mûn Beg hê li Hilla diji.

Destnîvîs bi osmanî hatiye nivîsîn, roja 22.12.1597 xelas bûye û ji Sultan Murad III te, bi hinceta hatina wî ya ser text, hatiye pêşkêş kirin. Ev pirtük ji bo nasîna dîroka xanedana sefewî, ji dema ku Şah Ismail wê damezrandiye bi vê de, gelek girîng e. Tê de agahdariyên ronak hene li ser iradeya vê xanedanê ji bo tesfiye kirina Benî Ardalanan û li ser peywendiyên navbera Osmanî û Sefewiyan di wê heyamê de. Her du werger têbînîyê bikérhatî bi ser metnê ve kirine. Lê mixabin ku wergeran ciyêñ ku tê de çêri Şah Ismail û dewleta Sefewî hatiye kirin "sansur" kirine.

A.M.

MENTEŞAŞVILÎ, A.M., Kurdy, Ocerki Obşchestvanno - ekonomiçeskix otnoşenii, kul'tury i byta (Kurd, lêgerîn li ser peywendiyên aborî-civakî, çandî û jiyanâ rojane), weşana Nauka, Moskva, 1984, 240 r.

Ev pirtük ketiniyeke gelek baş a medeniyata hemdem a Kurdan û hemû besên Kurdistanê ye. Ew ji sê pişkan hevedudanî ye. Pişka pêşin li ser aboriya navçeyên kurdî, bajar, jiyanâ rojane (ol, avahiya malbatê) û li ser çandê ye.

Di pişka duwemîn de nivîskar ji avahiya eşîrên Kurdistanê diaxive û xasme qala konfederasyonê eşîretan li navçeyên cihênak ên Kurdistanê dike.

Pişka sêwemîn li ser peywendiyên ziraî û aborî ye ; ew xasme peywendiyên ziraî di Heyama Navîn de, veguherînên wan, rewşa îroyîn a pirsa axê di çar perçeyên Kurdistanê de dadihûrîne. Ev pişk hînek li ser pîrsen bi pêşveçûna bajaran ve girêdayî jî dimîne.

D.F.

MINORSKY, V.F., Kurd, ji erebî wergerandiye Heme Se'îd Heme Kerîm, weşana Zanîngeha Selaheddîn, Erbil, 1984, 192 r.

Heme Se'îd Heme Kerîm pirtûka Vladimîr Minorsky Kurdy, zametki i vpeçatleniya (Kurd, nîşe û intiba) ku di 1915 de li Petrograd çap bûbû ji wergerandina wê ya erebî kiriye kurdiyeke bedew. Mixabin wergerandina erebî ya Marûf Xeznedar (*Eli-Ekrad, mulaflîdat we entiba'et*, Bexda, 1968, 97 r.) bi lez hatiye kirin û tê de gelek xeletiyên wergerandinê hene û Heme Kerîm ji ber nezaniya rûsi hemû xeletiyên pirtûka M. Xeznedar wergerandiye kurdî.

A.M.

MORE, Christiane, Les Kurdes aujourd'hui, mouvement national et partis politiques (Kurd îro, tevgera neteweyî û partiyên siyasi), pêşgotina Maxime Rodinson, L'Harmattan, Paris, 1984, 310 r.

Pirtûka C. More ji sê pişkan pêk hatiye. Di pişka pêşin de, ji bo ku xwendevan hewcê serlêdana pirtûkên din nebin, nivîskar bi kurtî agahdariyên giştî li ser gelê kurd û li ser dîroka wî dide. Pişkîn duwemîn û sêwemîn xasîtiya vê xebatê pêk tînin : ew li ser parti û teşkilatên kurdî yên ku di her yek ji dewletên ku Kurdistanê li hev par kirine de bi dizî an nîv-dizî şer dikin e. C. More xurtahiya her hêzê li Kurdistanê bi xwe, (ku hebe) temsilkariya wê ya derve, dîroka wê, ideolojiya -pirîcar guherok- wê û bernameya wê ya xebatê heya mimkin be -ji ber rewşa Kurdistanê ev karekî hêsa nîne- diyar dike.

Pirtûkeke ciddî û serwext, bikérhatî ji bo kesên ku bala xwe didin dîroka nûjen a Kurdan.

J.B.

PELLETIERE Stephen C., The Kurds, an unstable element in the Gulf (Kurd, unsûrekî bê istiqrâr di Xelîcê de), Westview Press, Westview Special Studies on the Middle-East, Boulder (Colorado, U.S.A.) and London, 1984, 220 r.

Stephen C. Pelletiere "assistant -professor" ê zanistîyên siyasi ye di Union College a New Yorkê de. Ew di destpêka kariyera xwe de rojnamevanî kiriye û di salêr serê çekdarî yê Kûrdêna Iraqê li dijî rejîma Bexdayê çend hefte li cem Mistefa Barzanî maye.

Nivîskar pêkerên (faktorê) ku di dîroka hemdem a Rohelata navin de arîkariya domkirina netewevaniya kurdî kirine dadîhurîne. Ew xasme li ser veguherîna tevgera neteweyî ya kurdî di navbera her du şerîn cihani de, peywendiyê wê bi dewletên Rohelata Navin, bi xurtahîyên mezîn, nemaze bi Yekitiya Sovyeti û Dewletên Yekbûyi yên Amerikayê dimîne. Bi ya wî, Kurd li hemberî teşebisên asimilasyonê yên dewletên ku wan li hev parî kirine, bi xurtahî di ber xwe didin û ew unsûrekî pir girîng in di vê navçeya hestiyar (hesas) de. Ew sedemê "gelemşe-çêkerî" ya Kurdan di vê navçeya ku ji 1980 bi vê de şerekî bêgidi dijî û dikare rojekê "super-xurtahîyan berî hev de" izah dike.

The Kurds' çêtirîn pirtûk e ku ta niha li ser tevahiya tevgera neteweyî ya kurdî derketiye. Ji bo cara pêşîn, pisporêkî ku çibigre hemû pirtûkên ku li ser vê pirsê hatine nivîsin xwendîye û nasîna xwe bi tehqîqen di cî de û bi hevpeyvîn tevî şexsiyeten ku besdari çêkirina dîroka Kurdan dibin temam kiriye, dahûrîniyeke giştî dike.

Pirtûk bi zimanekî sade û jîndar hatîye nivîsin û çapa wê bedew e. Ew ji bo hemû kesên ku bi pirsiyaren Rohelata Navin bilî dibin bikêrhatî ye.

J.B.

ŞAMİLOF A., *Hewl mesele el-Iqta' Beyn el-Kurd*, wergerandina erebî, pêşgotin û nişeyen Kemal Mezher Ehmed, çapa duwemîn a zêdekirî, Bexda, 1984, 110 r.

Ereb Şemo di 1897 de li gundê Sûsizê di navçeya Qersê de hatîye dinê û di 1979 de li Erivanê miriye. Ew di dinya edebî ya kurdî de bêtir bi romanen xwe tê nasîn.

Lêgerîna ku dîrokñas K. Mezher Ehmed ji rûstî wergerandiye û bi gelek nîşeyan dewlemed kiriye bi navê Voprosu o feodalizme u Kurдов di Problemy Istorii do kapitalistîceskix obşestv, 1934, №. 9-10, r. 111-134 de derketibû. Bi ya nivîskar di nav esîrên koçer ên kurdî de feodalizm gava ku kerî mezîn dibin û divê ku çêre û kaniyan bi dest xin xuya dibe. Di nav cîwarbûyîyan de ji di dema destdanîna ser milkan û ser avê de peyda dibe. Xasiyeteke berbiçav a derebegîtiya kurdî parastina têkiliyên eşîri ye. Peywendiyê navbera began, sazbûniya hoz, eşîr û qebilan stembarî tînin ji gundiyan re. Koledarî di nav Kurdan de ne bûye teşeyekî berbiçav ê kedxuriyê.

Lêgerîn balkêş û bikêrhatî ye, xasme ji ber nîşe û tefsîren Kemal Mezher Ehmed.

J.B.

WALSER, Hugo, *Bergtürken oder Kurden : Das Kurdenproblem in der Türkei* (Tirkêن çiyayı an Kurd, pîsa kurdî li Tirkîyê), Dokumentations -Leitselle Moderner Deutsches Orient Institut, Aktueller Informationsdienst Moderner Orient, vol. 1, Hambourg, 1983, 88 r.

Franz Hart, ji Buroya belgewarî ya li ser Rohelata nûjen û ji servîsa Rohelata nûjen a Enstituya almanî ya Rohelatê bi tevkariya Enstituya almanî ya pişt-deryayî di 1977 de hejmareke taybetî li ser pîsa kurdî derxistibû (Hambourg, 170 r.). Xebata Hugo Walser tenê tarojêya pirtûka Franz Hart nîne. Nivîskar xasme bala xwe dide rewşa Kurdan li Tirkîyê ji 1977 bi vê de. Ewî bendine di rojname û kovarê rojavayî û rohelati yên girîng de derketî berhev kiriye : *Le Monde*, *Le Monde Diplomatique* (Paris), *Daily Star* (Beyrouth), *Neue Zürcher Zeitung* (Zurich), *Kuwait Times*, *The Christian Science Monitor Weekly* (Boston), *Arabe News* (Jeddah), *Die Zeit* (Hambourg), *Turkish Daily News* (Ankara), *Jordan Times* (Amman), *Dawn* (Karachi), *Frankfurter Allgemeine* (Frankfurt), *The Economist* (London), *The Financial Times* (London), hwd...

Bend li gora babeta û rêza dîrokî hatine civandin. Ew pûçtiya tezên resmî yên Tîrkan li gora kîjanan "gelekî kurd nîne, di hivde wilayetên rohelatî de Tîrkan Çiyayı yên nexwedewar ên ku zimanê xwe ji bîr kirine" nîşan didin.

J.B.

XUSREV ibn Mihemed benî Ardalan, *Xronika* (Bûyerên dîrokî), wergerandina rûstî, ketinî û nişeyen E.L. Vasilieva, Moskva, weşanên Nauka, 1984, 220 r. + 219 wênenivîs.

Stî E.L. Vasilieva, lîger li Kurdkij Kabinet a Enstîtuya Rohelatnasî ya Lenîngradê, çêtirîn pispora dîroka Heyama Navîn a Kurda ye. Fotokopyîn destnivîsa farisî *Tarixê Xosrow benê Mohemmed benî Ardalan* di pirtûkê de hatine çapkirin. Ew di 1833 de bi destê Xosrow ibnî Mohemmed ibnî Manûşehr Ardalan, nebiyê Sulêman Xan Ardalan, waliyê Kurdistanê (1636-1655) û hîmdarê bajarê Sene (Senandac) hatiye nîvîsin. Xebata Stî Vasilieva ji çapê re amade bû gava ku wê bihîst ku malbata Ardalan dike eynî metnê neşir bike (Ismaîîlê Ardalan, Tehran, 1976).

Lêbelê her du çap jî netemam in. Her wekî me ji Stî Vasilieva re jî gotibû di destnivîsa ku pêsiyê navê *Lobbê Tevarix* hildigirt de du birr hene : di birra yekâ de gelempérîne hene li ser jiyana pêxemberan, xelîfan, imaman û wisa jî li ser ya şahêن Iranê û Sultanê Osmanî ta heyama Fetih Elî Şah Qacar (1797-1834). Pişka duwemîn ku Stî Vasilieva û malbata Ardalan her yek di tengâ xwe de çap kirine li ser dîroka xanedana Ardalan ji 1120 ta dema Xosrow Xan Nakam (1824-1834)e. Stî Vasilieva li ser destniviseke ku li Pirtûkxaneya Neteweyî ya Parîsê hatiye parastin, bênav e û tenê birrê duwemîn ê *Lobbê Tevarix* e xebitiye. Destnivîsa temam li cem Stî Qeşengî Ardalan li Tehranê ye û mora Xosrow Xan Nakam li ser e. Malbata Ardalan bi zanîn tenê birrê duwemîn ê destnivîsê bi navê *Lobbê Tevarix*, *Tarixê Ardalan* neşir kiriye.

Her du destnivîs weka hev nînin. Di ya Pirtûkxaneya Neteweyî de rûpelên zêde (ji rûpela 95A ta rûpela 108) hene û, biserde, hin cih jî nû ve hatine nîvîsin. Em bawer in ku nîvîskar bi xwe van guherandinan çê kiriye.

A.M.

YACOUB Joseph, *La question assyro-chaldéenne, les puissances européennes et la Société des Nations* (Pirsa Siryanî û Kildaniyan, xurtahiyê awrûpayî û Civaka Neteweyan), Thèse de doctorat ès-Lettres et Sciences Historiques, Université de Lyon II, 1984, 4 cild.

Ev tez, ku dereca "Gelek baş" girtiye, xebateke bingehî ye li ser dîroka fileyên Siryanî û Kildanî ku ji demên kevtîrin ên dîrokê ve tevî Kurdan dijîn.

Piştî dîrokçeyeke dirêj li ser binemal û rehîn van cemaetan, nîvîskar ji dîroka wan a piştî Şerê Cihanî yê Yekemîn diaxive, qala siyaseta Brîtanya-Mezin û Fransa û paşê ya Sûriyê li hemberî wan dike. Ew bi dirêjî li ser biryarên Civaka Neteweyan ên li ser rewşa van cemaetan û li ser cîwarkirina wan di Kurdistanâ Iraqê dimîne.

J.B.

EDEBIYAT

AKREYÎ, Ezîz Reşîd, Çirok û serhatiyên kurdi, Koerdische Arbeidersvereniging in Nederland, Den Hag, 1982, 41 r.

Pirtûkeke piçûk a xwendina kurdî ji bo derwelatiyê kurd ên Hollandayê. Nîvîskar ji navçeya Akra, rojavaya Kurdistanâ Iraqê ye û alfabeşa kurdî ya bi tîpêñ latînî bi kar anîye. Di nav rûpelan de gava ku gotineke kurdî dijwar xuya kiriye wergerandina wê ya erebî daye.

J.B.

BÎMAR Ebdulrezaq, Dildari ême, weşana Idara Giştî ya çand û ciwanîyê, Bexda, 1982, 79 r.

Ev berhevoka duwemîn a helbestêñ Bîmar e. Bîmar ji navçeya Silêmaniye ye û berhevoka wî ya pêşîn *Dîwanî Wenewşekan* di 1981 de derketiye. Hin ji helbestêñ wê ji niha ve bûne stran. Bist helbestêñ vê berhevoka nû li ser evînê ne, hin bi weznêñ klasik hin yên nûjen hatine nîvîsin.

Bîmar du piyesêñ şanoyî jî nîvîsiye : *Bûkî Perde* di 1960 de, *Şanoy Kurdistan* jî di 1961 de çap bûne.

J.B.

BLAU Joyce, Mémoire du Kurdistan, (Bîra Kurdistanê), weşanên Findakly, Paris, 1984, 223 r.

Ev pirtûka ku pêşgotina wê Maxime Rodinson nivîsiye berhevoka yekemîn a edebiyata kurdi ku ta niha li dervayî Röhelata Navîn û bi zimanekî awrûpayî çapbûyi ye. Ew wekî çend berhevokên kurt ên ku berê li ser edebiyata kurdi derketibûn tenê bi edebiyata devkî bilî nabe, cihekî fireh ji dide edebiyata nivîsiya ya Kurdan.

Afirandinê nivîsi ku birrê duwemîn ê pirtûkê pêk tînin ji şair û nivîskarêne sereke yên heyama klasîk û ya hemdem hatine helbijartin. Nivîskarênen nûjen, û ev ji nûyitiyeke pirtûkê ye, ji her du zaravayêne mezin ên kurdi (kurmancî û soranî). Pişkeke mezin a van metnan ev cara pêşîn e ku hatine wergerandînî zimanekî awrûpayî.

Mémoire du Kurdistan ketiniyeke pêwîst e ji bo nasîna edebiyata kurdi.

D.F.

CELALÎ, Muslih Mistefa, Şêx Nûri, dengî resenî şî'r, Wezareta Çand û Rênişaniyê, beşa çand û weşanên kurdi, Bexda, 1984, 185 r.

Nivîskar jînenigariyeke zexm a şair Şêx Nûri Şêx Salih, ku di 1896 de li Silêmaniye hatiye dinê, di 1958 de miriye û ku ew wekî bavê hîmdar ê helbestvaniya kurdi ya nûjen dihesêbe, pêşkêş dike.

Şêx Nûri di destpêkê de rojnamevanî dike û ïdara kovara edebî û ramyarî (siyasi) *Rojî Kurdistan* ku li Silêmaniye derdiket dixe destêne xwe (ji vê kovarê di salêne 1922-1923 de 15 hejmar derketine). Pişti şer, di misebeqeyeke neteweyî de Şêx Nûri nîşana yekemîn a zimanê kurdi distîne. Ew bi réya şâfrîn tîrk, xaseten Tewfik Fikret, ji ekola romantîk a awrûpayî agahdar dibe û ev ekol bandûreke mezin dihêle li ser afirandinê wî. Ew ji dikeve nav koma şâfrîn kurdi ên Iraqê yên ku li dora hozanê mezin Goran dicivîn.

Birrê duwemînê pirtûkê lêgerînek e li ser afirandinê wî. Nivîskar dîtinê hemdemên navdar ên wî, bi taybetî yên Goran, Kamil el-Besîr, Elaedîn Seccadî, Reffîq Hilmî, hwd. û yên pisporê vê pirsê Mistefa Ezedîn Resûl li ser Şêx Nûri û helbestvaniya wî dide. Paşê hin ji helbestên wî yên welatparêzî (r. 55-98), civakî (101-110), evînî (r. 112-126), li ser bedewî û xwezayê (r. 129-134) û gazindî (r. 137-144) pêşkêş dike.

A.M.

EBRAHÎM Şukriye Resûl, Pendî pêşîyan û qisey nesteqî kurdi, nawerokî fîkrî û edebî, ji rûsi wergerandîne Şukriye Resûl û Celal Teqî, weşana Idara Giştî ya çandê û ciwaniyê, Bexda, 1984, 150 r.

Ev pirtûk wergerandîne kurdi ya teza Stî Şukriye Resûl Ebrahîm a ji bo doktora zimanewaniya zanîstî ye ku wê di 1976 de li Lenîngradê parastibû. Ev lêgerîn li ber destêne profesor X.G. Karoglu, pisporê folklora iranî hatiye pêk anîn.

Birrê yekemîn li ser dîroka xebatênu ku ta wê rojê di vî warî de derketine ye ; hemû weşan bi kurtî li gora réza alfabetî hatine nasandin (r. 19-67). Ev pişk bê gûman ya hêjatirîn a pirtûkê ye. Her du birrêne din li ser tesnîf, dahûrînî û hunerê edebî yên van pend û methelokan in. Di dawiya vê xebata, ku li ser hev bikêrhatî ye, pirtûknasiyeke dirêj heye.

A.M.

HEMDÎ, Dîwanî Hemdi, Silêmaniye, çapxaneya Serkewtin, 1984, 424 r.

Cemal Mihemed Emîn afirandinê vî hozanê mezin berhev kiriye, civandiye, û ketinî, dahûrînî û nîşeyêne vê çapê nivîsiye.

Navê rastî yê Hemdi Ehmed Begî Sahêbqîran e û ew ji malbata hozanê navdar Abdurahman Salim (1800-1866) û Mistefa Begî Kurdi (1809-1849) ye. Ew di 1878 de li Silêmaniye hatiye dinê û di 1936 de her li wî bajêrî miriye. Şagirtê Nalî, yek ji hîmdarêne helbesta hemdem a bi kurdiya navendî, ewî wekî piraniya şairên dema xwe ne tenê bi kurdi lê bi farisî û erebî ji nivîsiye.

Ev hozanê "şoreşger" gelek helbestên welatparêzî nivîsiye û ewî di hikûmata Şêx Mehmûd Berzîncî de Weziriya Gumrikê (1922-1924) kiriye, hin ji helbestên xwe ji Şêx re ithaf kiriye.

Çapa pêşîn a *Diwanî Ehmed Hemdî Beg Sahibqîran* bi destên Cemal Xeznedar di sala 1957 de li Bexdayê (Çapxana Gelawêj, 399 r.) belav bûbû. Lê ev çap netemam bû ji ber ku helbestên bi farisi û erebî nivîsî ne tê de bûn.

Di vê çapa nû de mixabin xeletiyêng çapê, xasme di metnê farisî de, gelek in.

A.M

HÊMIN, Paşerokî Mamosta Hêmin, Mahabad, çapxana Seyedîyan, 1983, 220 r.

Navê Hêmin ê rast Mihemed Emîn Şêx ul-Islamî ye û ew yek ji çêtirîn hozanên Kurdistanâ Iranê ye. Helbestên wî di 1974 de hatine berhev kirin û Dîwana wî di nav weşanên Binkey Pêşewa de çap bûye.

Nivîskar di vê pirtükê de bend, lêkolîn, pêşgotin û wergerandinêng xwe yên ku bi serekeyî li Iraqê derketine û iro îndî bi dest nakevin civandîye. Di nav wan de nivîsara wî Şerejin ku di kovara *Nûserî Kurd*, №. 2, 1971 de bi hinceta 25 saliya qetliamên Saqizê li ser heşt jînên kurd ên Saqizê, ku rejîma Iranî bi dar de kiribû, nivîsibû, bendekekê li ser jiyan şoresgerî ya Xalo Qurban, Kurdê Kermanşahê ku di destpêka salên 1920 de ketibû nav tevgera cengelî ya Gîlanî hene.

Di dawiya berhevokê de pênc helbestên wî yên nû hene.

J.B.

MUKRIYANÎ Kurdistan Giw, Honrawey afireti kurd, lêkolînewe, Hewlêr, 1980, 175 r.

Stî Kurdistan Mukriyanî lêkolîna xwe li ser jiyan û afirandinêng nozde jînên şair ên Kurdistanâ Iraqê, yên ku şehrezayiya wan ji alî hemdemêng wan de hatiye nasîn çekiriye : Awaz Dizeyi, di 1946 de hatiye dinê ; Pakîza Refîk Helmî, li Surdaşê hatiye dinê ; Hezîne Xan (navê pênuşî yê jina Hecî Melay Ebdullah Celîzade), di 1842 de hatiye dinê û di 1911 de miriye ; Xanim Resûl Ehmed ; Xecîcey Mirza Mihemedî Sablaxî, di 1906 de li Kerkükê miriye ; Xorşîde Baban, di 1940 de hatiye dinê û gelek helbestenê welatparêzi nivîsiye ; Daykî Sulav (Sebriye Xan Nûri Xefaf), di 1928 de li Silêmaniyê hatiye dinê ; Serfiraz Elî Neqşebendî, di 1945 de li Bamernê hatiye dinê ; Şefiqe Elî Xorşîd, di 1940 de li Silêmaniyê hatiye dinê ; Fezîle Abdullâh Mihemed Sidîq, di 1941 de li Silêmaniyê hatiye dinê ; Kewkeb Hewramanî, keça Xefûr Mistefa, di 1940 de hatiye dinê û kurteçirokan jî dinivîse ; Mihreban ; Nesrin Fexrî...

Nivîskar bi kurtî jiyanha her hozanê û çend helbestên wê pêşkêş dike û paşê qala jînên şair ên Kurdistanâ Iranê, notela hozana navdar Mestûre, dike.

J.B.

MÜSAELYAN J.S., Zembilfros - Kurdska Poema i ee Folklorne versii (Zembilfros, helbesta kurdî û guharteyêng wê yên folklorî), Metnê kurdî, wergerandina rûsî, nîşe, pêşgotin û servengên J.S. Müsaelyan, weşana Nauka, Moskva, 1983, 180 r.

Babeta helbesta navdar Zembilfros tenê di nav Kurdan de tê dîtin ; wekî Leyla û Mecnûn, Üsiv û Zelîxe, hwd. di nav gelêng cîran de helbestenê dirûvdar ên wê nînin lê guhartereyek wê di pirtûka Hezar û yek şev heye.

Bi ya A.I. Jaba guhartereya edebî ya vê helbestê Mela Ehmedê Batê (nivîskarê Mewlûda kurmancî) nivîsiye. Stî J.S. Müsaelyan ji vê dîtinê şik dike û bawer e ku bavê edebî yê helbestê Feqiyê Teyran, nivîskarê Şêx Sen'an e.

Metnê rexneyî yê guhartereya edebî li gora şes destnivîsên Zembilfros, ên li pirtûkxanaya Saltykov -Şcedrîn a Moskovayê parastî, hatiye pêk anîn.

Di pirtükê de guhartereyek edebî ya duwemîn, ku bi awayê gotî Mûrad Xan Beyazidî nivîsiye, tevî dora panzde guhartereyêng geleriyêng li nav Kurdên bi piranî nexwendewar li Tiflis û Erîvanê hatine berhev kirin hene.

D.F.

NIKREFTAR Kayumars, Diwanî Bêseranî (1641-1702), Idara Gelempêri ya çandê û ciwanîyê, Bexda, cild 1, 1982, 163 r.

K. Nikreftar helbestenê ku Mela Mistefa Bêseranî bi zaravayê goranî nivîsiye berhev kiriye, bi dahûrînî û nîşeyêng xwe wan ji xwendevanan re ronak dike.

Mela Mistefa li Ciwanro, nêzikî bajarê Merîwan (Kurdistana Iranê) hatiye dinê. Li Seneyê (Senendacê) dixweyne û îcaza xwe ya melatiye digire. Helbesta *Sûfi* ya Bêseranî şop vedike û xasme li ser Mewlewî (1806-1882) bandûr (tesîr) dike. Nav û dengê Mewlewî ji yê mamosteyê wî dibuhure.

Ji 1961 bi vê de, K. Nikreftar li ser berhevkirina helbestên Bêseranî dixebite. Destnîseke wan li British Museum a Londonê ye ; yek jî li cem V.F. Minorsky bû. Ev dîwan tevahiya afirandinê wî nacivîne û K. Nikreftar dibêje ku ewê di nêzik de cildê duwem jî bide çapê.

J.B.

RIZGAR Ebdullah, *Le qazêweyek de*, Författares Bokmaskin, Stockholm, 184, 54 r.

Sêzde kurteçirokênu ku nivîskar di nav salê 1981-1984 di sîrgûna xwe ya li Tehran û Şamê bi kurdiya navendî nîvîsiye Rebwar bi wêneyên reş û spî pirtûkê xemilandiye û Sti Louise Nilsson jî qalpaxê wê çêkiriye.

J.B.

UZUN Mehmet, *Tu*, weşanêni Dengê Komal, Stockholm, 1984, 220 r.

M. Uzun di 1953 de li bajarê Siwerekê (Kurdistana Turkiyê) hatiye dinê û xwendina xwe ya navîn li Diyarbekirê temam Kiriye. Di 1972 de ew tê girtin û ji ber xebatê wî yên siyasi heşt sal ceza didine wî. Di 1974 de bi saya bexşîna giştî ji zîndanê derdikeve û di kovara kurdî *Rizgarî* de dixe. Di 1976 de, maweyek nû di giştîgehê de dimîne û paşê bîryara çûyîna Swêdê dide. Li wir kovara *Rizgariya Kurdistan* derdixe, hevkariya kovarê kurdî *Berbang* û *Hêvî* dike û di rojnama Swêdî *Dagen Nyheter* de jî dînivîse.

Tu nivîsareke dirêj e, bi stîlê romana nûjen hatiye nivîsin û tê de demêni nihoyî, borî û wêbeyî tevî hev dibin ; nivîskar qala jiyana xwe ya li Kurdistanê û li Swêdê dike, ji kesen xiyâli re dipeyive û xewna dînyayeke çêtir datîne.

Nivîsarêni dirêj bi kurmancî gelek kêm in. Lewre derketina her pirtûkê girîng e û dibe bûyereke edebî. Piştî nivîsandina helbestan Kurdêne Tirkîye zimanê xwe di nesrê de jî bi kar tînin û ev pêşveçûneke hêvîbexş e.

J.B.

XEZNEDAR Marif, *Le babet mîjûy edebî kurdîyewe*, Bexda, 1984, 499 r.

Ev berhevoka mezin li ser edebiyata kurdî bi destêni yek ji çêtirîn pisporêne vê pirsê hatiye pêk anîn. Marif Xeznedar ji malbateke xwenda ya Hewlêrê ye, ta niha gelek pirtûkan nîvîsiye û xebatê wî di warêni xwe de xwedî girîngî ne. Piştî temamkirina doktoraya xwe li Lenîgradê ew dibe profesorê edebiyata kurdî li Fakulta edebiyat a Zanîngeha Bexdayê û bi salan li wir ders dide.

Evet pirtûka nû çarde bendêni wî yên ku di kovarêni taybetî, xaseten di Govarî kolêci edebiyatî li Bexdayê derketine û li dervayî Iraqê bi dijwarî bi dest dikevin berhev kiriye. her lêkolînek xebateke girîng e ji bo nasîna edebiyata kurdî (ya navendî) ji heyama Nâli (1800-1856) bi vê de. Nivîskar xasme afirandinê hozanêni kêm an xirab naskirî û berhemêni helbestî yên salêni nav du şerîni cihanî pêşkêş dike. Tê de destnîseke neçapbûyi ya Martin Hartman li ser Mem û Zîn (ya rastî ew li ser Memê Alan e) ku di Pirtûkxaneya Enstituya Rôhelatnasi ya Lenîgradê de hatiye parastin (Nº. B 2514), destnîseke Alexandre Jaba, *Vocabulaire kurde des dialectes de Hekîari et de Revendi* (Peyivdanka kurdî ya zaravayêni Hekarî û Revendi), ku tarixa Erzerom, 15 adar 1848 (D 448) hildigire û di eynî Pirtûkxaneyê de hatiye parastin û wisa jî helbesteke neçapbûyi ya hozan Agirî, ku navî wî yê rastî Eli Gelawêj e, ji malbata navdar a Begzade Feyzullabeg ê Bokan û Saqizê ye, hene.

HUNER

IZZETPÛR Fatih, *Nigarişî kutah xoşnîvîsi der Kordistan*, weşana İdara Gelemerî giştî ya rînîşaniya islamî ya navçeya Kordistan, Senendec, 1983, 61 r.

Di vê albumê (31 sm × 23 sm) de 21 rûpel xetên xweşnivisê (xetatê) navdar ên Kurdistana Iranê hene. Pirtükê Fatih Izzetpûr, gerinendeyê naskirî yê xwendengeha xweşnivisi ya Seneyê (Senendecê) ye.

Di nav van hunermendên mezin de : Emîr el-Kuttab, ku navê wî yê rastî Hecî Mîrza Ebdolhemîd Melik ul-Kilamî ye, di 1883 de li Sene hatiye dinê û di 1949 de her li wir miriye, gelek xweşnivisînên wî di Muzexaneya Tehranê de û li Şirazê li ser gora Saadî hene ; Mela Hesen ku di 1934 de li Sene di nav belengaziyê de miriye û iro afirandinên wî bi bîhayêne gelek giran têن frotan ; Emîr Nîzam Garûsi ku di 1821 de li Bijarê hatiye dinê û di 1899 de miriye, hîmdarê ekola Xettê şikeste ye, gelek metnêni wî di Pirtükxaneya Neteweyî û li Muzexaneya Tehranê de ne ; Mehdi Kemalî Kurdistanî ku di 1921 de li Sene hatiye dinê û yek ji mestirîn xweşnivisê jîndar e û niha li Sene ders dide ; Merî Zerî, ku di 1959 de hatiye dinê û yek ji şagirtên şehrezatir ên nivîskarê vê pirtükê ye.

A.M.

MAMOSTE, Dengê Xêzikan, weşanên Jîna Nû, Uppsala, 1984, 80 r.

Mamoste navê pénusi yê karikaturistê kurdi Abdurahman Gezgin e, ku di 1954 de li Bismilê, di navçeya Diyarbekirê de hatiye dinê. Ew niha li Swêdê dijî û hevkariya kovarêne kurdi *Tirêj, Berbang, Armanç û Hêlin* dike.

Di vê albumâ pêşin a ku Kurdeki Tirkîyê derdixe karikaturên bi piranî siyasi yêni dijî rejîma leskerî ya tirk hene.

J.B.

MÜSÎQÎ

CEWARI Nûra, Stranê K'urdayê cime'tiyê, Erivan, Akademiya Zanistîyan a YKSS, 1983, 341 r.

Berhevokeke 137 stranê folklori yêndi kurdî tevî notayêni müsîqîyê ku musiqînasa hêja Nûra Ceweri, keça Heciyê Cindî, pêk anîye.

Ketiniyeke dirêj, bi zimanê ermenî, pirtükê bi xwendevanêni ermenî dide nasîn û di dawiya pirtükê de jî wergerandina ermenî ya her stranê hatiye dayin.

Metnêni kurdî bi alfabeşa kîrîlîk (rûsi) a guhartî hatine nivîsîn.

J.B.

MUSAELYAN, J.S., Kurdskie narodnye pesni, (Stranê gelerî yêndi kurdî), weşanên Nauka, Moskva, 1985, 130 r.

Kurdnasê navdar A.J. Jaba di salêni 1860 an de gelek çîrok û stranê kurmancî berhev kiribû. Destnivisêni wî li Pirtükxaneya Saltykov - Şcedrin a Moskovayê ne. J.S. Mûsaelyan di vê pirtükê de stranan bi alfabeşa erebî çap kiriye, wergerandina wan a rûsi daye û ji wan re pêşgotin û nîşeyan nivîsiye,. Di dawiya pirtükê de fîhrîsteke navêni kesan, yeka navêni coxrafi û yek jî ji bo navêni qewm û eşîran hene. Ji stranê di vê pirtükê de berhevkirî hin ên şeran, ên din ên dilan û dilanê ne.

D.F.

ZERÛ Ahmed Abdullah û YAQÛB Xalid Huseyn, Stranêt şahî û dilana, komelayekê, weşanên Idara Gelemerperî ya çandê û ciwaniyê, rez N°. 18, Bexda, 1981, 80 r.

A.A. Zerû û X.H. Yaqûb xelkê navçeya Behdinan in. Wan ji devê dê û bavêni xwe û ji nav rûniştevanêni Zaxo, Amêdi û Dihokê stranê kevn ên welaletê Behdinan berhev kirine. Ev stran ên demêni şahî û bextewariyê yêni jiyanê ne : bûyîn, zewac, serêrezan, zayîna pezan, hw... .

Stran bi alfabeşa erebî hatine nivîsin lê bê nota ne. Tevî vê kêmâsiyê jî pirtük ji bo parastina folklora kurdî ya dewlemend xizmetek e.

J.B.

PIRTÜKÊN ZAROKAN

BACELAN Rostem, Baxçey mindalan, weşanên Idara Gelemerî ya çandê û ciwaniyê, Bexda, 1983, 84 r.

Berhevokeke piçûk a helbestên kurt ji bo zarakan. Bacelan li xwendengeha navîn a bi navê Rizgarî, li Hewlîrê, mameste ye û pisporê helbestên ji vê çesnê ye. Ew ji 1977 ta 1982 heft berhevokên din jî belav kiriye.

J.B.

BOZARSLAN M. Emîn, Serketina Mişkan, weşanxana Deng, Uppsala, 1984, 85 r.

Di vê pirtûka bedew de şeş çirokên zarakan hene. Mehmet Emîn Bozarslan wan bi zimanekî sade û xwerû nivísiye û Ahmet Çantekîn ji wan wêndâniye. Bozarslan rojnamevan, werger û nivískarekî ji Kurdistana Tirkîye ye û niho li Swêdê diji. Dervayî wergerandinê hêja, xasme ên *Mem û Zîn û Şerefnamê* bi zimanê tirkî, wî bi kurdî *Alfabeyek* û pirtûkine çirokan derxistiye : *Meyro û Mir Zoro* di 1981 de, *Gurê Bilûrvan* û Kéz Xatûn di 1982 de.

J.B.

ZIMAN

BEKIR Şahîn, Hokirina zimanê kurdî, Bankstown, Australya, 1984, 48 r.

Ev pirtûka teksîkirî bi kurmancî, tipêñ latîñî hatiye nivísin û kaseteke wê ya bilêvkirinê (telafûzê) heye. Ew ji bo xwendin - nivísandin hînkirina Kurdêñ nexwendewar ên li Australiyayê cîwarbûyî ye.

Fêrén (dersên) pirtûkê di bernameya kurdî ya Radyo Sydney de hatine neşir kîrin. Di dawiya vê pirtûka bikêrhatî de ferhengokeke kurdî - îngilîzî - tirkî - almanî - erebî heye.

J.B.

COLLETTI Alessandro, Grammatica e dizionario della lingua curda, dizionario curdo (sorani, mukri, kurmanji) - italiano, pratico, etimologico, comparativo (Rêziman û ferhenga zimanê kurdî, ferhenga kurdî (soranî, mukri, kurmancî) - italyanî, ya pratîk tevî rîşenâsî û danberheviya gotinan), cild. 11, beş 1, hemze-b, weşana A. Coletti, Roma, 1984, 141 r.

Ev destpêka ferhenga Alessandro Colletti yê rehmetî (ew berî çend heftan ji tromboza mîjî wefat kir), dûmahîka *Grammatica e dizionario della lingua curda*, cild I, 1979 e.

Ji bo Kurdiya Silêmaniye nivískar : T. Wahby û C.J. Edmonds, *Kurdish English Dictionary*, Oxford, 1966 ; D.N. Mackenzie, *Kurdish dialect studies* I, London, 1961, II, London, 1962 ; J. Blau, *Manuel de kurde*, Paris, 1980 ; J. Blau û H. Hakem, *Les perles d'un collier*, Paris, 1981 ; Ji bo kurdiya mokrî, metnêñ Oskar Mann (1906) ; ji bo kurmancî xebatêñ D.N. Mackenzie ; J. Blau, *Le kurde de Amâdiya et de Djabal Sindjär*, Paris, 1975 û xebatêñ Maurizio Garzoni (1787), bi kar anîye.

Pirtüknesiye çibigre bê kêmâsi (r. 23-30) ketinîya vê ferhengê temam dike.

Cend roj pêş mirîna xwe ya bê wext, nivískar ji me re gotibû ku besê duwemîn ê vê ferhengê di nav weşanên Herder, Piazza Montecitorio 120, Roma de derketiye.

J.B.

ELİF Ü BE, weşana Komisyona Fêrkîrin û perwerdeyî ya Komala, 1983, 86 r.

Vê alfabetuya bi tipêñ erebî desteyek mamestekeyen endamê Komala ya Kurdistana Iranê çê kiriye.

Di vê pirtûkê de wêneyêñ rengîn ên ciwan hene, xwendina wê xweş e û ew bi gelek zîrekî hatiye pêk anîn.

A.M.

FEXRÎ Nesrin û MUKRIYANÎ Kurdistan, Rêzimanî kurdî, Zanîngeha Selaheddîn, Hewlêr, 1982, 215 r.

Vê rêzimana kurdî du mamossteyên Zanîngeha Selaheddîn a Hewlêrê (Kurdistana Iraqê) ji bo xwendekarêna sala yekemîn amade kirine.

J.B.

KURDOEV K.K. Rêzimanî kurdî be kerestey kirmancî û soranî, ji rûsî wergerandiye kurdî Kurdistan Mukriyanî, weşanên Idareya Gelempêri ya çandê û ciwanjiyê, rêt N°. 4, Bexda, 1984, 381 r.

Stî Kurdistan Mukriyanî, profesora zimanê kurdî li Fakulta Edebiyat a Zanîngeha Selaheddîn a Hewlêrê (Erbilê), pirtûka Kanatê Kurdo *Grammatica kurdskogo jazyka na materiale dialektov kurmanži i soranî*, Moskva, 1978 wergerandiye kurdiya navendî. Bi vî awayî xwendekar û pisporêñ kurd ên ku bi rûsî nizanîn ewê dikaribin ji vê xebata danberhevi ya her du zaravayêne sereke yên zimanê kurdî kelk (istifade) bigirin.

A.M.

SMIRNOVA I.A., EYYÜBÎ K.R., Fonetika Kurdskogo Jazyka (Fonetika zimanê kurdî, zaravayê mukri). Weşanên Nauka, Leningrad, 1985, 340 r.

I.A.. Smirnova û K.R. Eyyübî vê monografya duwemîn (piştî *Kurdsjij Dialekt Mukri*, Leningrad, 1968) xwe didin dahûrîniya pratîk a zaravayê mukri yê zimanê kurdî (navçeya Mahabadê).

Birrê yekemîn ê pirtûkê gelek teknîk e û bi arîkariya radyografi telafûza pênc Kurdê wê navçeyê hatiye pêk anîn.

Birrê duwemîn ê pirtûka mukri û veguherîna wê li gora zaravayêne kurdî yên din (xasme kurmancî) û zimanên iraniyê din.

**Joyce BLAU
Dominique FERNANDINI
Abdullah MERDÛX**

KEREMÊ REŞ Û PIRTÜKA WÎ YA NÛ

Têmûrê Xelîl MURADOV

Keremê Reş bingehdar û sermiyanê klûba şûrkêşî ya "Viktoriya" ya bajarê Novosibîrskê (li Sibîryayê) ye; gelek bend û nivîsarên wî yên li ser cûre û perwerdeyîya (terbiya) zarokan di kovarên sovyêtî *Moskva, Smena, Sobesednik*, rojnama *Sovyetskeya Kultûra* û hinêñ din çap bûne û rûmet dîtine. Hostayê hêja vê gavê ji endamê sermiyaniya (prezîdyûma) Federasyona Yekîtiya Sovyetî ya spora şûrkêşiyê ye. Hetanî iro li Moskovayê du pirtükên wî çap bûne: *Em we dawetî şûrkêşiyê dîkin û Havîn li ser bîhûrê*. Kerem li ciyêñ ku şoreşgerê kurdi yê navdar Férîk Polatbekov (Fyodor Lîtkin) derbas bûye geriyayê, rastî merivên ku Ferîk dinasîn bûye, ji wan bîranînêñ derheqa wî berhev kiriye. Yek ji xebatêñ wî yên berbiçav ji senaryoya filma *Dartanyan, Alyona û Seryoja* nivîsiye; ev filma belgewerî di sala 1971 de di festivala (mihrecana) Mînskê dê hatiye ecibandin û di 1978 de ji li bajarê Rîgâyê madalya tunc stendiye.

Jiyan û karêñ vî lawê kurd ê ji gundê Heko (li navçeya Talînê li Komara Ermenistanê) ev qas bi adan, kîrhañ û bi berhem in ku meriv dikare tenê bi kurtî giliyê wan bike.

Ez ji sala 1979 ve Keremê Reş nas dikim û ji wê rojê hetanî iro hersal gava ku riya min bi Moskovayê dikeve ez rastî wî têm. Derecêd xebata wî wisa ne ku mierivan zindegitî dihêlin. Sala 1983 bû gava ku ewî pirtûka xwe ya pêşîn *em we teklîfî şerkariyê dîkin* ji min re şand. Em Kurd razî û serfiraz bûn ku pirtûka wî li Moskovayê derketiye û qimeteke bilind dîtiye.

Niha pirtûka wî ya duwemîn bi sernivisa *Havîn li ser bîhûrê* li Moskovayê di nav weşanên "Molodaya gvardia" de ronahî dît. Perçeyek vê romanokê wekî kurte (xulase) di sala 1982 de di hejmara 6a kovara *Moskva* de çap bûbû û ji bo wê Keremê Reş bi xelata edebî ya sovyeti ya li ser navê Nikolay Ostrovski perû kirin. Tiraja vê pirtûkê 50 hezar lib e û wê ji bona frotanê şandinê hemû Komarêñ Sovyetistanê.

Pêşgotina vê pirtûkê nivîskarê navdar Albert Lîxanov, berpirsiyarê kovara zilamîn sereke *Smena*, xwedîyê Xelatêñ Nadejda Krûpskaya û Komsomolêñ Lenînî, nivîsiye. Ew dibêje ku romanoka Keremê Reş bi teqla welathizîyek gurr gelekî alikariya xortan û zilaman bike ji bo bijartina riya wan a jiyanê.

Bi kurtî serecema vê afirandinê awa ye : Di havîna 1959 de li Karelîyayê havîngehek tê danîn ji bona zaroyên sêwî. Xwedîkirin û terbiyekirina 80 zarakan dispêrin Keremê Reş û aşpêj Maria Ivanovna. Wî çaxî Kerem 21 salî bû û li Zanîngeha (Unîversîteta) Lenîngradê kursa 5a rohelatnasiyê dixwend. Ewî wekî xwendekarekî pêş wextê betlanê dişînin wî ciyê heweskar ku miqatiyê li wan zarakan bike. Xebata tevî zarakan ew qas pê xweş tê ku ew dixwaze ji Zanîngehê derkeve, çimkî ew bi zariyan ve gelekî hatibû girêdanê. Ew dixwaze di nav wan de evîna welêt qewî bike, terbiya welathiziyê bide wan, naxwaze ku zaro texmîn kin ku ew sêwî ne. Lê ewî nizanibû çawa bersîva mamesteyê xwe Orbelî bide, ewê ku gelekî ji wî hiz dikir û dixwest ku ew bibe kurdnas.

Rojekê ew kûr kûr difikire û ber bi mala Orbelî ve bi rê dikeve ku niyeta xwe jê re veke. Kerem li ser vê serpêhatinê dinivîse : «*Ez ber bi vê rasthatinê diçûm, fikra wê bi tenê bi şevan nedîhişt ku xew bikeve çavê min. Ez diçûme bal merîvkî ku min qasî bavê xwe jê hiz dikir. Xulase, em rastî hev hatin û min niyeta xwe jê re got. Orbelî bi kurdî awa gote min* : «Gotineke kurdî heye : dibêjin filankes merîvkî bibext e. Bextê mîrê kurd heye : divê ku ez bi gotina mezinê xwe emîn bim, mezinê min jî bi gotina min emîn be, hespê min bi gotina min emîn be, kûçkê min bi gotina min emîn be, ez bi gotina bavê xwe emîn bim, bavê min jî bi gotina min emîn be. Dêmek gerek e di wextê de hespê xwe av bidî, alif bikî, tîmar bikî, kûçkê xwe timî girêdayî xwedî mekî. Heke ji merîvkî re dibêjin «ew kesekî bêbext e» ew meriv windabûyî tê hesabê». Paşê Orbelî bi ser ve zêde kir ku di zargotin û edebyiyata kurdî de di hîç ciyan de nikarî rastî meseleke teribandina dostaniyê bêyî. Eger Kurd ji yekî re bû heval û jê re bêbextî kir, ji wê xirabtir tu tişt tune.”

Salbihurîn, dinivîse Kerem, ez ji Instîtûta Rohelatnasiyê derketim, bi zariyan ve hatime girêdanê ; paşê min di nava sê salan de Fakulteya rojnamevanî ya Zanîngeha Lenîngradê kuta kir. Ez ne poşman im lê xeberdana min û Orbelî di dilê min de bû xem : difikirim gelo min jê re bêbextî nekir ?

Seydayê wî Hovsep Orbelî zaneyek navdar bû, endamê Akademiya Zanîstiyân ya Yekîtiya Sovyetî û hîmdarê kabîneta kurdnasî ya Instîtûta Rohelatnasiyê ya Lenîngradê bû. Keremê Reş jê gelek tişt hîn bûye li ser Kurdan û li ser Rohelat. Ew wê zanîna xwe di romanoka xwe de bi kar tîne. Tê de dinivîsîne ku Med pêşiyen Kurdan bûne, di nav gelêd arî de xwedî nav û deng bûne. Ewan, wekî Kurdêñ êzidî yên iroyî, rojê diheband, agir diparêst, lewma ji wan re “agirperest” dihate gotin. Di sedsalâ 12 de zaneyek bi navê Hadî hin guhartin dixe nav van baweriyen pêş-îslamî û hîmî êzidîtiyê datînê. Paşê ew qala qumandarê Rohelatê yê mezîn Selaheddînê Kurdi dike û dibêje : “*Bi texmîna min ew di nava dîrokê de mirovê bi tenê ye ku hemûyan, bawer bikî hemû mirov jê gelekî hiz kirine.*”

Ji bona Kurdan Selaheddîn ne tenê qumandar û pêşewa bû, ew sembolek îstisnayî bû. Dante qîmeteke mezîn daye wî. Selaheddîn wisa jî hizkiriyyê nivîskarêñ navdar Walter Scott û Voltaire bû. Voltaire ew bi ser Sezar û Iskenderê Makedonî de digit. Nivîskarê almanî Lessing di afirandineke xwe de lî ser wî awa dinivîse : “*Ew xwedîyê şexsiyeteke wisa bû ku dikaribû cihanê ji xerabiyê, hêşîrtiyê û teasubê xelas bike.*” Camêrekî wisa bû Selaheddîn. Di sedsalâ 12 de kûbarîke mezîn bû gava meriv digot “Ez Kurd im” û di wan salan de çawa ku rohelatnassê mezîn Marr jî

nivîsiye, qumandarêd Temare Xanimê yên navdartir Zakariya û Îvanê (bi kurdî. Zahar û Îvo) ji kurd bûn.

Di temamiya pirtûkê de mîna têleke sor tê kifşê şêkirdariya Keremê Reş ji bo H. Orbelî ku wî bi rihê welathizî û niştimanperweriyê terbiye kiriye, gelek sîrred kurdnasiyê li ber wî vekiriye, pê daye bawerkirin ku ew kurê gelekî mîrxas û aqilmend i wekî gelê kurd e.

Pey derketina vê pirtûkê, di 14 sebat 1986 de bi milyonan temaşevanêd televizyona Moskovayê Keremê Reş di bernama "Cihan û Cahil" de tevî kesên navdar di warê terbiyekirina zarakan de dîtin. Rojnama Ciwanan "Komsomolskaya Pravda" jî di hejmara xwe ya 16 ê sebatê li ser vê yekê nivîsi.

Bi çîroka Keremê Reş mirov dikare bawerî bîne ku bi saya dilsozî, zîrekî û aqilmendiya pirr, mirov dikare bîghîje vê derecê, bibe nivîskar û rojnameyanekî bi nav û deng û dengê welatê xwe û gelê xwe bilind xwedî ke.

DIMILKÎ (ZAZAKÎ) YA BATÛMÎ *

Qanatê KURDO

Heval û hevkarê delal, Malmîsanij can !

Eva bû du car, ku ez namên te distinim. Min bersîva namake te nenivisi, çimkî hingê ez nexweş bûm, li nexweşxanê de bûm, hekîma ez emelet (apêrasiya) kirim, jana hurê min birin. Eva bû heft meh, ku apêrasiya derbas bûye, ez hêdi-hêdî û bere-bere li ser xwe de têm.

Vê carê ez dikarim bersîva te bidim.

Destnîvîsara min ya kitêba beramberkirina zaravê zazakî û kurmançî heta niha li çapxanê de ye, çap ne bûye, dibêjin çapkirina wê girane, yekê jî hela hê dora çapkirina wê ne hatiye. Niha min bîryar kirîye, ku dîsan ji serekê dîwana çapkirina kitêbê zimanê rohilatêra binivîsim, yan jî herime Moskvayê, da'wa lê bikim ku bi zû çap bikin... di wê destnîvîsarê de cûre-cûre tekstê zazakî û tercîma wan heye, wisan jî tekstê zazakiya Batumê hene. Ez gelek şâ me, ku tu derbarey zaravê zazakî dixebitî...

De bi xatirê te.

*Lenîngrad, 5.3.1985
Qanatê Kurdo*

Heval û hevkarê delal,

Sala 1939 min ev qisêñ jêrîn ji zarê du xortêñ Zaza nivîsîne. Wî wextî Zaza li perê (qeraxê) Batûmê, li aliyê roavayê, du kilometir nêzîkî Batûmê li gundekî de dijîn, wî wextî ji wan re digotin Gundê Kurdê Zaza, qasî 25 mal di wî gundi hebûn. Niha dibêjin, ew gund bûye pareke bajarê Batûmê, li şûna wî xanmanê 6-7 qatî çêkirine, zaza belav bûne. Hinek ji wan çûne ketîne nav gundêñ Acaran, Gurcan, hinek jî li Batûmê de mane, ketîne ser xebata li nav şeher. Niha ez haj wan nînim, ci hatiye serê wan, bi ci iş û karî ve mijûl in, kes tişteki nizan e, li nav 46 salan de gelek tişt hatiye guhaştinê...

*Lenîngrad, 23.4.1985
Qanatê Kurdo*

(*) Batum : Yew şaristanê Sovyetistani yo.

QISA CIMSÎT

Namê min Cimşît o; namê bawkê min Serdar o. Min vîst û panc sal emir kerdo. Ez nêzanan kengê ma zi Romê ra ameyme etîya. Bawkê min va ke, înan ameyî, şer û qewxe bî. Romê de înan rencber bî, xele çandînî, pes wedî kerdinê.

Nika êtiya ma baxewanî me, rezwanî me. Cinî û zarê min çinî, ez nêzewciyam, bawkê min merdo, qelenê min çino. Qelen bibo ezo bizewicana.

Daka min esta, di kiwî da rakewta, nêweş a. Namê daka min Sînem o. Di wayê min estî. Namê yew Esmer o, namê yewi z Mircan o.

Esmer vîst û hîrye sal a, mîrd kerda, di lac û yew kênî cayê estî. Mircan çares sal a, aya ver malê ma ya. Heta nika mîrd nêkerda, kiwî de iş kena, aw arena, nan pewjena, cil şo.

Ewroc wayî min Mircan nan û goşt hedre kerdiyo, ez zanam ke riya tû dîr o, nika to vêşan î. Haydê, ma bişêrîme kiwî, nan biwerîme, rezî nav engur biwerîme ; asan be, bi silamet ageyre.

- Ma şî kiwî Cimşît, wîşka ayî Mircan aw arde, ma destê xo şîştî. Ayî werêk da ver ma, ma dest pey kerd nan û goşt werdî. Paşê ma destê xo şîştî û zi kiwî ra derkewtîme. Min xatirê xo zi Cimşît ra weşt û ageyram şeher.

Batum, sala 1939
Jî zaravê Cimşîtê Zaza
bi destê Qanatê Kurdo
hatiye nivisandinê.

QISA ROSTEM

Ma di bira bî. Ez bîm, birayê mino qîç. Namê birayê min Ferman bî. Ez des sere bîm, birayê min heşt sere bî ke dak û bawkê min merd bî. Ma dewlemend nêbîme. Di ga, çeher çêl, hîrye golik û vîst mêsñê ma bî. Ma nêşenîma wedî bikerîme. Mamê ma Osman hemî pes û dewarê ma berdî. Ma kewtîme bin destê ciniya mamê ma. Her roc çimê ma ver destê ïnan bî.

